

**KONFERANSA  
LÎ SER  
ZMANÊ KURDÎ**

---

**WEŞANÊN KOMKAR**



**KONFERANSA  
LI SER ZMANÊ KURDÎ**

**WEŞANÊN KOMKAR**

Weşanên KOMKAR

Adres:

Bunsenstr. 7

51145 Köln/Deutschland

Tel: 49-02203-93 51 71

internet:

e-mail: [komkar@t-online.de](mailto:komkar@t-online.de)

ISBN : 3-927213-22-5

Yê ku ji çapê ra amadekir: Ünal Yardımcı

## Çend Gotin

Hewcetî tune, ku ez di vê rûpelê de dur û dirêj ser perçebûna Kurdistanê, pêpezbûna hemû maf û heyîyên gelê Kurd bikim. Dagirkeran mecal nedane û îro jî nadin, ku Kurd zimanê xwe baxivin, çand û hunera xwe, ziman û edebîyata xwe pêşta bibin. Ku mirov Kurdistanê Başûr bide alîkî, Kurd li ser her sê perçên mayîn xwedanê tu mafan nînin. Herçî kar û xebatên ku têne meşandin dibe sedema hepsî bûn, lêdan û kuştina Kurdan. An jî talan bûna mal û milk, şewitandina gund û bajarên, nefî bûn û koçberîya sed hezaran.

Taybetî jî dewleta Tirk ya ku hetanî duh hebûna gelê Kurd inkar dikir. Kurd dikirin Tirkên çîyayî, îro nikare inkar bike, lê ne amade ye, ku mafên Kurdan yê netewî û demokratîk bide. Bo ku bikaribe inkarkirina xwe bidomîne, zimanê dayikê dike zimanê tradîsyonê. Mafê perwerdeyî di zimanê dayikê de û di dibistanan de nade Kurdan. Dil heye, ku vî mafê zarokên Kurdan bi qursan ve beravî bike. Lê gelê Kurd yê ku ji bo van mafana ew qas bedel dane pê ne qayil in û ewê mafê xwe bistîne. Ev gelekî êşkere ye.

Kurdan di bin mercên gelek giran de serhildan pêkanîne, partî û rexistin damezirandine, rojname, kovar û pirtûk çapkirinê. Folklor û zargotina Kurdan ya dewlemend berhevkirine û gîhandine destên qurna îro. Di piraniya berhemên ku hatine afirandinê de, zimanê polîtîk û propagandayê ji bo hişyarkirina Kurdan, sazî û berpirsiyarên dagirkeran hakim e. Berhemên edebîyateke, rêzîmaneke standart nîn in. Pirtûkên ku giştî di derheqa dîroka Kurdistanê de agahdarîyê bidin nîn in. An jî gor dîroknasîyê, zimannasîyê, cîvatnasîyê, politîknasîyê û ferhengnasîyê berhemên ku ji bo hemû perçên Kurdistanê û cîvata Kurd wek delîl rolekê bileyîzin nînin.

Ya rasiyê ku bêjî, KOMKAR saziyeke çandî, edebî an jî hunerî nîn e. Dil dixwaze, ku Kurdistan azad bûya. Kurdan mafên xwe yê netewî û demokratîk xistibûyan destên xwe. Me jî sazîyên xwe ji bo beşên cur be cur pêkanîbûyan û çalakîyên xwe jî bi bernameke profesyonelî bimeşandana.

Ji ber tunebûna sazîyên ku di beşên curbecur de, bi pisporî kar û xebatan bimeşînin, divê ev valahîya bihata tijîkirin. KOMKARê jî, wek rexxiraweke demokratîk ji ber bernama xwe ya polîtîk re, xwastîye, ku vê valahîyê jî tijî bike. Ku em çend xalan nav bikin:

Karê çapemeniyê, pirtûk weşandinê, amadekirina semîner û konferansên ser ziman, edebiyat û dîroka Kurd û Kurdistanê, mafên mirovatiyê, danasîna kesên ku di dîroka Kurdistanê de roleke mezin leystine, daxwazyên Kurdan yên ku derwayî welêt dijîn.

Lê em gihîştine wê baweriyê ku, divê em van berhemên qedirbîlind yên ku hetanî îro hatine afirandin biparêzin û wan bidin nasîn. Divê em bidin nasîn û eşkere bikin, ku ev roman, çîrok, mesele û metelok, helbest, serpêhatî di binê kîjan mercan de hatine afirandin. Nivîskarên wan û xwendevanên wan kîjan bedel dane? Sedemên kêmasiyên çi ne? Lê divê em edî nebêjin, ev ji tunebûnê çêtirin.

Lê divê em wan afirandina wek destpêk û çavkanî bibînin. Ji vir ha, divê lêkolîn bi şiklekî zanyarî bêne meşandin. Babet çi dibe bila bibe, edî divê em qalîtê berbi jor bikişînin.

Netewên ku ji 150 sal in xwedanê rêzimana xwe ne, iro li ser kêmasiyên xwe niqaş dikin û tevayî qeyde û quralên zimanê xwe nûjentir dikin. Rola zimên di beşên cuda de. Mînak: Ziman û Polîtîka an jî polîtîka dewletan ya zimên, ziman û psikoloci, an jî psikolojîya zimên, ziman û cîwat her usan rêzimana Kurdî û zarav û devokên zimanê Kurdî. Divê ev babetana edî bi çavekî zanyarî bêne lêkolîn, pirs û pirsgrêkên zimanê Kurdî, sedemên paştamayîna zimanê me û kêmasiyên heyf bêne zelalkirin.

Ev konferansa divê di beşa edebiyat, helbest, folklor- zargotin û dîroka Kurdî de ji bêne sazîkirin, dajiboy em bala nivîskar û zanyarên xwe bikişînin ser kêmasiyên û berhemên standart pêkbînin.

Bi vê konferansê ve jî me xwest, ku em jî gor mercên xwe platformekê pêkbînin û dor bi dor fersendê bidin pisporekên xwe, ku ew xebatê xwe raxin ber çavên me. Bi van konferansan ve me xwest, ku em di navbera zanyarên Kurd û xwendevanan de têkilîyekê pêkbînin. Ez usan bawer dikim, ku em bi vê Konferansê ve gihîştin armanca xwe. Heta ku sazîyên me yên taybetî bêne pêkanîn, emê wek KOMKAR vî karî bimeşînin. Ev kara karekî giştî û netewî ye.

Ez dixwazim bi navê hemû Kurdên dilsoz sipazdarîya xwe pêşkêşî zanyarên Kurdan yên hêja M. Emîn Bozarşan (zimanzan, lêkolînavan), Dr. Zerdeş Haco (zimanzan), Dr. İlhan Kizilhan (Psikolog), Serdar Barak (zimanzan) bikim û kar û xebatên wan de serkeftinê dixwazim.


Bi silavên rêzgirtinî ve  
Fettah Timar (Serokê KOMKARê)

# Dî Edebiyata Klasik û Folkloro Kurdi da HUNER

M. Emin BOZARSLAN

Roj baş, xuşk û bırayên hêja.

Beri ku ez dest bî gotara xwe bîkım, mın dîvê ku ez bî taybeti, wek vêkxîstînek jî KOMKAR'ê ra, her weha jî jî serokê wê bırayê hêja Fettah Tîmar ra, jî hemî endamên wê yên Komîta Kargêr ra û bî gîştî jî hemî endamên wê ra gelek sıpasên xwe pêşkêş bîkım, ku ev konferansa gırîng lî ser zımanê Kurdi amada kırîne û jî kerema xwe mecal dane mın jî ku ez bêmdî vê konferansê da bıpeyivım. Ez jî we hemıyan ra jî sıpas dıkım ku hun'ê jî kerema xwe lı mın guhdari bîkım



Wek ku hatiye ragihandin, babetê me dî vê gotarê da, "Dî Edebiyata Klasik û Folkloro Kurdi da Huner" e. Em'ê hêz bîdın

xwe ku di vê gotara xwe da hîn minakên wîsa ji edebiyata klasîk û folklorê Kurdi pêşkêş bikin ku, di wan da hunerên tewirawewir çî girtine. Her weha, em'ê bi kurtî li ser wan huneran bi-peyvînin, wan bîdîn zanîn û şîrove bikin.

Dîvê em berê vê yekê bîdîn zanîn ku babetê me hem fire ye, hem jî girîng e. Ji ber vê fireyîyê û girîngiyê, dibe ku gotara me piçek dirêj bibe. Eger dirêj bibe, ez hêvidar im ku xuşk û birayên hêja ji kerema xwe li me bibûrin. Wek ku tê zanîn, di peyveka pêşîyan a Kurdi da tê gotin "Ji mehan ji salan, carek mewanê xalan".<sup>(1)</sup> Ê me ji wîsa ye. Em her tîm nayên vîr û serên xuşk û birayên xwe yê hêja nayêşînin. Ji salê carek yan du car em tîm vîr. Eger di van hatînan da em piçek serên we bêşînin jî, em hêvidar in ku hun jî kerema xwe li me bibûrin.

Vêca em dest bi babetê xwe bikin:

Berê, dîvê em bîdîn zanîn ku "huner" çî ye û dema qala "huner" a di edebiyata klasîk û folklorê Kurdi da tê kirin, em çî fam dikin, çî tê aqilê me.

"Huner" peyveka Îrani ye; di Kurdi da bi awayê "huner", di Farisî da jî bi awayê "honer" tê karanîn. Huner ne tenê di edebiyatê û folklorê da heye; lê di hîn qadên di da jî tê nîşandan û tê ditîn. Lê belê ji ber ku babetê me di vê gotarê da edebiyata klasîk û folklorê, em li vîr qala maneyên wê yê di qadên di da nakin; em'ê tenê mana wê ya di edebiyat û folklorê da bîdîn zanîn. Ew mane bi kurtî weha ye:

"Di nîvîsînê da yan di gotînê da, afirandina rewşên balkêş û dîlkêş, bi karanîna peyvikên li derê awayên adetî".

Bi peyveka di, em dîkarî weha bêjin:

"Di edebiyat û folklorê da huner ew e ku helbestek, çirokek, stranek û wî bi karanîna hîn peyvik û salixdan û şîbandînan wîsa bê xemilandin ku, hem bala xwendevanan yan guhdaran, hem jî dilê wan ber bi xwe bikişîne, wan bine kelecaniyê û coşê".

Ew huner eger li ser rewşeka erîn yanî pozîtîf bê karanîn, dilê mirov geş dîke û zewq dîde mirov; lê eger li ser rewşeka



neyin yani negatif be, hingê ji dilê mirov dihejine û mirov xemgin dîke.

Kesê ku wê hunerê nişan dide, ew ji dibe "hunermend".

Mırov dışê edebiyatê û folklorê bîşbine laşek, hunerê ji bîşbine giyan. Laş çawa bê giyan naji û wezife nabine, edebiyat û folklor ji bê hunerê vala û pûç diminin, bî kêrê tîştêk nayên û nîkarin dilê mirov ber bî xwe bîkîşinin. Mesela, ku evindarek bêje "Yara mın pırr rınd e, çav û birûyên wê pırr xweşik in", ev nabe huner. Lewra dı peyvên rojin ên adeti da tîştên weha tım tên gotın. Lê belê eger evindarek bejna yara xwe bîşbine tayeka rihanê, çavên wê bîşbine çavên xezalan, birûyên wê bîşbine kevanan, bîjangên wê bîşbine tiran, aha ev dibe hunereka dîlkêş. Her weha, eger dı straneka mêrxasiyê da jı şerkarek ra bê gotın "bavê xezzeb" yan "gamêşê dehlê" yan "beranê çargurçık", ew ji dibe hunereka dîlkêş.

Dema em lı edebiyata Kurdi ya klasik û lı folklorê Kurdi dînêrın, em dıbinın ku her du ji bî hunerên gelek gıranbuha hatine dagırtın. Me dıvê em bıdın zanın ku, gelek kes jı folklorê tenê govendê fam dıkın. Lê ew şaşfamiyeka mezın e. Lewra çarçova peyvıka<sup>(2)</sup> "folklor"ê gelek fire ye. Jı bıl govendê çirok, stran, meselok, pêkenok, tîştanok, peyvên pêşıyan û idyom gışt dıkevın nava çarçova folklorê û her yek jı wan beşeki folklorê pêktine. Dı van beşan da jı mirov hunerên cure cure yên bılınd dibine.

Beri ku em dest bı nişandana minakên huneri jı edebiyata klasik û folklorê bıkın, dıvê em bı kurti qala ferqa wan ji bıkın. Em dışên wê ferqê, jı aliyê du nuqtıyên sereke ve bıdın zanın.

Nuqtıyek ev e ku edebiyata klasik jı aliyê hın hozanên me yên naskiri ve hatiye afirandın; yani hunermendên wê edebiyatê ew hozan in. Lê folklorê Kurdi malê gelê Kurd e, anonim e, jı aliyê gel ve hatiye afirandın. Mesela, dema em qala straneka geli<sup>(3)</sup> dıkın, em nızanın ku ew stran jı aliyê kê ve hatiye afirandın.

din, cara pêşin jî aliyê kê ve û lî kêderê hatiye gotin. Jî ber vê yekê, em dibêjin "stranên geli", "çirokên geli" û wd.

Nuqteya di ji ev e ku di edebiyata Kurdi ya klasik da, lî gora adetê wê demê, gelek payvîkên Erebi û Farîsi hatine karanin. Lê di folklorê Kurdi da peyvîkên biyani hema hema qet tunin. Tenê hîn peyvîkên Erebi yê ku ketine zîmanê peyvinê û bî wî awayî jî zimên ra bûne mal, di hîn beşên folklorê da ci girtine. Ew jî pîrr pîrr kê m. Stran, çirok, pêkenok û wd yê Kurdi yê geli gişt bî Kurdiyeka xwerû hatine afirandin; yanî gundiye Kurdîstanê çawa dipeyivîn, ew jî wisa hatine afirandin û wisa jî gelê Kurd ra bûne mal.

Me jibo vê gotara xwe çar tewirên hunerê bijartin. Ew her çar tewir ev in:

- 1- Salixdan û şibandin.<sup>(4)</sup>
- 2- Di salixdan û şibandinê da mubalexe.
- 3- Biranin.
- 4- Hevtipi.

Em'ê hêz bîdin xwe ku di vê gotara xwe da, jî van her çar tewirên hunerê jî edebiyata klasik û folklorê Kurdi hîn minakan jî xuşk û birayên berrêz ra pêşkêş bikin.

## SALIXDAN Û ŞIBANDIN

Di edebiyat û folklorê da yek jî awa û tewirên hunerê, salixdan e. Dema ku hozanek yan niviskarek salixê kesek yan rewşek yan tiştek yan jî ciyek bide, divê bî awayeki wisa salix bide ku hem bala xwendevanan yan guhdaran bikişîne ser wî kesi, wê rewşê, wî tiştî yan jî wî ciyî, hem jî dilê wan ber bî wê salixdanê bikişîne.

Ez dıxwazım dı babetê salıxdanê da numûneya pêşin ji "Mewlûd" a Kurdi ya Melayê Bateyi nişan bıdım. Melayê Bateyi dı ciyeki beşê paşin ê "Mewlûd" ê da deng lı Pêxember kırıye û weha salixê qenciya wi daye:

"Mın hebın sê sed hezar ezman û dev  
Yek demê xafıl neminım roj û şev

wesfê husna te bîbêjım subh û şam  
sed qıyamet dê bıçın, hêj natemam".

"Wesfê husna te" yani salixê qenciya te. "Şam" yani êvar.<sup>(5)</sup> Dıvê mırov baş bala xwe bıde vê hunera mezin a ku dı vê parçeyê da ci gırtıye. Eger sê sed hezar zıman û devên wi hebın, bı roj û bı şev qet yek demek ji xafıl nemine, sibe û êvar her salixê qenciya wi bıde, jı despêka dınê heta rabûna qıyametê sed car dem here, disa ew salıxdan tamam nabe. Hunereka di ya bılınd ji ev e ku ev salıxdana bı vê naveroka ewqas fire, tenê dı çar malıkan da hatiye bıçıkırın. Yani salixê ku niviskareki adeti belki bıkarê dı rûpelek da bıde, Melayê Bateyi bı hostatıyeka mezin dı çar malıkan da daye.

Em minakeka salıxdana têrhuner ji jı dastana me ya neteweyi "Mem û Zin" ê nişan bıdım. Aladarê doza azadixwaziya gelê Kurd Ehmedê Xaniyê nemır, dı beşê 5'an ê "Mem û Zin" ê da weha pensê fêrısı û mêrxasiya Kurdan daye:

"Wan gırtı bı şiri şehre şuhret  
tesxir-ı kırım biladê himmet".

Ev her du malık bı Kurdiya xwerû weha ne:

"Wan bı şûrên xwe gırtıye bajarê meşhûriyê  
Wan dil gırtıye welatê xiretê û mêrxasiyê".

Wek ku diyar e, mamostayê mezın dı van her du malıkan da meşhûri, navdari şıbandiye bajarek, Kurd ji şıbandine şerkarên ku bı şûrên xwe ew bajar girtine; her weha, xiret û mêrxasi şıbandine welatek, Kurd ji şıbandine şerkarên ku ew welat dil girtine. Aha jı ber vê şıbandinê, ev salıxdan dıbe hunereka hem pırr balkêş, hem ji pırr dılkêş.

Xani dı wi beşi da dema qala rewşa Kurdan a dijwar û bextreşiya wan kırıye, weha daye zanin ku Eceman û Romê yani Osmanıyan, êlên Kurdan jı tirên xwe yên tunekırınê ra kırine amanc:

"Her du terefan qebilê Kurmanc  
bo tirê qeza kırine amanc".

Mexsed jı "her du terefan" Rom û Eceman in. Peyvıka "qeza"yê ya dı malıka 2'yan da Erebi ye, mana wê lı vır "tunekırın" e. Ev her du malık bı Kurdiya xwerû, weha ne:

"Rom û Eceman jı her du alıyan ve êlên Kurmanc  
jı tirên xwe yên tunekırınê ra kırine amanc".

Wek ku dıxuye, hozanê nemır bı van her du malıkan bı hosta-tıyeka mezın daye zanin ku amanca Romê û Eceman ne tenê zordestiya lı gelê me yê bindest e, lê tunekırına gelê Kurd e. Aha ev salıxdan, hunereka gelek mezın e.

Evdırehim Rehmıyê Hekari jı dı ciyeki pırtûka xwe ya bı navê "**Gaziya Welat**" da lı ser şehidkırına Xalıt Begê Cıbrı û Ūsıf Zıyayê Bedlisi jı aliyê rejıma nejadperest a devbıxwin ve, weha gotiye:

"Bı namûsa xwe sond xwarın jıbo Xalıt Begê Cıbrı:  
Heta heqqê we Kurdan em nedın, heram be me miri

Çı gava bûne xalib, guh nedane ehd û peymanan  
nehiştin tîşteki qudsi, tecawız kır'ne iman

Tehemmul wan nekır, Xalid Beg û Yûsuf Ziya kuştin  
Çıraya me vekuştin, ma kesê aqıllıser hiştin!"

"Çıraya me vekuştin"! Dîvê ku em gîşt bala xwe baş bîdın vê peyva têrhuner. Gelo çu peyveka di heye ku bıkarê bî qasê vê peyvê salixê gunehkari û zalimiya wan nejadperestên xwinrêj bîde; her weha, bextreşi û trajediya gelê Kurd weha bî awayeki dîlêşin bine ber çavan?

Hozanê me yê mezin Melayê Cıziri dî helbesteka xwe da weha salixê agirê dîlê xwe daye:

"Ji ber ahên me dînê agir û dîd bit, ne eceb  
Me dî dîl da heye narek ku dîsojît seqerê".

"Dîd" Farîsi ye, mana wê "dû" ye. "Nar" Erebi ye; mana wê "agir" e. "Seqer" ji Erebi ye û navêk ji navên dojê ye.<sup>(6)</sup> Mana van her du malikan bî Kurdiya xwerû, weha ye:

"Eger jî ber ahên me dînê bibe agir û dû, ne ecêb e  
Lewra dî dîlê me da agirek heye ku dojê dîşewitine".

Wek ku dîxuye, Melê dî van her du malikan da daye zanin ku agirê dîlê wi agirê dojê dîşewitine; yani agirê dojê jî agirê dîlê wi ra dibe êzing. Wek ku dîyar e, ev hunereka wîsa bîlind e ku, mirov jê ra heyran dimine.

Dî edebiyata Kurdi ya klasik da, jî bîl Melayê Cıziri hîn hozanên di ji hebûne ku hunerên weha bîlind nişan dane. Yek jî wan jî Siyahpoş bûye. Wî dî pirtûka xwe ya bî navê "**Seyful-**

**mulûk**" da, weha salixê rewşa evindariya pîsmirê<sup>(7)</sup> Mîsrê Seyfulmulûk daye:

"Dıgel çengê dinalî şahê dılsoj  
Duxanê dıl dîbû mij, pêşberê Roj".

"Çeng" navê sazêk e. "Duxan" Erebi ye; mana wê "dû" ye. Wek ku diyar e, wi ji bî hunermendiyeka mezın, dîyê dîlê pîsmir wek mijek nişan da ye.

Siyahpoş dî çiyeki di yê wê pirtûka xwe da ji dema salixê rındiya dotmîra<sup>(8)</sup> İremê daye, ku navê wê "Bediulcema" bûye, dî heqê rûyê wê û bîskên wê da weha gotiye:

"Çı heddê gul, dıgel wechê munewwer  
muqabil bit, û rihan zulfê dilber!".

"Wechê munewwer" yani "rûyê bîmûr, rûyê ronî, rûyê zelal". Ev her du malîk bî Kurdiya xwerû weha ne:

"Çı hedê gulê bû ku xwe bîda ber rûyê ronî û zelal!  
Û çı hedê rihanê bû ku xwe bîda ber zulfên dilberê!"

Wek ku me lî jor da zanin, huner dîlkêş e, lê tîm dîlê mîrov geş û xweş nake; eger lî ser rewşên neyin hatibe afirandın, hîngê ji dîlê mîrov dihejine, tewr<sup>(9)</sup> dêşine ji. Mesela, Melayê Cıziri dî helbesteka xwe da, ku tê da deng lî xwe kîriye, wehe salixê zulma yara xwe lî xwe daye:

"Bêmîrwetê dıl herîşand  
terşbihê şişê lê kîşand  
ker kîr ceger, xwey lê reşand  
ateş lî ser dani, Mela".

"Bêmirwetê" yani nemîrovê. "Teşbihê şîşê" yani tîşteki wek şîşê. "Ker kîr" yani kerî kîr, parçe kîr. "Ateş" Farîsî ye; yani agir. Wek ku diyar e, Melê dî van malîkên xwe da bî hostatiyekê mezîn salîxdanekê wîsa afirandîye ku, dilê mîrov dihejîne û dêşîne. Mîrov dikare jî vê salîxdanê ra bêje "trajedî".

\*

Pîştê ku me jî edebiyata Kurdi ya klasîk ev minakên jorîn nişan dan, vêca jî em lî hîn stranên Kurdi yê gelî bînerîn û bala xwe bîdîn hunera salîxdanê ya ku dî wan da hatiye afirandin.

Stranekê evîne heye; navê wê "Domamê" ye. Wek ku tê zanîn, peyvîka ku jî vê stranê ra bûye nav, dî eslê xwe da "dotmam" e. Lê lî vîr, jûbo ku stran bî awayekî nerm biherike û ahenga wê xweş bibe, tîpa "t"yê ya bêdenga req jî peyvîkê ketiye û peyvîk bî awayê "domam" hatiye karanîn. Dî hîn stranên gelî yê di da jî vî awayî ci girtiye. Mesela, stranekê govendê jî bî vî navî heye, ku dî wê da jî peyvîka "dotmam"ê bûye "domam". Dî wê stranê da weha tê gotîn:

"Lê lê domamê, lê lê domamê  
Lê lê domamê, şekîrê Şamê".

Strana ku babetê me yê salîxdanê ye, jî devê xortekî evîndar hatiye gotîn. Ew xort bûye evîndarê dotmama xwe, lê dilê dotmama wî jê ra tunebûye; yanî evîna wî yekalî maye. Dîgel wê yekê jî, ev stran lî ser dotmama xwe gotiye. Em'ê lî vîr parçeyekê wê stranê wek minakekê salîxdanê nişan bîdîn. Wek hîn stranên me yê gelî yê di, dî vê parçeyê da jî qala memîkan hatiye kirîn; bîla xuşk û bîrayên berrêz lî me bîbûrîn. Xortê evîndar dî ciyekî stranê da deng lî dotmama xwe kirîye û weha salîxê rîndîya wê daye:

"De lê lê lê domamê, bejna domama mî  
mina ye tayek rihana nûşîtîlî

Sing û berê domama mı mina ye çiyayê Qerecdaxê  
 ku berf û baranê zû lê kiri<sup>(10)</sup>  
 Memikên domama mı mina ne mewijên Çêrmûkê ku  
 bı mêwa xwe ve heba xwe çêkiri<sup>(11)</sup>  
 Pozê domama mı mina ye Kela Mêrdinê, ku hosta û necaran  
 jî kêfa dîlê xwe ra xweş çêkiri  
 Xwedê zane isal heft sal e mı hêviya xwe jî rehma Xwedê  
 neburri, wele bile mı j'te birri  
 Mı kevîrek dı nava qatên pişta Ecem da pêçaye-w  
 daye ser vi dîlî".

Wek ku eşkera diyar e, lı vîr salıxdaneka wısa xweş hatiye  
 afirandin ku jî aliyê huneri ve gelek rûmetbîlind e. Mırov dı-  
 bêje qey hozaneki hunermend lı çiyek rûniştiye û bı awayeki  
 edebi helbestek nıvısiye û tê da salıxeki weha gıranbuha daye.

Dı malıka paşın a vê parçeya stranê da hunereka dı ji heye;  
 em'ê dı beşê "Biraninê" da wê ji bîdın zanin.

Straneka me ya evinê ji heye; navê wê "**Mûsa, mere**" ye.  
 Ew, strana hêla Mûşê ye. Keçek û xortek hev evandine; jıbo ku  
 bızewıcın û bıgıjın mıradê dîlê xwe, bı hev ra reviyane. Navê  
 keçıkê Sıti bûye; dı stranê da jê ra hatiye gotın "Sıtiya  
 Mamê".<sup>(12)</sup> Navê xort ji Mûsa bûye. Piştê ku reviyane û jı gun-  
 dê xwe qasek dûr ketine, peyayên mala bavê keçıkê bı pey wan  
 ketine û jı paş ve tıfing lı wan teqandine. Guleyeka wan lı nava  
 mîlê keçıkê ketiye û keçık bırındar bûye. Mûsa, dı şûna ku keçi-  
 kê bıparêze, keçıka reben wısa bırındar hiştiye û pişt pan kı-  
 riye<sup>(13)</sup> û reviyaye. Hingê keçık lı pey wi qiriyaye û deng lê  
 kiriye, gotiye "Mûsa, mere". Aha ew peyva keçıkê jı stranê ra  
 bûye nav. Keçıkê dı despêka stranê da weha gotiye:

"Mere, mere, lo Mûsa, mere

Malmirato, tu'ya lı ser mîlê rastê carek, du car,  
 sê car lı mı vegere

Bala xwe bıde nava mîlê Sıtiya Mamê, Gurciya Mûşê,  
 mina avên newal û kaniyan xwin jê dere".



Mexsed ji "Gurciya Mûşê" rında Mûşê ye. Jı ber ku keçên Gurciyan bı rındiya xwe hatine naskirin, dı nava Kurdan da keçên pırr rınd bı wan hatine şıbandın û jı wan ra hatiye gotın "Gurci".

Sitiya Mamê çiqas deng lı Mûsa kırıye û jê ra gotiye "mere" ji, bêfêde bûye. Mûsa hem pûç û tırsok, hem ji bêbext derketiye û reva xwe domandiye û çûye. Hingê keçikê xwestiye fort û pesnên wi yê mêraniyê bine bira wi, û weha salixê mêraniya wi ya pûç daye:

"Mûsa, malmirato, ne weha ye, lo ne weha ye  
Mêrani ne bı quretiya l'nav mala ye  
ne bı çize-çiza gizma-w qondera ye  
ne bı xwarkırına kum û kolosan l'ser xaniya ye<sup>(14)</sup>  
ne bı demança bırobelo ya l'kêleka ye  
Malmirato, te dıgo wextê lı mı bıqewime,  
ez xenimê sed mêra me; mere mere, lo bext ne wa ye  
Wele bextê te ne bextê mêra-w cıwamêra ye".

"Ne wa ye"ya dı malıka beri ya paşın da, yani "ne weha ye". Jıbo xweşbûna ahenga stranê, peyvıka "weha"yê hatiye kurtkırın û bûye "wa". Lı vır tıştê jı me ra pêwist, ew huner e ku mêraniya Mûsa pê hatiye salıxdan. Gerçı mêraniya ku bûye babetê vê salıxdanê ne mêranıyeka rastın bûye, pûç û vala bûye; lê jı aliyê huneri ve salıxdan bêqusûr e.

Lê belê kesên ku lı ser mêraniya wan hunera salıxdanê hatiye afirandın, gışt wek Mûsa pûç û tırsok nebûne. Hın kes ji hebûne ku, tam lı gora salıxdana mêraniya xwe bûne. Mesela, straneka me ya geli ya pırr naskırı heye; navê wê "**Strana Mala Nasır**" e. Ew stran dı demeka pırr berê da lı ser şerê Mala Nasır û Mala Quto hatiye gotın. Jı ber wê yekê, naveroka wê nexweş e, şerê eşiriyê û kuştın e. Lê belê stran jı seri heta paşiyê bı hın salıx-

dan û şıbandınên wısa xweş hatiye xemilandın ku, mirov jı wan ra heyran dımıne. Ew salıxdan û şıbandın ne tenê jı aliyê folklori ve gıring in, lê dı eynê demê da rûmeteka huneri ya pırr bılind jı dıdın stranê. Ew huner hêj jı despêka stranê ve weha diyar dıbe:

"Eminayê bı sê dangan bang kırı goti: Lê lê gulizera mı,  
lê Husnayê, sıbe bû dema dılê mı gıriya  
Wele bile sıbe bû dema dılê mı gıriya  
Ez'a nızanım vê sıbekê çı bû, çı cıriya  
Xwina box û beranan lı ber derê mala bavê mı porkura  
Xwedê wa rıjiya".

Dıvê mirov bı taybeti bala xwe bıde peyva "dılê mı gıriya". Ev, peyveka gelek orijinal e û jı aliyê huneri ve gelek gıranbuha ye. Eminayê negotiye "çavê mı gıriya" yan "ez xemgin bûm" yan "dılê mı şewıtı" û wd. Lê gotiye "dılê mı gıriya". Dıl merkeza laşê mirov e; ku dıl bıgırı, mana wê yekê ev e ku tışteki mirov lı ser saxiya xwe namine.

Vêca em bala xwe bıdın salıxdaneka mêraniyê, ku dı stranê da hatiye afirandın. Dı ciyeki stranê da weha salıxê mêraniya xortên Mala Nasır hatiye dayın:

"Xortên Mala Nasır, jı berê ve bı kıras û derpiyên Bışêri ne  
Bı ebayên gundoyi ne  
Bı kumên devetûki ne  
Bı xıncerên destizivi ne  
Dı lingên wan da gizmên Entabi ne  
Dı destên wan da tıfingên modeli ne  
Dı tıfingên wan da fışekên çaplı ne  
Roja şer û xemên gıran, gava dıkevın nava heft bavên eşıran,  
mina ne zêrên zer ên helandi ku tu bavêji nava komên  
Mecidiyan, wer xuyayi ne".

"Tıfingên modeli" û "fişekên çapli" dı dema Osmaniyan da navên hın tıfingan û hın fişekan bûne. "Mecidi" ji yekitiyeka peran a Osmaniyan a zivin bûye û sıpi bûye, rûmeta wê ji 20 qurîş bûye. Jı ber ku ew pere dı dema padişahê Osmani Evdî-mecid (1839-1861) da hatiye çapkırın, ew nav lê hatiye danin. Jı wi navi ji tê famkırın ku ev stran gelek kevn e.

Dı vê parça stranê da tiştê ku jı me ra dibe babatê nêrinê, ew salıxdan û şıbandın e ku bı hunermendiyeka mezın hatiye afirandın. Xasma dıvê mirov bala xwe bıde malıka paşın, ku tê da xortên mala Nasır bı zêrên zer ên helandi, dijminên wan ji bı komên Mecidiyên zivin ên sıpi hatine şıbandın. Yani zêrên zer ên helandi dı nava komên Mecidiyên zivin ên sıpi da çawa dıbrırıqın, xortên Mala Nasır ji dı nava dijminên xwe da wisa berçav û xuyayi bûne.

## DI SALIXDAN Ê ŞİBANDINÊ DA MUBALEXE

Dı salıxdan û şıbandınê da awayeki di, hunereka di ji heye; ew ji mubalexeya dı salıxdanê û şıbandınê da ye. Dı vi awayi da şıbandi û pêşıbandi ciyên xwe bı hev dıguhêrın û her yek jı wan dıkeve şûna yê di, her yek jı wan rola yê di dıleyze. Em dışên jı vi awayê şıbandınê ra bêjın "şıbandına vaji" ji. Mesela, eger dêmên yarek bên şıbandın bı gulê, ew dibe şıbandıneka adeti; lê eger gul bê şıbandın bı dêmên yarek, ew dibe mubalexe dı şıbandınê da. Ev awayê şıbandınê edebiyatê xweştir dıke, dibe xeml û xêza edebiyatê.

Hozanên Kurd ên berin,<sup>(15)</sup> dı helbestên xwe da carna ev awayê hunerê bı kar anine. Mesela, Ehmedê Xani dı beşê 8'an ê "Mem û Zin"ê da lı ser pesnê Mirê Botan Mir Zeydin, weha gotiye:

"Muhtacê sexaweta wi Hatem  
Mexlûbê şecaeta wi Rıstem".

Ev her du malîk bî Kurdiya xwerû weha ne:

"Hatem dibû muhtacê merditi û cıwamêriya wi  
Rıstem zorbiri dibû lı ber mêrxasi û xweşmêriya wi".

Wek ku tê zanin, Hatem wisa cıwamêr bûye ku, bûye nişan û sembol jıbo cıwamêriyê; kesên pırr cıwamêr bı wi hatine şıbandın. Rıstem ji wisa mêrxas bûye ku, bûye nişan û sembol jıbo mêrxasi û xweşmêriyê; kesên pırr mêrxas û xweşmêr bı wi hatine şıbandın. Lê belê Xani lı vır bı hunermendiyeka mezın, cıwamêri û mêrxasiya Mirê Botan wisa bılınd kırıye ku, Hatem jê ra kırıye muhtac, Rıstem ji lı ber wi zorbiri kırıye.

Xani dı beşê 39'an ê "**Mem û Zin**"ê da ji daye zanin ku Memê dema çûye nava baxçeyê Mir, lı wır deng lı bılbıl kırıye û jê ra weha gotiye:

"Zina me jı sorgula te geştır  
Bextê me jı taliê te reştır".

Wek ku baş tê zanin, dı edebiyat û folklorê da sorgul bûye nişan û sembola rındi û xweşikiya pırr; keçên pırr rınd û xweşik bı sorgulan hatine şıbandın. Lê Xani lı vır bı hostatıyeka mezın, jı devê Memê daye zanin ku Zin jı sorgulê geştır e.

Melayê Cıziri, dı helbesteka xwe da weha pesnê birûyên yara xwe daye:

"Mın go mehê new: Çasıyê ebrûyê yar i  
Go: Mın çı hed e! Şubhetê ne'lê feres ım ez".

Ev her du malîk bî Kurdiya xwerû weha ne:

"Mın jı hıva nû ra got: Tu dışıbi birûyên yarê  
Got: Çı hedê mın e! Ez dışıbım nala hespê".

Wek ku dîxuye, Melê lî vîr ne ku birûyên yara xwe şibandîne hîva nû; lê tam çewtê wê yekê, hîva nû şibandiye birûyên yara xwe. Mana vê şibandîne ev e ku birûyên yara wî jî hîva nû xweşîktir bûne. Melê qîma xwe bî wê şibandîne jî naniye; birûyên yara xwe jî hîva nû jî xweşîktir nişan dane û hîva nû lî ber wan şibandiye naleka hespan. Tîştêki balkêş jî ev e ku wî ev mane û ev şibandîn û ev mubalexe gîşt, dî du malîkan da bîcî kirîne. Ev jî hostatî û hunermendiya wî ya mezînişan dîde.

Yek jî hozanên me yê pîrr hosta û hunermend jî Feqîyê Teyran e. Nuqteyeka balkêş a ku wî hozanî jî hozanên di cuda dîke ev e ku, wî lî ser sîrîştê<sup>(16)</sup> û tîştên sîrîştî<sup>(17)</sup> jî hîn helbestên hêja û gîranbuha nîvîsîne. Navê yekê jî wan helbestan **"Ey av û av"** e. Feqî dî wê helbestê da deng lî avê kirîye û jê pîrsîye ku ew jî kêderê tê û dîçe kêderê, çîma û bî fermana kê wîsa tîm dîherîke; dî cîyek da jî weha gotîye:

"Bêrahêt û bêsekne yî  
 Reh şubhetê qelbê me yî  
 Yan aşîqê Baxwêy' xwe yî  
 Lew jî îşqê natebîtê?"

"Rehşubhetê qelbê me yî" yanî tu wek dîlê me yî. "Baxwêy' xwe" yanî Xwedayê xwe. "Natebîtê" yanî tu natebîtî; jîbo ku dûwayîya vê malîkê lî dûwayîya parçeyên di bê, dî şûna "î"yê da "ê" hatiye dûwayîya wê. Lî vîr tîştê ku dîbe babetê me ev e ku Feqî av şibandiye dîlê xwe. Yanî awayê adetî û sîrîştî ew bû ku dîlê xwe bîşîbanda avê. Lê çewtê wê yekê, av şibandiye dîlê xwe û bî wî awayî daye zanîn ku tevgerên dîlê wî jî tevgerên avê sîvîktîr û lezâtîr in. Eşkera ye ku ev, hunermendiyeka gelek mezînişan e.

Ehmedê Xanî dî beşê 23'yan ê **"Mem û Zîn"**ê da qal kirîye ku dema daweta Sîtiyê û Tacdîn, hîn jî çûne, da ku Zînê û Sîtiyê bîxemilînin. Xanî dî heqê çavên wan da weha gotîye:

"Qadir nedibûn jî surmeê reş  
ahûyê Xuten bîkîn muşewweş".

Ev malîk bî Kurdiya xwerû weha ne:

"Nedişîyan bî kîlê reş, tewr yek carek tenê  
xîra bîkîn çavên wan xezalên Xutenê".

"Xuten" herêmekê Tirkîstana Rojhîlat bûye, ku bî xweşîkiya xezalên xwe hatiye naskirin. Xani Sîti û Zîn şîbandine wan xezalan û daye zanin ku jînen xemlinok nedişîyan çavên wan bî kîlê reş xîra bîkîn. Wek ku tê zanin, çavên keçan û jînan bî kîlê reş xweşîktir dibin. Lê Xani lî vîr daye zanin ku çavên her du xuşkan wîsa xweşîk bûne ku, eger bîhatina kîrkirin dê bî kîl xîra bîbûna.

\*

Jîbo hostayeki mezîn ê wek Ehmedê Xani, ne dûrê aql e ku hunereka weha dî pêplokeka ewqas bîlind da afirandiye. Lê belê em dibînin ku dî straneka Kurdi ya gelî ya gîranbuha da jî hunereka weha mezîn hatiye afirandin. Dî wê stranê da xortekî evîndar deng lî yara xwe kîriye û lî ser xweşîkiya çavên wê weha gotiye:

"Keçê dinê, e'l'vi bani, lê tu l'wi bani  
Dî navbera mîn û te da heşîn dibî mîng û çîmen,  
lê gul û kani  
Çavên te reş in, dî riya Xwedê da tu kîlê subhani  
jî wan ra neki bargirani".

"E'l'vi bani" yanî ez lî vi bani. Jîbo xweşbûna ahenga stranê, her sê peyvîk tînen kurtkîrin û weha bî hev ve tînen zelîqandin, bî hev ve tînen tewandin.

Dema mırov vê hunerê dı straneka geli ya weha da dibine, mırov şaş dibe û mat dımine. Lewra ew xortê evindar ê ku ev huner nişan daye, bı ihtimaleka mezin xorteki gundi û nexwendî bûye. Bivê nevê ev pırsa ha tê aqılê mırov: Gelo wi xortê evindar, Ehmedê Xani dı xewna xwe da ditiye û Xani jê ra gotiye "Mın weha gotiye, tu ji weha bêje"?

\*

Salıxdan û şıbandıneka balkêş a ku dı edebiyata klasik û hin stranên geli da ci gırtiye, şıbandına ramisana rûyên yaran e bı tewafê. Wek ku tê zanin, "tewaf" peyvikeka Erebi ye û wek termeka dini, jı gera lı dora Ke'beyê ra tê gotın. Yani heci lı dora Ke'beyê dıgerın û ew ger dıbe tewaf. Lê belê dı edebiyata klasik û hin stranan da ew peyvık jıbo ramisanê hatiye karanin.

Mesela, Melayê Cıziri dı helbesteka xwe da ramisana rûyê yara xwe şıbandiye tewafê û weha gotiye:

"Jı ber dêmê niqab avêt û destûra tewafê da  
Dı se'yê best-ı ihramê, û mın Eswed ziyaret kır".

"Niqab" yani perde. Melê dı malıka 2'yan da xala rûyê yara xwe şıbandiye Hecer'esweda dı diwareki Ke'beyê da, xwe jı şıbandiye heciyek û daye zanin ku wi xala lı rûyê yarê ziyaret kır. Tıştê ku lı vır jı me ra pêwıst e ev e ku Melê jı ramisana rûyê yara xwe ra gotiye "tewaf".

Melê dı helbesteka xwe ya di da maçkırına pê û destên yara xwe jı şıbandiye tewafê û weha gotiye:

"Ger bıdıt dest-ı, tewafa pê û destan bıkırim  
wê mecalê bı wuqûfa Erefatê nadım".

"Ger bıdıt dest" yani eger dest bıde, eger mımkun be, eger mecal çêbıbe. Ev jı "desdan"ê tê, ku idyomeka Kurdi ye. "Wu-

qûfa Erefat"ê yani rawestana lı ser girê Erefê. Wek ku tê zanin heci bı wê rawestanê dıbin heci. Melê bı van her du malıkan daye zanin ku, eger jı maçkırına pê û destên yara wi ra mecal çêbibe, ew wê mecalê bı rawestana lı ser girê Erefê nade.

Hozan Laxer ji ramisana gerdana yara xwe weha şıbandiye tewafê:

"Tewafa gerdenê carek mı kır' bû  
Jı bir nakım ewê yekcariyê qet".

\*

Jıbo hostayeki mezın ê wek Melayê Cıziri ji ne dûrê aqıl e ku hunereka weha rûmetbılınd afirandiye. Lê belê em dıbinın ku dı straneka Kurdi ya geli da ji hunereka weha mezın û granbuha hatiye afirandın. Ew stran straneka Amedê ya evinê ye. Dı wê stranê da ji xorteki Amedi yê evindar ramisana rûyê yara xwe şıbandiye tewafê û weha gotiye:

"Derê Çiyê bızengıl e  
Derê Mêrdina şewıti lı beranber e, mıqabil e  
Mı di vê sıbekê gewra mın a delal jı hemama  
Melik Ehmedê derket, por' i şıl e  
Mı kır ku ez herım tewafa hınarên rûyan, xana gerdenê;  
jı mı ra go: Lawıko, bı aliyê mı ve meyê, iro sê roj e  
dıdanê mı dêşe, rûyê mı j'ber kul e".

"Derê Çiyê" û "Derê Mêrdinê" du derên sûra bajarê Amedê ne. Dı wê sûra diroki da du derên di ji hene; navê yekê jı wan "Derê Nû" ye, navê yê di ji "Derê Ruha"yê ye. Jı ber ku Derê Ruhayê lı aliyê rojava ye, dewleta Romê ji lı wi aliyi ye, jı wi deri ra "Derê Romê" ji tê gotın. "Melikehmed" ji taxeka bajarê Amedê ye. Tıştê ku lı vır dıbe babetê me ev e ku xortê evindar ramisana rûyê yara xwe û gerdana wê şıbandiye tewafê.



Dı straneka geli ya di da ji em vê hunera giranbuha dîbinin.  
Dı wê stranê da ji xorteki evindar yara xwe şibandîye xezalek,  
ramisana dêmên wê û gerdena wê ji şibandîye tewafê û weha  
gotiye:

"De lê lê lê, mî jî xwe ra xezalek rakır jî beriya Mêrdînê,  
jî mexerê  
Berê xezala mî ket aliyê Serhedê, jî zozanan  
zozanê Elenderê  
Mî go: Lê lê xezalê, xwezi mî tu bıgirtayi,  
mî milê xwe lî newqa te ya zırav bîpêça,  
destê xwe bavêta qûlpa wê kemerê,  
mî ramisan tewaf bıkira jî dêmên te yên guli,  
jî xana gerdena te esmerê  
Bıla sed û salek cezayê idamê jî mî ra bıhata,  
ez bıbûma girtiyek jî girtiyên mirata wê çeperê".

Lî ber van her du stranan ji mîrov disa şaş dibe û mat dîmine.  
Gelo wan her du xortên Kurd ên evindar çawa karine wek Me-  
layê Cıziri, wek wi hostayê mezin hunereka weha bıafirinî û  
ramisana rûyên yarên xwe wek wi bışîbinî tewafê? Bivê nevê  
lî vîr ji ev pîrsa ha tê aqilê mîrov: Gelo wan xortên evindar ji  
Melayê Cıziri dî xewna xwe da ditne û Melê jî wan ra gotiye  
"Mîn weha gotiye, hun ji weha bêjîn"?

## **BİRANİN (TELMİH)**

Dı edebiyat û folklorê da yek jî hunerên meqbûl ji "biranin" e.  
Biranin ew e ku nîviskarek yan hozanek yan ji stranbêjek, bı  
tevokek<sup>(18)</sup> yan bı malîkek, îşaret bı aliyê bûyerek ve, çirokek  
ve, peyveka pêşîyan ve û wd bıke, wê bûyerê, wê çirokê, wê  
peyva pêşîyan û wd bine bira xwendevanan yan bira guhdaran.

Jı vê hunerê ra bı Erebi "telmiñ" tê gotın. Em dışên bı Kurdi jê ra bêjın "biranin" yani anina bûyerek, çirokek, peyveka pêşiyân û wd bı bira xwendevanan yan guhdaran.

Ev, hem dı edebiyatê da, hem ji dı folklorê da hunereka gelek granbuha ye. Hem dı edebiyata Kurdi ya klasik da, hem ji dı folklorê Kurdi da mirov carna rastê vê hunerê tê.

Mesela, Ehmedê Xani dı beşê 23'yan ê "**Mem û Zin**"ê da qala daweta Sitiyê û Tacdin kırıye û weha salixê derxistina bûkê jı koşkê daye:

"Nageh geriya bı Cûdi meftûh  
dergahê kerem lı keştiya Nûh".

Ev her du malik bı Kurdiya xwerû weha ne:

"Jı nişka ve derê qencyê vebû lı ser  
çiyayê Cûdi, lı gemiya Nûh Pêxember".

Hozanê mezın bı van her du malikan, işaret bı aliyê gemiya Nûh Pêxember ve kırıye, ku **Qur'an** dibêje piştê tofanê lı ser Çiyayê Cûdi rawestayê. Yani bûyera rawestana wê gemiyê lı ser çiyayê Cûdi, aniye bira xwendevanan.

Xani disa dı wi beşi da Sıti şıbandiye Belqısayê, ku Mirbanûya Sebayê bûye û çûye nık Sılêman Pêxember; textê ku Sıti lı ser rûnişti bûye, ew ji şıbandiye textê Belqısayê; kesên ku ew text hılgirtine û ber bı mala Tacdin birine, ew ji şıbandine Asefê Berxiya, ku wezirê Sılêman Pêxember bûye û bı keramet textê Belqısayê aniye nık Sılêman Pêxember. Xani bı wan şıbandinan ew bûyer aniye bira xwendevanan û weha gotiye:

"Sed Asefê Berxiya, weki ba  
hemmalı dıkir bı erşi, dılşa".

Ev malîk bî Kurdiya xwerû weha ne:

"Sed Asefên Berxiya, hemi wek ba  
pîştivani dîkîrî ji wi textî ra, hemi ji dîlşa".

Xani dî beşê 27'an da qal kîriye ku Zîn bî derdê evina Memê derdedar bûye û ketiye nava nîvînan. Hîngê hevalên wê lê civiyane, jê daxwaz kirine ku rabe û wek berê xwe bixemilîne, bî rîndiya xwe xelkê din û har bike; dî nava peyvên xwe da jê ra weha gotine:

"Meyxur ke melan bî xenc û nazan  
Şêxan tu bîşîne ber berazan".

"Bî xenc û nazan" yanî bî şîrînkîrî û nazan.

Hozên bî malîka 2'yan, bûyera Şêxê Sen'ani aniye bira xwendevanan. Wek ku tê zanîn, Şêxê Sen'ani jîbo evina keça qralê Ermenîstanê dinê xwe guhartiye û çûye ber berazan.

\*

Em gelek kêfxweş û serbîlînd in ku dî hîn stranên me yê gelî da jî ev hunera gîranbuha hatiye karanîn. Ev jî nişan dide ku stranbêjên Kurd çiqas jêhati û hunermend bûne ku karîne hunerêka weha hêja bîafîrînan û jî guhdarên xwe ra pêşkêş bikin.

Straneka me ya gelî ya evîne heye, navê wê "**Feqî, heyran**" e. Ew stran gelek kevn e, dî demeka pîr berê da lî ser evina keçek jî feqîyek ra hatiye gotin. Ew feqî jî hêla Qersê, jî Newala Qaqîzmanê bûye. Navê wi jî "Feqî Hesenê kurê Hecî Osman" bûye. Ew feqî çûye gundek, lî nîk melayê wi gundî xwendîye. Demeka kurt paşê evina wi ketiye dîlê keça wi melayî. Lê belê feqî nexwestîye xwe nêzê keçîkê bide. Stran wek diyalogeka dî navbera keçîkê û feqî da hatiye afirandin. Keçîkê dî serê peyvên

xwe da ji feqi ra carna gotiye "feqi, heyran", carna ji gotiye "feqi, qurban". Bî wi awayî, peyva wê ya "feqi, heyran" jî stranê ra bûye nav. Keçîkê lî ciyekî stranê jî feqi pîrsiye ku gelo ezeb e yan zewicandî ye. Feqi pê daye zanin ku zewicandî ye û bî dilê xwe zewiciye. Hingê keçîkê jê ra weha gotiye:

"Keçîk dîbê: Feqi, qurban, bejna mî jî te ra tayek  
jî tayên lo vê biyê  
Jî kêfa dilê xwe ra heşin dibe lî ber ava lo vê kaniyê  
De tu were destê mî bigire bîrevine, jî xwe ra bibe;  
jîbo xatirê dilê xwe yê rezil ez'ê bîkîşinim derdê  
lo wê hewiyê"

Lê belê dilê feqi tunebûye ku tîşteki wîsa bîke. Weha bersiva wê daxwaza keçîkê daye:

"Feqi dîbê: Keçê dinê, ne ez har im, lê ne ez din im  
Dilê mî ne xan e ku ez her kîhêlek tê da lê bitewîlînim  
Ez hatime evî gundi jîbo xwendinê; kaniya ku ez av jê vexum,  
mî navê ez bîherîminim".

Peyva feqi ya paşin, peyveka pêşîyan a Kurdi tine bira guhdarên stranê. Ew peyva pêşîyan ev e: "Kaniya ku mirov av jê vexwe, mirov tê da nari".<sup>(19)</sup> Ev peyva pêşîyan lî ser wefadarîyê tê gotin. Yani ci yan kesê ku mirov qenci jê bîbine, divê mirov jê ra wefadar be û xîrabi pê neke, dî heqê wî da nankorî neke.

Me lî jor qala strana "**Mûsa, mere**" kîrbû û parçeyek jê nişan dabû. Dî parçeyeka di ya wê stranê da, hunera biranînê jî ci girtiye. Dî wê parçeyê da Sîtiya Mamê weha gotiye:

"Konê bavê Sîtiya Mamê dani l' devê avê  
Mî di Mûsakê'm jî wê ve hat, kum û kolos xwar kîr,

mina gamêşê hêç dabû nav'ê  
 Ku mirov da avê, çî lî çokê, çî lî qırîkê, malmirato, çî lî navê  
 Tu'ya tîfinga modeli jî milê xwe daxê, bî ser peyayên  
 mala bavê mî da vegere, lo yekê bavê  
 Bî sê dengan bîke qirin, bêje ez Mûsa me, kilê çavê Sîtiya  
 Mamê, Gurciya Mûşê, lo bejnziravê".

Malîka 3'yan a vê parçeyê, peyveka pêşiyên a Kurdi tine bira  
 guhdaran. Ew peyva pêşiyên ev e: "Ku mirov da avê, çî lî çokê,  
 çî lî navê". Ev peyva pêşiyên lî ser domandîna kar û tevgeran û  
 lî ser berpîrsyariya dî kar û tevgeran da tê gotin. Yani dema  
 mirov têkeve karek, tevgerek, divê mirov xwe jê nede paş û wî  
 kari, wê tevgere bîdomine; piştê ku mirov têkev'ê, divê mirov  
 êdî nefikire ku ew kar, ew tevger dê jî mirov ra zîrar bine; eger  
 zîrar bine jî, divê mirov wê zîrarê bîde ber çavê xwe.

Lî vîr mîn divê ez lî ser peyva "ku mirov da avê" piçek bise-  
 kinim û mana wê ya idyomi bî xuşk û birayên berrêz bîdîm za-  
 nin. Wek ku tê zanîn, hîm peyvîkên me, hem maneyên wan ên  
 ferhengî hene, hem jî maneyên wan ên idyomî hene. Kîrdara<sup>(20)</sup>  
 "dayîn"ê jî yek jî wan peyvîkan e. Ev kîrdar dema berî peyvîka  
 "av"ê bê karanîn, maneyaka idyomî dîde; ew mane ev e: "Çûyî-  
 na nava avek, bî qesta derbasbûna dî wê avê ra jî aliyek ber bî  
 aliyê dî; ku mirov here nava avek, da ku jî aliyekî wê avê der-  
 basê aliyê wê yê dî bibe".

Dî vê parçeyê stranê da hunereka dî jî heye; em'ê dî beşê  
 "hevtîpi"yê da wê jî bîdîn naskirin.

Straneka me ya evîne ya dî jî heye; navê wê "**Xirabo**" ye.  
 Ew stran jî gelek kevn e. Ew stran jî wek "**Mûsa, mere**" jî devê  
 keçek hatiye gotin. Lê navê wê keçîkê dî stranê da ci negirtîye.  
 Wê keçîkê û xortek hev evandîne. Lê belê ew xort paşê bûye  
 evîndarê keçeka dî jî. Hîngê keçîka berê qeheriye û ew stran  
 gotîye. Keçîkê dî stranê da car bî car deng lî evîndarê xwe yê

nedurust kırıye û jê ra gotiye "xırabo". Bı wi awayi, ew peyvık jı stranê ra bûye nav. Keçıkê dı ciyeki stranê da weha gotiye:

"Lo lo xırabo, kuro, lo xırabê dinê  
Malxırabo, te çıma gula xwe da bı sosinê?  
Wele bile te miya xwe da lo bı bızınê  
Wey lawıko, ez vê sibê derketım ser xêni,  
rûniştım lo lı ser locınê  
Mı di te berê xwe jı mı keçıkê, jı mı xweşikê,  
jı mı narinê zıvırand û da wê tolejınê".

Keçıkê jı qehran, jı keçıka di ra gotiye "tolejın". Wek ku tê zanin, dı zımanê Kurdi da jıbo jınên bêexlaq "tol", jıbo mêrên bêexlaq ji "tolaz" tê gotın. Tıştê ku lı vır jı me ra pêwist e ev e ku keçıkê dı malıka 2'yan û 3'yan da peyveka pêşıyan a Kurdi anıye bira guhdaran. Ew peyvya pêşıyan weha ye: "Sê ehmeq hene lı dinê; ê ku gulê dıde bı sosinê, ê ku miyê dıde bı bızınê, zavayê ku dıçe ser mala bavê jinê".<sup>(21)</sup>

Me parçeyek jı strana "**Domamê**" lı jor nişan dabû û jı aliyê salıxdanê ve ew parçe dabû naskırın. Dı malıka paşın a wê parçeya stranê da evındêr weha gotiye:

"Mı kevırek dı nava qatên pıšta Ecem da pêçaye-w  
daye ser vi dılı".

"Pıšta Ecem" tewırek kefi bûye û berê mêrên Kurdi ew lı pıšta xwe pêçane. Kurık bı peyvya "dayına kevır lı ser dıl", kevıreki sêrkiri yê mitolojik anıye bira guhdaran. Jı wi kevırı ra tê gotın "kevırê sebrê". Ew nav, wek idyomek ketiye zımanê Kurdi û jı zımên ra bûye mal. Mesela, dema tışteki dıjwar û zor bê serê kesek, ew kes dibêje "Ez'ê kevırek bıdım ser dılê xwe û sebr bıkıım" yan ji hın kesên di jê ra dibêjın "Kevırek bıde ser dılê xwe û sebr bıke". Bıngêhê wi navi û wê idyomê, çirokeka

Kurdi ya geli ye. Ew, çirokeka mitolojik e, navê wê ji "Kêrika'm, Sebrîka'm" e. Dî çirokê da tê gotin ku pirejnêka sêrkar kevîreki sêrkîri daye keça padişahêk, ku navê wê "Dêmgul" bûye. Jînkê jî keçîkê ra gotiye "Dema tu têkevi rewşeka zor, vi kevîri bîde ser dîlê xwe û bîşîdine, ew'ê sebrî bîde te". Jî ber wê yekê, navê kevîr bûye "kevîrê sebrê".(22)

## HEVTÎPÎ (CÎNAS)

Yek jî awa û tewîrên hunerê ji "hevtîpî" ye. Jî wê hunerê ra bi Erebi "cînas" tê gotin. Ew huner ew e ku dî malîkeka helbestek da yan stranek da yan dî hîn malîkên lî pey hev da yan jî dî tevokek da hîn peyvîkên wîsa bîn karanîn ku hemî tipên wan yan hîn tipên wan wek hev bîn, lê maneyên wan jî hev cuda bîn. Ew peyvîkên ku tipên wan wekhev in û maneyên wan cuda ne, mîrov dikare jî wan ra jî bêje "peyvîkên hevtîpî".

Çend tewîrên hevtîpiyê hene; wek "hevtîpiya tam", "hevtîpiya nivçe", "hevtîpiya vaji" û wd.

Hevtîpiya tam ew e ku tipên karhati bî tevayî wek hev bîn, lê maneyên wan jî hev cuda bîn. Em'ê lî vîr berê, çend minakan jî hevtîpiya tam jî xuşk û bîrayên berrêz ra pêşkêş bîkîn.

Ehmedê Xani dî despêka beşê 4'an ê "Mem û Zîn"ê da deng lî Pêxember kirîye û weha gotiye:

"Şahînşehê textekê Medîne  
Mu'cîz jî te ew qedêr me dîne".

"Mu'cîz" yanî mu'cîzeyên pêxemberiyê. Wek ku dîxuye, lî vîr tipên "Medîne" û "me dîne" bî qasê hev û wek hev in, lê du maneyên cuda dîdîn, bî vi awayî jî hunera hevtîpiyê pêktînn. Gerçî dî nivîsînê da "M"ya "Medîne"yê gîr, "m"ya "me dîne" jî hûr tê nivîsîn, lê dî gotîne da wek hev tîn gotîn.

Xani dı beşê 14'an ê "**Mem û Zin**"ê da qal kırıye ku dı şênayiya cejna Newrozê da Memê û Tacdin lı Zinê û Sıtiyê rast hatine û bı evina wan bêhış ketine. Her du xuşk çüne ser wan, ew ji bı evina wan derdedar bûne û gustilên xwe bı yên wan guhartine. Xani lı ser wê rewşa wan weha gotiye:

"Sersal û xweşi ji dest bı der dan  
Eyşê xwe bedel kırın bı derdan".

"Eyşê xwe bedel kırın" yani jiyana xwe guhartın. Wek ku diyar e, dı van her du malıkan da ji tipên "bı der dan" û "bı derdan" bı qasê hev û wek hev ın, lê du maneyên cuda dıdın, bı vi awayi ji hevtipiyê pêktinin.

Xani dı beşê 30'yi yê "**Mem û Zin**"ê da daye zanin ku Zinê deng lı findê kırıye û jê ra weha gotiye:

"Şewqek te lı ser seri diyar e  
sewdayeke serseri dibare".

Dı van her du malıkan da ji tipên "ser seri" û "serseri" bı qasê hev û wek hev ın, lê bı du awayên cuda hatine karanin û du maneyên cuda dıdın, bı vi awayi ji hevtipiyê pêktinin.

Melayê Cıziri dı helbesteka xwe da qal kırıye ku wi ji yara xwe ra nameyek şandiye û weha gotiye:

"Dilber mecala name di  
nasi, ku nişana me di".

Wek ku dixuye, dı van her du malıkan da ji tipên "name di" û "na me di" wek hev ın û bı qasê hev ın, lê bı du awayên cure hatine karanin û du maneyên cure dıdın, bı vi awayi ji hevtipiyê pêktinin.

\*





"Bêkû" jibo pitkırın û xurtkırına mana "bêkes"ê hatiye karandin. Yani peyvika "kû"yê bı serê xwe maneyek nade; çı dı forma erin (pozitif) û çı dı forma neyin (negatif) da be, tenê mana peyvika "kes"ê pit dıke, xurt û zexm dıke.<sup>(24)</sup> Lı vır dı malıka pêşın a beşê 2'yan da "xwesti"ya pêşın bı mana "dezgırti"yê ye, ya 2'yan ji kırdara mêjedemê ya "xwestın"ê ye û dı eslê xwe da "xwestiye" ye, lê hatiye kurtkırın û bı awayê "xwesti" hatiye karandin; yani "te bı ser mın ra dezgırti xwestiye". Wek ku diyar e, tipên her du peyvıkan wek hev in û bı qasê hev in, lê maneyên wan cuda ne; bı vi awayi, her du peyvık hunera hevtipiyê pêktının. Dı gotına "xwesti"ya pêşın da heceya paşın "ti", dı gotına "xwesti"ya paşın da ji heceya pêşın "xwes" tê pitkırın.

\*

Lı vır mın dıvê ez bala xuşk û bırayên hêja bıkişınım ser dijwariya nıfıra ku dı vê stranê da ci gırtiye. Wek ku diyar e, keçikê dı beşê pêşın ê stranê da nıfır kıriye ku koremarek ser dılê kurık gez bıke. Lê tê zanin ku qıma xwe bı wê nıfırê naniye û fıkrıye ku kurık belki bı wi awayi bı hêsani bımıre here. Vêca berê nıfıra xwe ya beşê 2'yan daye kurık û daxwaz kıriye ku ew nexweş bıkeve, bıhele û bızele, bıbe komek hesti; kes û kûyên wi ji gışt bımırın û çü kesek jı wan sax nemine, kurık ji neçari here têkeve ber destê wê, da ku ew êş û azarên wısa nebûyi bıne serê wi ku jiyana wi jı mırına wi xırabtır be. Bê guman nıfır xırab in; lê dema mırov jı aliyê folklori û huneri ve lı vê nıfırê dınêre, mırov dıbıne ku hunera mubalexeyê tê da bı awayeki pırr bılınd ci gırtiye.

Bı vı munasebetê em bêjın ku, dı hın stranên me yên geli yên dı da jı mırov carna rastê nıfırên weha dijwar û gıran tê. Mese-la, xortek bûye evındarê keçek, ku jê ra gotiye "Zeriyê". Ew peyvık bûye navê stranê ji. Belki navê keçikê bı rasti ji "Zeri" bûye. Lê belê dılê keçikê jı wi xorti ra tunebûye û bı wi awayi evına wi yekali maye. Demek paşê xwazginên keçikê jı gunde-ki di hatine. Hingê kurık pırr xemgin bûye û bı wê xemginiyê ew stran gotiye û dı ciyek da weha deng lı Zeriyê kıriye:

"De lê lê, sîbe bû, mî bala xwe dayê Zeriye berê xwe da  
ser kaniye  
Malxirabê si û sê biskên dî şê şê kirîne,  
qora zêran girêdaye lî eniye  
Zeri xeydan e, bî mî ra xeber nade; mî go:  
Lê lê Zeriye, mî bihistiye hatîne xwazginên te şeniye .  
Xwezi mî tu sıwar kirayi lî hespê, berê te bîda xeribiye  
Bîla kesek nehata mala bavê te jîbo xwazginiye".

Paşê weha nîfir lî Zeriye kirîye:

"Lê lê Zeriye, eger bavê te te bîde,  
ez jî Rebê aleinê hêvi dîkîm ku xeberek bî ser gundê me da  
bê, bêje: Mêrê Zeriye mîriye bî tayê, bî bayê, bî bawitiye  
Zeriye reş girêdaye, qora zêran vekirîye jî eniye  
kor-poşman vegeirîye ser mala bavê,  
bavê bî destê wê girîtiye, dî kavilê gund da daye ser hewiyê".

Wek ku diyar e, wî xortî dî nîfira xwe da qîma xwe bî mîrîna  
mêrê Zeriye yê pêşedemê naniye; daxwaz kirîye ku bavê Zeriye  
wê bîde ser hewiyê jî, da ku tîm û tîm derdê hewiyê bîkîşîne.  
Wek ku tê zanin, jîbo jînek jî derdê hewiyê girantîr û zortîr  
tîşteke tune.

Dî hîm stranan da jî evindarên ku evîna wan yekalî maye,  
xwe mezlûm nişan dane û bî wî awayî xwestîne dilê evandiyên  
xwe bî xwe bîdîn şewîrandîn. Dî straneka weha da xortê evin-  
dar ê ku evîna wî yekalî maye, weha deng lî keçîka evandî kirî-  
ye:

"Keçê dinê, ez'ê bîmîrîm, lê tu sebeb î  
Xwedê zane ez'ê wesyet bîkîm bîla gora mî l'ber  
derê hewşa mala bavê te bî

Her cara ku tu j'malê derkevi û bêyi malê, dî riya Xwedê da  
were l'ser gora mî bisekine-w  
bêje wey lawîko, hezar rehme l'gora te bî".

\*

Em dîsa vegeerî babetê xwe, hunera "hevtipi"yê.

Keçek û xortek bûne evindarên hev û xwestine ku bî hev ra  
bîzewicîn û bigijîn mîradê xwe. Lê çawa? Keçîkê havîleka<sup>(25)</sup>  
weha ditiye û deng lî evindarê xwe kîriye, jê ra weha gotiye:

"Lawîko qurban, rojek rabe were mala bavê mî  
rebena Xwedê lo bî mêvani  
Ez'ê şîva lawîkê xwe çêkîm bî şîr û şekîr, lo bî şîrani  
Hêvi Xwedê, belkî rehîm têkeve dîlê diya mî û bavê mî  
rebenê, bî hev ra şêwir bîkîn, bêjîn ka em bî destê  
keçîka xwe bigîrîn bîdîn lo vî mêvani".

Wek ku eşkera dîxuye, lî vîr tîpên "mêvani"ya dî dûwayîya  
malîka pêşîn da û ya dî dûwayîya malîka paşîn da wek hev in û  
bî qasê hev in, bî vî awayî hunera hevtîpiyê pêktînin. Dî gotîna  
"mêvani"ya pêşîn da heceya paşîn "nî", dî gotîna "mêvani"ya  
paşîn da jî heceya navîn "va" tê pitkîrîn.

\*

Hunera hevtîpiyê dî hîn çîvanokên<sup>(26)</sup> Kurdi da jî tê ditîn. Navê  
yekê jî wan çîvanokan "**Xalê Bekîr**" e. Ew çîvanok weha ye:

"Xalê Bekîr çavê xwe vekîr  
Eynîk dani, lî xwe mêze kîr  
Serê xwe şûşt, riyê xwe şe kîr  
Xurîniya xwe kîr bî şîr û şekîr  
Şal û şapîk lî bejna xwe kîr  
Ne guh da mî, ne bî peyva te kîr  
Rabû bî rê ket, çû Diyarbekîr  
Ax bêaqîl Xalê Bekîr".

Wek ku diyar e, lı vır tipên peyvîkên "şe kır" û "şekır", her weha "bekır" a "Diyarbekır"ê û ya "Xalê Bekır" hevtipiyê pêktinın. Gerçı dı nıvısınê da "b" ya "bekır" a Diyarbekır"ê hûr, "B" ya "Xalê Bekır" ji gir tê nıvısın, lê dı gotınê da wek hev tên gotın.

\*

Tışteki pırr balkêş e ku dı hın peyvên pêşıyan ên Kurdi da ji mırov rastê hunera hevtipiyê tê. Mesela, dı peyveka pêşıyan a Kurdi da weha tê gotın: "Bıla kur be, bıla kur be".

Dı vê peyvê da "kur" û "kur" hevtipiyê pêktinın. Mana "kur" a pêşın "law" e, mana "kur" a 2'yan ji weha ye: "Kesê ku bı kesan ra nıkare hevalı û hogırı bıke, ji kesan bêhteng dıbe, jıbo peyvçûnê lı behane û destıkan dıgere". Tıpa "r" yê dı her du peyvikan da ji qelew tê gotın.

Dı peyveka pêşıyan a di da ji weha tê gotın: "Qenc lı mıın nagerın, xırab jı mıın nagerın".

Dı vê peyvê da "nagerın" û "nagerın", bı alıkarıya pêşbendıkên<sup>(27)</sup> "ı" yê û "jı" yê du maneyên cuda dıdın û hevtipiyê pêktinın.

Dı peyveka pêşıyan a di da ji weha tê gotın: "Her çêlek tê dotın, her gotın nayê gotın".

Dı vê peyvê da "gotın" û "gotın" du mane dıdın û hevtipiyê pêktinın. Mana "gotın" a pêşın "peyv" e, yani tıştê ku jı devê mırov derdıkeve. "Gotın" a paşın ji kırdar e, mana wê weha ye: "Derxıstına mırov peyvıkek yan peyvek jı devê xwe; ku mırov peyvıkek yan peyvek jı devê xwe derxe".

\*

Em vêca ji minakna jı "hevtıpiya nivçe" nişan bıdın. Hevtıpiya nivçe ew e ku dı hın peyvikan da hın tipên wek hev û bı qasê hev bân karanın, tenê du tip jı wan jı hev cuda bıın. Mesela, Evdırehım Rehmi dı pırtûka xwe ya bı navê "**Gaziya Welat**" da, dı heqê Şeref Xan û "**Şerefname**" yê da weha gotıye:

"Şeref Xan Beg nıvısı bo me tarix, nav **Şerefname**

Bı fedl û ılm û zaninê heta iro şeref da me".

"Fedl" yani serbılındi, rûmet. Wek ku diyar e, dı van her du malıkan da "Şerefname" û "şeref da me" hevtepiya nivçe pêktinın. Lewra jı bıl tipên "n"yê û "d"yê, tipên wan hemi wek hev ın û maneyên wan cuda ne.

Hozan Selimi dı pirtûka xwe ya bı navê "**Yûsuf û Zuleyxa**"yê da daye zanin ku lı ser xemginiya Yaqûb Pêxember bı windabûna kurê xwe Yûsuf, firîşteyê mırınê Ezrail çûye xewna wi û pê daye zanin ku wi giyanê Yûsuf nestandiye û ew sax e. Hingê Yaqûb jı Ezrail ra weha gotiye:

"Lakin bı meqamê wi nızanım

Teqrir-ı bıke ku ez bızanım".

"Meqamê wi" yani ciyê hêwirina wi, ciyê ku lê dıji. "Teqrir bıke" yani qal bıke, bıde zanin. Dı van her du malıkan da "nızanım" û "bızanım" hevtepiya nivçe pêktinın. Lewra jı bıl tipên "n"yê û "b"yê, tipên wan hemi wek hev ın û maneyên wan cuda ne.

Dı straneka geli da, ku dema derxıstına bûkan jı malên bavın tê gotin û navê wê "**Heval, megri**" ye, weha tê gotin:

"Em hatıne te bıbinın

Em hatıne te bıbinın

te j'mala bavê bıstının

te j'mala bavê bıstının

te b'mala zavê bıg'hının

te b'mala zavê bıg'hının".

Wek ku diyar e, dı her du malıkên navin da "bavê" û dı her du malıkên paşin da "zavê" hevtipiya nivçe pêktinın. Lewra jı bıl tipên "b"yê û "z"yê, tipên wan hemi wek hev in û maneyên wan cuda ne.

Me lı jor peyva pêşiyar a Kurdi "Her çêlek tê dotın, her gotın nayê gotın" nıvisibû. Dı wê peyva pêşiyar da ji "dotın" û "gotın" a paşin hevtipiya nivçe pêktinın. Lewra jı bıl tipên "d"yê û "g"yê, tipên wan hemi wek hev in û maneyên wan cuda ne.

\*

Em dı dûwayiyê da numûneyek ji jı "hevtipiya vaji" nişan bırdın. Hevtipiya vaji ew hevtipi ye ku, dı du peyvikan da tipên wek hev û bı qasê hev bên karanin, lê ciyên du tipên wan peyvikan bên guhartın. Mesela, derwêşên Kurdistanê dı wextê xwe da qesideyek lı ser Hezreti Eli dıgotın. Dı ciyeki wê qesidê da weha tê gotın:

"Eli mêrxasê din e  
Şûr jı kalan dık'şine  
Pê kafıran dış'kine  
Serê hemıyan dıf'rine".

Wek ku dıxuye, lı vır dı malıka 2'yan û 3'yan da peyvıkên "dık'şine" û "dış'kine" hevtipiya vaji pêktinın. Lewra tipên wan bı qasê hev in û wek hev in, tenê tipên "k"yê û "ş"yê, dı her du malıkan da ciyên xwe bı hev guhartıne, bı wı awayi jı hev ra vaji bûne û du maneyên cuda dıdın.

## LİSTA JÊRENOTAN

(1) Ev peyva pêşyan lı hın hêlên Kurdistanê ji weha tê gotin: "Ji mehan ji salan, şevêk mêvanê xalan".

(2) **Peyvîk:** Dengê ku ji devê mirov derdikeve û tenê yek maneyek dide; wek "ba", "baran", "dîçe", "dixwîne", "hat", "hatîn", "jin", "pirtûk", "xwarîn" û wd. Bî Erebi "kelime", bî Tırki "sözcük", bî İnglizi ji "word".

(3) **Geli:** Tîşt yan karê ku têkiliya wi bî gel heye; tîşt yan karê ku aidê gel e, malê gel e, xwediyê wi gel e. Wek "çirokên geli", "pêkenokên geli", "stranên geli" wd.

(4) **Salıxdan:** Qalkırin û nasandina kesek yan tiştêk yan cîyek yan ji rewşek bî awayekî zelal û vekirî û têkûz. Bî Erebi "teswir", bî Tırki "betimleme", bî İnglizi ji "description".

(5) Ev, peyvîkeka İrani ye. Koka wê dîgije zımanê Pehlewî. Dî zımanî da ji peyvîk "şam" bûye; dî Kurdî û Farisî da ji wîsa maye. Jî bîl Melayê Bateyî, hın hozanên me yê di ji dî edebiyata klasîk da carna ci dane vê peyvîkê. Mesela, Şêx Evdîrehmanê Axtepeyî, dî cîyekî "**Rewdunneim**"ê da dî heqê Pêxember da weha gotiye:

"Emîr hem dîkır bo şhabê kiram:

Siyabê sîpi wergîrîn subh û şam".

"Şhabê kiram" yanî şhabiyên qedîrbîlînd. "Siyabê sîpi" yanî cîlên sîpi.

Ehmedê Xanî jî dî beşê 48'an ê "**Mem û Zîn**"ê da jî devê Bekîr ev peyvîk weha bî kar anîye:

"Yanî şev û roj û subh û şam in

Hın rohnî ne, hın jî wan zelam in".

"Zelam" yanî tari.

Siyahpoş jî dî "**Seyfulmulûk**"ê da weha ci daye vê peyvîkê:

"Dî seydê da dibûrand roj-ı ta şam

Welê şeb ta seher mest ez lebê cam".

"Ez lebê cam" yanî jî lêvên qedehê. Mexsed qedeha meyê ye.

(6) **Doj:** Canem; cehennem. Ehmedê Xanî, dî "**Eqida İmanê**" da weha ci daye vê peyvîkê:

"Mîrovê bîman dî dojê mîqîm

bîzane ku namînîtin, ey hekim".



Melayê Cıziri ji dî helbesteka xwe da deng lî yara xwe kiriye û ev peyvîk weha bî kar aniye:

"Enimahê, şefeqrojê  
te sohtim şubhetê dojê".

"Enimah" yani enihiv, ya ku eniya wê dîşibe hivê. "Te sohtim şubhetê dojê" yani te ez şewitandim wek canemê.

(7) **Pîsmir**: Pîsê mirek; kurê mirek; prens. Siyahpoş ev peyvîk weha bî kar aniye:

"Jî pîsmiran standin rext û cewşen  
Jî şem'ê rûyê wan bû qesr-î rewşen".

"Cewşen" dî demên berê da tewîrek zîrx bûye. "Şem'ê rûyê wan" yani rûyê wan ê wek şîna.

Dişa Siyahpoş weha ci daye vê peyvîkê:

"Çeleng rabû kurê Salih inuşewweş  
Nihêrî çend, nedî pîsmirê mehweş".

"Muşewweş" yani têkîlhev. "Mehweş" yani wek hivê.

(8) **Dotmir**: Dota mirek, keça mirek; prenses.

(9) **Tewr**: Ew qas ku, ew qeder ku, hetta. Ev peyvîk dema dî serê kirdarek (fi'î) da bê gotin, wê kirdarê dî mane û rewşa wê da dîgihine pêploka dûwayin, dîgihine dereca paşin. Mesela, ku kesek bêje "Memo ew qas jî Çeko xeydiye ku, tewr naxwaze rûyê wî jî bibine", mana vê peyvê ev e ku nevîna Memo gihaye pêploka dûwayin, gihaye dereca paşin, gihaye nuqtayeka wisa ku ew naxwaze rûyê Çeko jî bibine. Wek ku dixuye, kirdar lî vir gihaye sinorê paşin. Peyvîka "tewr"ê carna jî dî serê salixnavan (sifet) da ci digire. Dema bê serê salixnavek, wî salixnavî dî celeba wî da dîke yê dereca jortirin. Mesela, ku mirov bêje "Meha tewr xweş Gulan e", mana vê peyvê ev e ku xweşbûna Gulanê dî dereca jortirin da ye, meha xweştirin Gulan e. Peyvîk carna jî tê serê navan. Dema bê serê navek, wî navî dî celeba wî da dîgihine pêploka jortirin. Mesela, ku mirov bêje "Heval hemî hatin, tewr Bîlînd jî bî wê nexweşiya xwe hat", mana vê peyvê ev e ku dîgel ku Bîlînd nexweş bû û hatina wî nedihat payin, ew jihat.

(10) **Qerecdax**: Çiyayekî nêzê bajarê Amedê ye. Navê wî ye eslî ye Kurdî "Qeracdar" e, Tirkî ew nav kiriye "Qerecdax".

(11) **Çêrmûk**: Qezayeka Amedê ye. Ev nav, jî ber germaveka lî wir, dî eslê xwe da "Germok" e. Paşê dî peyvîne da guheriye bûye "Çêrmûk".

(12) Gerçi "mam" naveki nêrin e, lê lı vır tipa "ê"yê hatiye paşıya wê û bûye "Mamê". Dı zımanê Kurdi da hın peyvîkên yekhece yên nêrin hene ku, dı rewşa nasandın û kışkırînê da "ê" tê paşıya wan. Mesela "bav" dibe "bav"ê, "hesp" dibe "hespê", "xal" dibe "xalê", "Mem" dibe "Memê", "Zal" dibe "Zalê" û wd. Mesela, dı peyveka pêşyan da weha tê gotın: "Bûk lı ser pışta hespê ye, kes nızane qısmetê kê ye". Peyveka pêşyan ji weha ye: "Bûka xalê, stûna nava malê". Yani keça ku bibe bûka xalê xwe, qedrê wê bılınd e. Wek ku tê zanin, navê bavê mêrxasê navdar Rıstem, "Zal" bûye; lê dı nava Kurdan da ji Rıstem ra tê gotın "Rıstemê Zalê"; yani "ê" tê paşıya wi navê nêrin. Navê lehengeki dastana "**Mem û Zin**"ê ji "Mem" bûye; lê "ê" tê paşıya navê wi û jê ra tê gotın "Memê". Ehmedê Xani dı beşê 51'ê yê "**Mem û Zin**"ê da weha gotiye:

"Mir go: Tu here Memê bıbine

Ger dê mırıbtı, ewi vejine".

(13) **Pışt pan kırıye**: Ev peyv dı zımanê Kurdi da idyomek e û nişana reva pırr zêde ya bı lez û bez e. Dema mırov bıbine ku kesek bı wi awayi direve, mırov dı heqê wi da dibêje "Pışt pan kır û reviya" yani çûra-çûr reviya, reviya û çû hey çû, pırr bı lez û bez reviya, reviya û qet lı pey xwe ji nenêri.

(14) **Kolos**: Dı demên berê da dı nava Kurdan da serpoşeka mêran bûye; mêrên Kurd ew serpoş dane serên xwe. Dı straneka di da, ku navê wê "**Bavê Şukri**" ye, vê peyvîkê weha ci girtıye:

"Delal qurban, mı go çem û çemê lo Bışêriyê

Delal qurban, mı di vê sibekê kelekê xwe berdabû lo pey gemiyê

Xwezi mı bîdita kolosê bavê Şukri bıhata mêvaniya lo vê kofiyê".

(15) **Berin**: Kes yan tıştê dema beri nuha; kes yan tıştê ku aidê dema berê ye; dı dema berê da hatiye û derbas bûye. Melayê Bateyi dı "**Mewlûd**"ê da dı heqê diya Pêxember Aminê da ev peyvîk weha bı kar anıye:

"Mislê wê nabın şepal û nazenin

ne dı dınya, ne dı Firdewsı berin".

"Mislê wê" yani wek wê, mina wê. "Firdwes" navê beşeki bıhiştê ye.

Şêx Nûredînê Bırivkani ji dı helbesteka xwe da weha ci daye vê peyvîkê:

"Dınya û erşê mermerin

mılyaket û mlkê berin".

(16) **Sırışt**: Tebiet, xwi, qereker. Şêx Evdîrehmanê Axtepeyi dî "**Rewdunneim**"ê da weha ci daye vê peyvîkê:

"Jî erşê Xuda nine mestîr tu tîşt

Ecaib mezîm erşê zibasırîşt".

"Zibasırîşt" yanî xweşiktebiet, tîştê ku bî tebietê xwe xweşik e.

Melayê Cızîrî jî dî helbesteka xwe da weha ci daye vê peyvîkê:

"Nezerek wê beşerê, lebşekerê, horisırîştê

nadîrîm ez bî mey û kewser û horên dî bîhîştê".

"Lebşekerê" yanî lêvşekîrê. "Horisırîştê" yanî horitebietê, ya ku tebietê wê wek tebietê horiyan e.

Melê dî helbesteka xwe ya dî da jî ev peyvîk weha bî kar anîye:

"Bête eywanê jî xelwê, horiya qudsisırîşt

sed hezaran horê qudsî tên liqayê rast û çep".

"Qudsisırîşt" yanî qudsitebiet, ya ku tebietê wê qudsî ye. "Tên liqayê" yanî tên pêşberê wê, tên pêşîya wê.

Ehmedê Xanî jî dî beşê 56'an ê "**Mem û Zîn**"ê da weha ci daye vê peyvîkê:

"Xelqê ku bî esl-î bedsırîşt in

ew esl-î jî wan qe têtê şuştin!"

"Bedsırîşt" yanî tebietxîrab.

Siyahpoş jî dî "**Seyfulmulûk**"ê da peyvîk weha bî kar anîye:

"Serxoş û xumar im jî meyê horisırîştan

Aq'î û dîl û fehmê me bîrîn kakul û qîştan".

"Horisırîştan" yanî horitebietan. "Qîşt" dî demên berin da xîşreki jînan bûye, ku ew bî serê xwe ve girêdane. Bî xweşbûna xwe hatiye naskîrîn.

Selîmî jî dî "**Yûsuf û Zuleyxa**"yê da weha ci daye vê peyvîkê:

"Wan go: Ne beşer, meleksırîşt e

Belkî ne perî, wekî fîrîşte".

"Meleksırîşt" yanî melektebiet, dî tebietê melekana da.

(17) **Sırıştî**: Tîştê tebiî; tîştê ku lî gora jtebiet e.

(18) **Tevok**: Tevayîya peyvîkên ku mirov wan lî gora awayê rêzîmanî lî pey hev rêz dîke û bî rîya wan dîtnek, fikrek, rayek dîde zanîn; tevayîya peyvîkên ku bî awayê rêzîmanî lî pey hev tên rêzkîrîn û dîtnek, fikrek, rayek dîdîn zanîn, radîgîhînin. Wek "Xuşk û bîra bî hev ra çûn dibîstanê" tevokê e, "Gelek heval hatîn semînerê" jî tevokê e û wd. Jî "tevok"ê ra bî Erebi "cumle", bî Tîrkî "tümce", bî İngîlîzî jî "sentence" tê gotîn. Çend tewîrên tevokê hene. Yek jî wan "te-

voka erin" e. Ew tevok, hebûna tîstek, rewşek yan qewîmina bûyerek û wd dîde zanin. Wek "Keçîk çû dîbîstanê". Yek ji "tevoka neyin" e. Ew tevok ji tunebûna tîstek, rewşek yan neqewîmina bûyerek û wd dîde zanin. Wek "Kurik neçû dîbîstanê". Yek ji "şaxtevak" e. Ew ji dî nava tevokêka sereke da ci dîgire û tevoka sereke jî wê û jî çendên wek wê pêktê. Wek "Eger wextê te hebe, were em jî xwe ra bîpeyvîvî". Ev peyv bî tevayî, tevokêka sereke ye; "eger wextê te hebe" şaxtevokek e, "were em jî xwe ra bîpeyvîvî" jî şaxtevokekê di ye; tevoka sereke jî wan her duyan pêkhatîye.

(19) Ev peyva pêşîyan lî hîn hêlên Kurdistanê jî weha tê gotin: "Kaniya ku mirov av jê vexwe, mirov kevîr navêj'ê". Dî stranê da peyva feqî, lî gora awayê pêşî hatîye gotin.

(20) **Kirdar:** 1- Karê ku mirov dîke; tevgera ku jî mirov peyda dîbe. Jî kirdara bî vê maneyê ra bî Erebi "fi'l", bî Tîrki "eylem", bî Înglîzî jî "action" tê gotin. Şêx Evdîrehmanê Axtepeyî dî "**Rewdunneim**"ê da ev peyvîk bî vê maneyê dî heqê Xwedê da weha bî kar aniye:

"Çîsan şubhe çêbit jî asarê wi!

Bîzan heqq e heq cumle kirdarê wi".

"Jî asarê wi" yanî jî eserên wi, jî eserên Xwedê.

Ehmedê Xanî jî dî helbesteka xwe da bî vê maneyê weha ci daye vê peyvîkê:

"Zahîdê xelwetnîşîn, pabendê kirdarê xwe ye

Tacîrê rihletguzîn, dînarê dînarê xwe ye".

Ev her du malîk bî Kurdiya xwerû weha ne:

"Sofîyê rûnîştîyê xelwetê, girêdayîyê karê xwe ye

Bazarvanê gerok, dîşewitîyê dîravê xwe ye".

Xanî dî beşê 55'an ê "**Mem û Zîn**"ê da jî peyvîk bî vê maneyê weha bî kar aniye:

"Zahîr jî wi ra selîs e guftar

Batîn bî wi ra xebîs e kirdar".

Ev her du malîk jî bî Kurdiya xwerû weha ne:

"Dî rû da gotarên wi rewan û têkûz in

Dî bîni da kirdarên wi xîrab û xûz in".

2- Wek termeka rêzîmanî, peyvîka ku kîrîna karek, tevgera, lîvek dîde zanîn, nişan dîde. Mesela, dema kesek bêje "Ez dîmeşîm", peyvîka "dîmeşîm"ê dîbe kirdar û karekî wi kesî, lîveka wi kesî nişan dîde. Eger bê gotin "Keçîkê pîrtûk xwend", hingê jî "xwend" dîbe kirdar û

kareki keçikê, tevgereka wê dîde zanin. Jî kirdara bî vê maneya rêzîmani ra bî Erebi "fi'l", bî Tırki "eylem", bî İnglizi ji "verb" tê gotin.

Lî vîr mexsed ji peyvika "kirdar"ê, mana 2'yan e.

Koka vê peyvîkê digije zîmanê Pehlewi. Dî wi zîmani da peyvîk "kertar" bûye. Dî Farîsi da bûye "kerdar", dî Kurdi da ji bûye "kirdar".

(21) Ev peyva pêşîyan lî hîn hêlên Kurdistanê ji weha tê gotin: "Sê ehmeq hene lî dînê; ê ku gulê dîde bî sosinê, ê ku niskan dîçine lî şûna kîzinê, zavayê ku diçe ser mala bavê jînê". Dî stranê da peyva keçikê, lî gora awayê pêşîn hatiye gotin.

(22) Bînerin: M. Emin Bozarlan, "Keçika Qırşîroş", r. 51-116; çîrokên geli IV; Weşanxana Deng; Stanbol, 1999. Belavkirina Ewropayê: KOMKAR-Almanya.

(23) **Pitkîrîn:** 1- Zexmkîrîna kesek, lawîrek yan tîşteq; ku mirov kesek, lawîrek yan tîşteq têrhêz û zexm bike, têxe rewşeka zexm û şîdiyayi.

2- Wek termeka rêzîmani, zexmkîrîna heceyek dî gotinê da; ku dî gotinê da tîpeka dengdar a heceyek piçek bê dirêjkîrîn û bî wi awayi, ew heceya ku ew tîp tê da ye piçek bê pitkîrîn. Wek heceya "lav"ê ya peyvika "sîlav"ê, heceya "lein"ê ya peyvika "qelem"ê û wd. Jî "pitkîrîn" a bî vê mana 2'yan ra bî Tırki "vurgu", bî İnglizi ji "accent" tê gotin.

(24) Dî zîmanê Kurdi da hîn peyvîkên weha hene ku, bî serê xwe mane nadîn, tenê maneyên peyvîkên beri xwe yan pey xwe pit dîkîn, xurt û zexm dîkîn. Wek "sîki"ya dî "sîki-sar"ê da, "vîki"yê dî "vîki-vala"yê da, "zîpi"ya dî "zîpi-zîwa"yê û "zîpi-zer"ê da û wd.

(25) **Havîl:** Awayê safîkirîna şolan û veristîna pîrsîgrêkan; çare. Mesela, kesek dibêje "Dîvê em jî vê şolê ra havîlek bîbinin" yani çareyek.

(26) **Çivanok:** Peyva helbeski ya ku paşîya hemî malîkên wê yan hîn malîkên wê wek hev e. Hîn peyvîkên hîn çivanokan mane dîdîn, hîn ji bêmane ne. Hîn çivanok dî serê çîrok û meselokên geli da tîn gotin; ku her sê malîkên serê wan ev in:

"Hebû tunebû carek jî caran

Rehme lî dê û bavên guhdaran

Xeyn jî cendîrme û tehsildaran".

Hın çivanok ji bî serê xwe tîn gotin; wek çivanoka sersalê; ku wextek lî gundên Kurdistanê dî şevên sersalan da zarûk dema lî malan dîgeriyan û diyariyên sersalê berhev dikirin, ew digotin. Ew çivanok weha ye:

"Serê salê, binê salê

Xwedê bihêle xortê malê

Doni-moni, malava

Xwedê xortê malê bike zava".

"Doni" yani diyariyên bîdon; mexsed diyariyên rûmetbîlînd in; "Moni" bî serê xwe maneyek nade, karê wê tenê pitkîrîna û xurtkîrîna peyvîka "doni"yê ye; wek ku mirov dibêje "rûn-mûn", "şekîr-mekîr" û wd.

(27) **Pêşbendîk:** Dî rêzîmanê da peyvîka ku tê pêşîya hîn peyvîkan û wan bî hîn peyvîkên di ve bend dîke, girêdîde yan jî maneyên hîn peyvîkên lî pey xwe diguhêre. Wek "jî"ya "jî bajêr" û "lî"ya "lî bajêr" û wd. Ev peyvîk, dijmana "paşbendîk"ê ye. Ehînedê Xani dî beşê 26'an ê "**Mem û Zîn**"ê da jî devê Bekîr dî heqê Sîtiyê da pêşbendîka "jî"yê dî du malîkan da weha bî kar aniye:

"Qeyser jî kurê xwe ra bixwesta

Xaqan-î jî pêş ve dest bîbesta".

## Bipêşveçûna dîrokî ya zimanê kurdî

û

### hin taybetmendiyên wî yên xweser

Dr. Zerdeşt Haco

#### Daketina nav mijarê

Berî ko ez dakevime nav naveroka vê mijarê, ez dixwazim destpêkê giringiya ziman weke nasnameya çanda gelan bi giştî û weke nasnameya gelê kurd bi taybetî bênime ber çavan.

Ez? dixwazim vê yekê bêjim, da ko mirov bipêşveçûna dîrokî ya zimanê kurdî, û hin taybetmendiyên wî yên xweser baştir têbigihe, gava em zimanê xwe û zimanine dî bidine ber hev.

Bêgoman em li ser wê yekê li hev dikin, ko ziman stûna çanda gelan e. Ziman ne tenê nişana çand û welêt e, ew ji bo naskirina nasnameya mirovekî ji cihê ko ew lê mezin bû ye jî, giringtir e.

Ji ber ziman bi dirêjbûna jiyana me ji me venaqete, heta gava em bê çare ji welatên xwe birevin jî, û li koçberiyê jî bijîn, ew bi me re dimêne û dest ji me naberde.

Di heman demê de ziman dîrok û pêşeroja gelan e.



Ew dîroka gelan e, ji ber tenê di riya zimên re em dikarin li raman û bîr baweriyên pêşiyên xwe binihêrin û dîtînin wan di berhemên wan de, yên ko bi ziman hatine nivîsîn, binirxênin.

Û ziman pêşeroja gelan e, ji ber tenê bi riya alavê ziman gel dikarin bernamayan ji jiyana xwe ya li pêş re deynin.

Êdî mirov dikare bêje, ko gel para mezin bi zimanên xwe têne nas kirin. Ev encama ko em gehîştinê, dikare bi taybetî ji gelê kurd re bê gotin. Ji ber îro ne dewleteke Kurdan serbixwe heye, ya ko Kurd pê bêne nas kirin û ne jî ew xurû ji yek dîne taybetî ne, ko ew bi wî bêne nas kirin.

Vêce ji ber ko ziman taybetmendiyêke wiha serbixwe ye ji nasnameya neteweya kurd re, ew di dîrokê û di dema niha de jî tim bûye armanç ji hêrîşên dagîrkerên welatê Kurdan re.

Belê pêşî ez dixwazim werime ser têgîna "Zimanê Kurdî" û bipirsim, ka gelo wateya vê têgîne çî ye?

Ev pirsê ha ji destpêkê ve xwe davêje meydanê, ji ber dewleteke Kurdan nîn e, heta ko mirov yekser bêje ev ziman yê vê dewletê ye.

Kurdîstan, weke ko em hemû dizanin ji aliyê 4 dewletan, Tirkiya, Iran, Iraq û Sûriya ve dagîr kiriye û di encama vê yekê de, ne dewleta Kurdan û ne zimanekî kurdî yekgirtî û bilind heye.

**Pirsê ko zimanekî kurdî serbixwe heye, û bi ser zaravên xwe yê tîvel de ji zimanên din bi sînor e, di vê navê de bû ye rastiyeke zanistî û êdî herkes vê yekê dizane.**

Li ser vê rastiya ha ji sedsala 19an û heya roja îro, heme bêje, hemû zanyarên zimên, yê ko li ser zimanê kurdî nivîsî ne, di yek baweriyê de ne.

Ji ber xizmayetiya teng di navbera zimanê kurdî û zimanê farisî de, berê baweriyek hebû, digot, ko zimanê kurdî zaravek ji zaravên Farisiya Nû ye. Di pişt re zanyarine ewropî navdar, weke Maurizio Garzoni, Albert Socin, Peter Lerch, Alexandre Jaba, Hugo Makas û Ferdinand Justi bi nivîsên xwe yê zanistî



derketin û dane xuya kirin, ko xizmayetiya di navbera zimanê kurdî û zimanê farisî de ne bihtir e, ji xizmayetiya di navbera zimanê farisî û zimanên din ên hindo-iranî de.

Peter Lerch di berhema xwe de, ya bi navê "*Forschungen über die Kurden und die iranischen Nordchaldäer*" 1857 li ser xizmayetiya di navbera zimanê kurdî û zimanê farisî de wiha nivîsiye:

*"Herdû qurmên zimanî (ango qurmê zimanê kurdî û qurmê zimanê farisî) ji hev gelekî dûr in, belê wan gelek çeng, mil û çiqulik hilgirtine, yên ko du malan ava dikin. Endamên van herdû malan xwe ji hev nêzik dikin û êdî ji hev têdigihin"*

Bi vê yekê Peter Lerch dixwest bide xuya kirin, ko di navbera hin zaravên zimanê kurdî, û bi taybetî devokên Kurmanciya Jêr û zimanê farisî de, bihtir ji hin devokên Kurmanciya Jor û Farisî de, xizmayetiyeke meztir heye.

Hin 'Zimanzanên' Tirkan, bi awayekî çewtezanistî hewlê din, ko serxwebûna zimanê kurdî nayînî bikin û zimanê kurdî weke zimanekî "*bêbingeh, zimanekî tevlihev, zimanekî ko bi gelek awan hati be cûtin, peyvên wî weke kêstekên ko ji her alî ve hati bine ba hev*" bidinine xuya kirin (çawa ko raperestê tirk Bedrî Noyan sala 1982an di gotareke xwe de li ser peyva "*Kurd û Kurdên Tirk*" nivîsiye.

Belê ev hewldanên han di cihana şarezayên zimanan de bê bawerî dimênin, ji ber ew bi rengekî hişkere dibine alavên propogenda derewan ya dewleta tirk li dijî hebûna zimanê kurdî û bi vê yekê li dijî hebûna gelê kurd.

Ka li hember vê em li baweriya zanyarekî elman î navdar, yê ko li zanîngeha Essenê xebat dikir, temaşe? bikin. Vî zimanzanê elman, Prof. Dr. Johannes Meyer-Ingwersen di vê biwarê de nivîsiye:

"Ev yek bi rastî dêmagogiyeye xurû ye, gava li Tirkiyayê tim tê gotin, ko bi xwe Kurd ew eşîrên Tirkan in (Tirkên çiyayî), yên ko bi demê re "Farisiyeke xirabûyî" wergirtine.

Ya pêşî, zimanê kurdî zimanekî serbixwe ye, û ya didiwan, Kurd û zimanê kurdî hê bi demeke gelekî dirêj berî Tirkan di wî cihî de ne. Dîrok bi zîzî bervajî vê dîtina Tirkan e: Di dema ko rojavayê Enedolê (bi rêjeyî dereng) hate tirkkirin de, zimanê xwecihê navçeya Kurdan hê berî hatina êlên Tirkan serbixwe bû.

Di derbarê rêzkirina zanistî ya **zimanê kurdî de divê mirov bêje, ko zimanê kurdî zimanek ji zimanên bakur-rojava yên koma îranî ya malbata hindo-ewropî ye.**

Û bi vê yekê ji zimanên hawîr xizmayetiya zimanê kurdî tenê bi zimanê farisî re heye.

Zimanê Tirkî û zimanê erebî, heryek ji wan ji malbateke dûr e di ye.

Dinavbera van hersê zimanan de tenê dan û standineke guhestina hin bêje û rewşên rêzimanî heye.

Li vir divê mirov bêje, ko giraniya ko zimanê erebî ji dema misilmankirinê ve li zimanê kurdî kiriye (çawa ko li gelek zimanên dî jî kiriye) ji giraniya ko hin zimanên din li Kurdî kiriye, meztir e.

**Nebûna zimanekî kurdî yekgirtî û bilind îro rastiyeke şîndarî (xembar e) ye, divê em wê bipejirênin.**

**Bi ser wê de gelek zaravên zimanê kurdî yên herêmî û jihevçida hene. Û bi ser vê de jî gelek devokên xwecihî yên her zaravekî hene.**

Ev rastiya rewşa îro encama dîroka gelê kurd ya dilbiêş e.

Mercên rêzanî (siyasî) di dîrokê de rê ne dan, da gelê kurd li ser xaka welatê xwe dewleta xwe ya neteweyî ava bike û piştgîriya bipêşveçûna zimanekî kurdî bilind û neteweyî bike.

**Zaravên zimanê kurdî kîjan in û li kîjan herêman têne axaftin?**

Zimanê kurdî parçeyek erd ji nêzikî 500 000 km<sup>2</sup> himbêz dike.

Sînorê başur ji bakurê Kendava Farisî dest pê dike, hildikişe bakur û di ber wilayeta îranî Ezirbêcanê re dipere, di beşekî biçûk ji komara Ermenistanê re derbas dibe, di Erzerûmê re diçe Sêwas û Mereşê li rojava, xwe digihîne Afrîn û Hîsiça li başur-rojava, diçe başur û di Şingal, Mûsil, Badrê û Şuster re diçe vedigere bakurê Kendava Farisî.

Li ser hijmara mirovên ko bi zimanê kurdî diaxivin tu serjimêrên zîz û fermî nîn in, lê tê gotin, ko hijmara axêverên kurd digihe 40 milyon kesî.

Zimanê kurdî yan jî Zimanê Kurmancî, çawa ko Kurd zimanê xwe bi nav dikin, li ser **du zaravên sereke** tê parve kirin. Di her zaravekî sereke de çend devokên xwecihî hene.

Zaravên sereke

**Kurmanciya Jor û**

**Kurmanciya Naverast in.**

Xeta Urmiya, Rawendûz, Hewlêr, Mûsil dikare weke sînor di navbera van herdu zaravên sereke de were temaşe kirin.

Bakurê vê xetê piraniya Kurdan (ji derveyî navçeyên Bingol û Dêrsimê) bi Kurmanciya Jor diaxivin, başur-rojhilatê vê xetê piraniya Kurdan bi Kurmanciya Naverast diaxivin.

**Kurmanciya Jor** bi xwe jî 3 beş in:

1. Kurmanciya herêmên Dihok, Hekarî, Cizîr û Şernexê, yê ko bi navên Badînanî, Bayezîdî û Botanî têne bi nav kirin.

Ji devoka van herêman re mirov dikare **Devoka Botanî** bêje.

2. Kurmanciya herêman Êrmiya, Şingal, Sêrt, Amed, Batman, Mêrdîn, Hîsiçe, Riha, Agrî, Efrîn, Erzerûm, Qers û Kurmanciya Kurdên Qefqasiyayê.

Mirov dikare van devokan bi navê **Devoka Şingalê** bi nav bike.

3. Kurmanciya herêmen Dîlok (îtanb), Semsûr (Adiyeman), Mereş, Sêwas, Erzingan û Kurmanciya Kurdên Xurasanê.

Ji van devokan re mirov dikare **Devokên Dîlok û Mereşê** bêje.

**Kurmanciya Naverast**, bi gelemperî devokên wê yên herêmî ev in:

Sineyî, Silêmanî, Erdalanî, Kerkûkî, Germiyani, Hewlêrî, Soranî, Mukrî, Şarbajêrî û Pijderî.

### **Zaravên tenişt yên zimanê Kurmancî**

Di zimanê Kurmancî de **du komên din** yên zaravan hene. Tenê ji bona cidabûna teknîkî ez têgîna “Zaravên Tenişt” ji wan re bi kar tînim, **ji ber** wekî dî ew jî li şûnewarên xwe sereke ne.

1. **Kurmanciya Jêr**, devokên wê yên herêmi bi gelemperî ev in: Feylî, Kirmanşanî, Lekî, kelhorî, Xaneqînî û Lorî.

2. **Kirmancî** (ya ko bi şaşî navê Zaza lê hatiye kirin) **-Goranî**

#### **a. Kirmancî,**

Ev zaravê zimanê kurdî heta niha bi awayekî şaş û nezanistî hatiye bi nav kirin.

Kurdên ko bi vî zaravî diaxivin, ji xwe re nabêjin Zaza. Gava ew basa zimanê xwe dikin, yan dibêjin ,zonê me’ ango zimanê me, û yan jî ,Kirmancî’ dibêjin.

Li gelek deveran Kurdên ko bi vî zaravî dipeyivin dengê ş(sh) dixine s û dengê j dixine z.

Ne gelekî dûrî baweriyê ye, ko Kurdên bi Kurmanciya Jor diaxivin, ji ber vê diyardeyê ji wan re -bi tinazî- ,Zaza’ dibêjin. Mîr Celadet Bedirxan jî di lêkolînên xwe de ghişti bû vê baweriyê.

Mirov ji vê rastiye bihtir nêzik dibe, gava mirov zani be, ko Kurdên Kirmanc ji Kurdên ko bi Kurmanciya Jor diaxivin re, ‚Here-Were‘ dibêjin.

Vêce heke bi rastî bêjeya ‚Here-Were‘ weke navê gelê kurd ji Kurdên Kurmanciya Jor re were pejrandin, hingê mirov dikare bêjeya ‚Zaza‘ jî ji Kurdên Kirmanc re bipejirêne.

Bi gotineke dî, heke bi rastî bêjeya ‚Here-Were‘ navekî dîrokî û zanistî yê beşekî ji gelê kurd be, hingê ‚Zaza‘ jî navekî dîrokî û zanistî yê beşekî dî ji gelê kurd e.

Her weke vê bêjeya ‚Dimilî/Dûmilî‘ jî ya ko hin vî zaravê kurdî pê bi nav dikin, ne zanistî û şaş e. Ji ber Dimilî navê êleke kurdî ye û ne navê zaravekî kurdî ye.

Li aliyekî din hin kes ji vî zaravê kurdî re ‚Kirdkî‘ dibêjin.

Ev peyva ‚Kirdkî‘ jî ne peyveke dîrokî ye. Hin zimanzanên kurd, yên ko xwestine xwe ji bêjeya ‚Zaza‘ rizgar bikin, peyva ‚Kirdkî‘ nû danîne.

Ji ber vê yekê wê ya rast ew be, gava em Kurd bi xwe di axaftin û nivîsên xwe de dest ji bêjeyên ‚Zaza‘, ‚Dimilî‘ û ‚Kirdkî‘ berdin û li şûna wan bêjeya ‚Kirmancî‘ ji vî zaravê kurdî re bidine xebatê. Ji ber çî gava em li ser ya xwe man û me ev têgîn di xebatê de hişt, hingê lêkolînerên derveyî jî wê vê têgînê bi kar bînin.

Vêce kengî me peyva ‚Kurmancî‘ bi kar anî, hingê em li ser hemû zaravên zimanê kurdî dibêjin, ango Kurmanciya Jor, Kurmanciya Naverast, Kurmanciya Jêr û Kirmancî-Goranî.

Û kengî me got, ‚Kirmancî‘ hingê em li ser zaravê ‚Kirmancî‘ dibêjin, yê ko heta niha bi çewtî Zaza, Dimilî û Kirdkî hatiye bi nav kirin.

Heta ko ev rastiya ha xwe di nav hemû Kurdan de bide pejrandin, divê beşek ji Kurdên başur (Îraq) jî, yên ko bêjeya ‚Kirmanc‘ bi giştî li şûna ‚Kurmanc‘ dibêjin, xwe ji vê baweriya me nêzik bikin.

Zaravê Kirmancî bi xwe jî li ser du koman beş dibe:

- Kirmanciya Rojava (Devoka Dêrsimê) û

- Kirmanciya Rojhilat (Devoka Bingolê)

Ev herdû devokên sereke yê zaravê Kirmancî ji nêzîkî 3 mîliyoy Kurd ve li van herêmên Kurdistanê têne axaftin:

Dêrsim, Bingol, Elezîz, Xerpût, Maden, Palo, hawîrê Amedê, Wartyo û li Siwêrekê.

Bi ser ko herêmên ko Kirmancî û Goranî li wan têne axaftin, dûrî hev in jî, xizmayetiyek di nav herdû zaravan de heye.

Ev jî mirov dikare bi wê yekê şirove bike, ko berê axêverên herdû zaravan li yek herêmê dijîn, û bi sedema hin bûyerên dîrokî, êline kurdî ji wan, yan bi dilê xwe, yan jî bi zorê cihê xwe berdane û li herêmine din niştece bûne.

Derbarê rewşa wêjeya nivîskî ya zaravê Kirmancî mirov bipêşveçûneke li ber çav dibîne.

Nivîskarên kirmanc berê berhemên xwe bi Kurmanciya Jor dinivîsandin, belê îro ew li zaravê xwe xwedî derdikevin, pê dinivîsin û wî bi pêş ve dibin.

Ev jî cihê şehnazîyeke mezin e, ji ber bi vê yekê ew vî zaravê kurdî yê xweş, yê ko li ber çûnê ye, rizgar dikin û xezîna zîmanê neteweya kurd pê dewlemend dikin.

## **b. Goranî:**

Devokên zaravê ‚Goranî‘ li navçeyên Hewraman, Zengene û Kerkûkê têne axaftin. Kurdên kakeyî jî bi devoka goranî diaxivin.

Devoka ‚Goranî‘ berê weke zaravê wêjeyî dihate bi kar anîn.

Ew bû bû zîmanê bilind û nivîskî yê Mîrevaniya Erdelanê û demekê bû bû zîmanê bilind yê Mîrevaniya Baban jî. Hin hel-

bestvanên navdar ên Kurdan weke Xaneyî, Qubadî û Mewlewî berhemên xwe bi vî zaravî nivîsandine.

## I. Bipêşveçûna dîrokî ya zimanê kurdî

### a) Binyata zimanê kurdî

Herwekî min li pêş jî da xuya kirin, zimanê kurdî bê dewlet e, ango tu hêzên siyasî nîn in, ko li zimanê kurdî xwedî derkevin.

Ji aliyekî dî ve ne ji berjewendiyên mîriyên dewletên dagîrker e, ko bihêlin lêkolînên zanistî li ser zimanê kurdî werine kirin.

Bêhtir ji vê, ew di riya hevpeymanên xwe yên siyasî û çandî re giraniyê li dewletên derveyî jî dikin, da ew guhê xwe nedine çanda gelê kurd û bi vê bihêlin, ko ew were ji bîr û winda kirin.

Heta ji dest mîriyên dewletên dagîrker tê, ew nahêlin beşên Kurdologî li xwendegê û zanîngehên welatên derve jî werine vekirin.

Çi gava mîriya dewletekê bixwaze, beşekî Kurdologî li zanîngeheke xwe veke, dewletên dagîrker, dengê xwe radikin û dibêjin, hûn xwe tev kar û barên hindirwê dewleta me dikin, hûn piştgîriya parçebûna welatê me, ango ‚Seperatismus‘ dikin û ev yek li gor zagonên navneteweyî qedexeyê.

Ji ber vê yekê, ne li Kurdistanê, û ne li derveyî Kurdistanê xebateke zanistî ji dil li ser zimanê kurdî nîn e.

Ew zanyarên derveyî û bêhtir yên ewropî, gava bixwazin bi serê xwe li ser ziman û çanda gelê kurd xebatekê bikin, rastî gelek dijwariyan tên.

Ew di zanîngehê de dijwariyan ji aliyê sorokê beşê xwe ve û ji aliyê serokê zanîngehê bi xwe ve dibînin, ji ber serokê zanîngehê bi şalyarî, ango wezaretê perwerde û lêkolînê ve girêdayî ye, û ji xwe diyar e, wezaret, ango mîrî/hikûmet diravê zanî-

gehê dide û bi vê yekê ew biryara hebûna vî yan wî beşê zanyarî li gor berjewendiyên dewleta xwe dide.

Wekî dî ew zanyarên ewropî, yên ko dixwazin bi serê xwe li ser zimanê kurdî bixebitin di çapkirin, weşan û firotina berhemên xwe de rastî gelek çetnahiyan tên û ew di tevayîya civakê de mirovine yekane dimênin û nayêne pejrandin.

Li aliyekî din li vir yan li wir hin zanyarên ewropî derdikevin û ,li tembûra dewletên dagîrker didin', ango dixwazin bi navê zanyariyê li gorî dilê mîriya dewleta trik bêjin, ko zimanekî kurdî serbixwe nîn e, û weke ew dibêjin ,Zazakî' zimanekî serbixwe ye û ne zaravekî kurdî ye û bi vî awayî ji siyaseta dewletên dagîrker re dibine alîkar.

Mixabin ew mirovên kurd, yên ko xwendinên xwe yên ziman-zanyarî li zanîngehên welatên derveyî bi dawî anîne, ne di wê rewşê de ne, ko weke tê xwestin, rojê ji 6 – 8 seetan lêkolinên xwe bikin.

Zanyarekî xwedî kar li zanîngehê karê xwe bi xebata xwe ya zanistî dibe serî, û êvarî vedigere malê xwe, xwe vedihesîne, da roja dî dîse dikari be behemên li ber çav bide.

Zanyarê kurd divê here, rojê 6 – 8 seetan li derve, ne di beşê xwendina xwe de kar bike, da mercên jiyana xwe pêkbêne û gava vedigere mal, dixwaze bi wê hêza xwe ya mayî berhemeke zanistî bide.

Ji ber vê rewşa ha em dibînîn, ko zanîna me ya îro li ser zimanê kurdî gelekî kême e, û gava em dixwazin li ser dîroka zimanê kurdî binivîsin, berî hertiştî em pala xwe berdidin ser encama xebata zanyarên sedesala 19an, ko yek ji wan Ferdinand Justî ye, yê di wê baweriyê de bû, ko hin nîşan hene, dihêlin, em bawer bikin, ko zimanê kurdî zimanekî kevin e, û heye, ko ew ji zimanê mêdî hati be.

Justî di pirtûka xwe de, ya ko sala 1880yî li St. Petersburgê di bin sernavê “Kurdische Grammatik” da weşandin, nivîsiye:



"Ne dûr e, ko di wan peyvan de kevnariyeke zimandarî mêdî, ya ko wekî dî winda bû ye, xwe parasti be."

Herwekî vê rojhilatnasê navdar Vladimir Minorskî di xebatên xwe yên zanistî de giha bû wê encamê, ko girêdaneke zimanê kurdî bi Mêdiyan re heye.

Wî li gorî baweriya xwe nivîsiye, ko zaravên kurdî di nav xwe de yekîtiyeke wisa peyde dikin, ya dihêle mirov bigihe wê baweriyê, ko ew zarav bi tevayîya xwe zimanekî taybetmend û serbixwe, yê ko gelekî (miletêkî) mezin û giring weke Mêdiyan pê diaxivî, ava dikin.

Belê li gorî asta zanyarî ya îro, ya ko dibêje tenê 12 peyvên mêdî li ber destê me hene, û ew jî navê gund û deveran in, mirov nikare bigihe encameke zanistî ye bawerdar.

### **c. Destpêka wêje û zimanê kurdî yê nivîskî û bipêşveçûna wan heya roja îro**

Ji şirovekirina, ko min heya niha kir, mirov nêzîkî wê baweriyê dibê, ko di nava wêje û zimanê kurdî yê nivîskî de heya niha tenê **herdû zaravên sereke** têne bi kar anîn.

Her yek ji herdû zaravan xwedî dîrokeke dirêj û têvel e.

Bi ser ko zimanê kurdî ne xwedî dewlet e, û hêzeke siyasî nîn e, ko guhê xwe bide zimanê kurdî, wî xwedî bike û bipêşve bibe, û bi ser ko zimanekî kurdî nivîskî yekgirtî û bilind nîn e, divê mirov bêje, ko **hijmareke mezin ji berhemên nivîskî yên bilind û bipêşveçûyî bi herdû zaravan kurdî yên sereke derketine.**

**Mirov dikare bi bawerî bêje, ko asta heryekî ji herdû zaravan ji zimanekî dewletî û fermî gelekî nêzik e.**

**Wêjeya kurdî ya nivîskî, ya ko îro li ber destê me ye, ji sedsala 11 an ve heye, û bi helbestên helbestvanê kurd Elî Herîrî dest pê dike.**

Rojhilatnasê rûsî Aleksender Jaba di pirtûka xwe, ya bi navê "Recuîl de notices et recits kurdes" de nivîsiye: "Helbestvanê Kurdan yê pêşî Elî Herîrî ye, ... ew di navbera sala 1009 û 1010an de ji dayîk bûye".

Wejeya kurdî ya sedsalên 15an, 16an, 17an û 18an bi navên helbestvanên kurd, yên weke Ehmed Melayê Batê, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Selîmê Silêman, Ehmedê Xanî, Xarisê Bedlîsî, Pertew Begê Hekarî, Şêx Xalid û Siyahpûş xemilandiye.

Wejeya nivîskî ya sedsala 19an bi herdû zaravên sereke bi giştî babetên welatperwerî û romantik ji xwe re kiriye mijar.

Piştî cenga cihanî ya pêşî bi giştî wêjeyê jiyana rastî ya rojane û ber bi siyast ve heya roja me ye îro xwe daye pêş.

Ew zimanzan, nivîskar, rojnamevan û siyasetmedarê kurd Mîr Celadet Bedirxan bû, yê ko kovara xwe HAWAR di 15. Tebaxa sala 1932an de derxist û rêzimana **Kurmanciya Jor** danî, ya ko em li gor wê heya roja îro dixwînin û dinvîsin.

Ji vê demê ve mirov dikare bêje, ko zimanekî nivîskî bilind û yekgirtî, ango standard ji bo zaravê **Kurmanciya Jor** hatiye efrandin. çend kêmayiyên rastnivîsê nikarin vê rastiye ji bilindiya wê bînine xwarê.

Bangewaziya min li mîriya başurê Kurdistanê ew e, ko ew li deverên ko Kurmanciya Jor tê axaftin, dest ji tîpên erebî berdin û di xwendegê û zanîngehan de êdî rêzimana Mîr Celadet Bedirxan bidine xwendin, da li seranserê deverên ko **Kurmanciya Jor** tê axaftin, bi yek zimanî were nivîsîn û xwendin.

Bi ser ko em dibînin, ko di **Kurmanciya Jor** de, li gorî devokan, bêjeyên têvel (newekhev) ji yek tiştî re hene, dîse jî axêverê vî zaravî dikare berhemên kurdî, li kû û ji kê ve, li Kurdistanê yan li Ewropayê hati bine nivîsîn, bixwêne û têbigihe.

---

<sup>1</sup> Tarîxa Edebyeta Kurdî, rûpel 57, Qenatê Kurdo

Hin ferhengên kurdî, yên ko di vê dema paşî hatine weşnandin, dikarin arîkariya yê xwendevan bikin, ko ew peyvîne di devoka wî de nebin, bibîne û têbigihe.

Herweke wê di zaravê **Kurmanciya Naverast** de jî zimanekî bilind û yekgirtî xwe daye pêş.

Bi bervajê Kurmanciya Jor, ev nêzikî nîvsedsalekî ye, ko **Kurmanciya Naverast** bi vî yan bi wî awayî di xwendegeh û zanîngehan de tê xwendin û xwedî kirin.

Piştî cenga cihanî ya pêşî û heya niha jî bi çoşeke mezin wêjeya kurdî bi vî zaravî tê efrandin, bi sedan pirtûk, kovar û rojname pê hatine nivîsîn û weşandin, bi awayekî ko mirov dikare bêje, bi rastî zimanekî dewletî yekgirtî û bilind, ango standard xwe daye efrandin.

Mixabin ji ber mercên siyasî ev zaravê ha heya roja îro bi tîpên erebî tê nivîsîn û di jwariyeke mezin dixê riya xwejihevnîzîkrîna herdû zaravên sereke yên zimanê me.

Di vê babetê de ez dixwazim bêjim, ko pîrsa nivîsîna bi tîpên erebî li ser yekîtiya neteweya me jî bivokeye (xetereke) mezin peyde dike.

Vece ji ber ne di warê zimanzanyarî de – tîpên erebî ji zimanên malbata samî re hatine efrandin- û ne di warê siyasî de ji berjewendiyên neteweya me ye, ko ev zarav bi tîpên erebî tê nivîsîn.

Ji ber vê yekê ji mîriya başurê Kurdistanê tê xwestin, ko ew biryareke dîrokî bigire û dest bi pêşvebirina nivîsînê bi tîpên latînî bike. Ew jî li gor bernameyeke zanistî û sal bi sal.

Wekî dî em tevgerê xurt di nav axêverên herdû zaravan de dibînin. Gelek Kurd îro bi çoşeke mezin li wêjeya kurdî ya devkî xwedî derdikevin, çîrokên têvel, helbest, stran, qewlên qewalan û her wekî dî didine hev û dinivîsin.

*c) Bipêşveçûna peyvên derveyî*  
*(Interferenz) di zimanê kurdî de*

Gava em giraniya ko zimanên derveyî li zimanê kurdî kiriye, bidine ber hev û li berhemên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî temaşe bikin, em di riya mezinbûna hijmara peyvên erebî û farisî re dibînîn, ko zimanê kurdî yê wê serdemê keti bû bin giraniyeke mezin ya zimanê erebî û farisî de.

Di daneberheveke wisa de mirov cawaziya di navbera berhemên kevin û nû de derbarê giraniya zimanên derveyî li ser zimanê kurdî, zû dibîne.

Belê sedemên wê yekê çi ne, ko zimanê kurdî careke dî dixwaze li bingih û rayên xwe vegere, bi ser ko ew bindest e, û zilim û zoriyeke mezin li ser heye?

Belkî ji xwe ev bindestî û ev zor bin, yên ko dihêlin, ko axêverên Kurmancî ji windabûna çanda xwe bitirsin û ji ber vê yekê "dîlpakiya ziman" ji xwe re dikine weke mertalekî parastinê.

Di bin bêja „dîlpakiya ziman“ de di zanyariya giştî ya zimanan de çê li wê yekê tê kirin, ya ko dibêje, dîlpakiya ziman ew rewşa bilind ya jixwepiştrastbûnê ye.

Dîlpakiya Ziman ew rewş e, ya ko ziman tê de yekgirtineke tevayî li hember zimanên din peydedike.

Êdî dîlpakiya ziman li ba mirovên xwe dibe xwedî bilindayiyeke taybetî, ew bilindayiya ko hêja ye li ser destan were ragirtin û parastin<sup>2</sup>.

**Daxwaza ko dibêje, divê zimanê kurmancî li rayên xwe vegere, serhildanekê dide xuyakirin.**

Ew serhildaneke ji bo xweparastinê û li dijî zora bindestkirinê, ya ko herçar dagîrkerên Kurdistanê li dijî zimanê kurmancî bikar tînin, û ew xweparastin e, ji bandora zimanên wan.

---

<sup>2</sup> Rûberîna nasîna gotina ‘Sprachloyalität’ li ba Uriel Weinrich, çavkaniya jor, r. 131 bike.

Rayên vê dilpakiyê, ne weke ko hin bawer dikin, di netew-  
perestiyêke çavkor de ye, nexêr ew di wê hestê de ye, ya ko ji  
xwezayê ve di dilê her mirovekî de heye.

Ew ew hest e, ya ko her mirovekî, çawa ew hê ji biçûkaniya  
xwe ve hîn bûye, bi zimanê dayika wî ve girê dide, û ji ber vê  
yekê daxwaza wî ya xweza ew e, ko ew zimanê dayika xwe  
biparêze.

Belê zimanê kurmancî stûneke neteweyî ye, wî barê çanda  
civaka gelê kurd hilgirtiye ser milên xwe. Ew zimanê hemû  
Kurdan e û alavê rêzanî (siyasî) ye, ji bo nasnameya gelê kurd  
were parastin û ji windabûnê were rizgarkirin.

### **Encam:**

I. Zimanê Kurdî û zaravên wî îro:

1. Zimanê Kurdî, zimanekî serbixwe ye, ew ji zimanên din  
yên cihane bi sînor e.

2. Îro 2 zaravên sereke di zimanê kurdî de hene,

a. Kurmanciya Jor (Kurmanciya Bakur)

b. Kurmanciya Naverast (Kurmanciya Navîn)

2. **Di warê nivîskî de**

Herdû zaravan, heryekî li gor xwe, xwe gihandiye asta zima-  
nekî nivîskî standad û bilind. Îro bi herdû zaravan hijmareke  
mezin ji berhemên nivîskî derdikevin.

3. **Di warê devkî de**

a. Di Kurmanciya Naverast de, ango di Soranî de zimanekî  
bilind yê devkî ji ji Radiyo û televiziyonê re peyde bûye.

c. Di Kurmanciya Jor de, ango di Kurmanciya Bakur de her-  
çendî zimanekî bilind ji radiyo û televiziyonê re, çawa ku tê  
xwestin peyde ne bûye jî, belê ev zarav jî li ser rîya standard-  
bûn û bilindbûnê ye.

4. Îro 2 zaravên zimanê kurdî yên tenîşt jî hene. Binavkirina wan weke zaravên tenîşt tenê ji bo cidabûna teknîkî ye. Herdû zarav jî bi giringiya xwe ji zaravên din ne kêmtir in:

a. Kurmanciya Jêr û

b. Kirmancî – Goranî

II. Pêşniyar ji bo avakirina zimanekî kurdî bilind û standard di pêvajoya îro de:

1. Divê hemû rêxistinên siyasî yên Kurdan di kongireyên xwe yên giştî de biryareke siyasî bigirin, ko Kurd hemû bi yek Alfebêtê binivîsin. Ew jî alfebêta latînî ye, ji ber sedemên zanistî.

2. Divê hemû rêxistinên siyasî yên Kurdan biryareke siyasî bigirin, ko rêzimanî, ango grammatik û rêzikên rastnivîsînê, yên ko Mîr Celadet Bedîrxan ji Kurmanciya Jor re pêşniyar kirine, ji bo vî zaravî bibe bingeh.

3. Divê li navçeyên rizgarkirî ji Kurdistanê û li derveyî welêt mamosteyên zimanê kurdî bi herdû zaravên sereke û herdû zaravên tenîşt werine perwerde kirin.

4. Divê li deverên Kurdistanê kîjan zarav, zaravê dayikê û xwecihî be, ew zarav bibe zaravê sereke yê xwendinê. Di ber zaravê sereke re şagirt û dê û bavên wan dikarin di pêngavên 1, 2 û 3 yên navendî de zaravêkî ji her sê zaravên mayî ji xwe re hilbijêrin.

5. Divê zanyarên zimanê kurdî bi mebesta ji hev nîzîkkirina zaravên kurdî û avakirina zimanekî kurdî yekgirtî lêkolînan li zaravên kurdî bikin, û di konferansên zanistî de encamên xebe- ta xwe pêşkêş bikin.

Li dawiya vê gotara xwe ez dixwazim, vê helbesta xwe, ya ko min li ser bajarê kurdî, Mereşê nivîsiye, pêşkê bikim. Mereş bûkek ji bûkên Kurdistanê ye, ya ko nayaran çavên xwe berda- ne revandina wê:

Keça delal Meres  
Hê di dergûşê de ji te re digotin  
Bavê te Kemalê mezin e,  
ew ti caran zaroyên xwe bi tenê nahêle.

Ew çend car bûn ji te dipirsîn:  
Kî bavê te ye, ma ne ew hij we hemiwan dike?  
Hindik ma bû, tu ji bîr bikî, zimanê bi çi zimanî dipeyive.

Di xwendegehê de agir berdidane dilê te:  
Ez serbilind im, ko ez keça te me.  
Tikesî, te jî, nediwêrî bigota:  
Ez Kurmanc im, ezê bi tenê li dijî we hemiwan rabim  
û ber bi „gunehê xwe” werim, va ye, ez ne Tirk im.

Gelo vî bavî tu çiqasî rind xwedî kiriye,  
da tu ji wan re weke kûçikekî bi hefsar,  
weke keçeke xapandî, ya ko li esil û fesilê xwe serî lê geraye,  
yeke ko di nav hevalên xwe de, bi dil birîndar,  
birîndar û tim bipavemayî:  
Bêrîvanek li qurçika paî ya vê dinyayê.

Gelo ewê çi be, gava rojekê tu bi xwe bihisî,  
ko ew ticaran ne bavê te bû?  
Gava di nava dilê te de hestin hiyar bibin,  
ber bi ezmanan bikevin û weke refên azad  
yên qaz û qulingan li sînorên Kurdistanê bigerin  
û di nav lîsên dilên xapandî de deynin?  
Li wê derê, devera ko dibêjin:  
Êdî em hew li rengên çekan dipirsîn.  
(Payîza 1998an)

# SÎYASETÊN ZIMANNASÎYÊ Û KURDÎ

W. BARAK

Berpîrsîyarê CFL-Centre de Formation de Langues

Mîn divê dî destpêkê da sîpasên xwe pêşkêşê KOMKARÊ bîkîm jî bo ku ev konferans amade kirîye û em vexwendîne. We beşdarên hêja jî sîlav dîkîm û xêrhatîna we dîxwazîm.

Berê dest bî gotara xwe bîkîm, dîxwazîm xalekê bînîm bîra we ku mijara me "sîyasetên zimannasîyê" ye. Ne tenê sîyaset û zîman, lê her wîha bî gîştî sîyasetê zimannasîyê û sîyasetê dî warê zîman da çî ye, û divê çawa be? Têkîliyên zîman û sîyasetê çawa ye, kîjan rolî dilîze? û hwd. Emê bî kurtî lî ser wan rawestîn. Em lî vê derê lî ser 'zîmanê sîyaset û sîyasetvanan' nasekînî, ev babeteka dî ye.

Gotara me jî sê beşên bîngêhîn pêk tê. Wek destpêkê, dî beşê yekê da lî ser sîstema çandî ya neteweyî, dî para dîduyan da lî ser sîyasetê dewletên dagîrker û kolonyalîst, bî pîranî jî lî ser sîyasetê dewleta tîrk dî warê asîmîlasyon û etnosîdê da (çandkujî) û wek beşê dawîn jî derbarê sîyasetê me bî xwe dî warê zîman da çî ye û divê çawa be, emê lî serê rawestîn.

## DESTPÊK

Lî gora pîranîya lêgerên etnolog û zimannas, sîstema çandî dî bîn hîm navên cuda da têne bînavkîrîn. Her wîha mîrov dîkare jê ra bîbêje sîstema etnîk, sosyokultûrel (cîvakoçandî) an jî etnologîstîk.



Henrî Tajfel dî berhema xwe ya bî navê 'Social identity and intergroup relations' (Nasnavê cıvaki û pêwendiyên navkomelî) da dînivîse:

"Nasnavê cıvaki: bî zanebûn xwe sıpartın û tevlêbûna komekê ye. Dî wî da hestên gıyanî xwediyê pareka mezin e." Dîsa Maxime Rodinson dî gotara xwe ya bî navê 'Rascisme et ethnicisme' (Nıjadparêzî û regezparêzî) da dînivîse ku "etnik: kêm zêde xwedî kok û rehekî hevpar e. Dî navê da xetên çanda hevbeş, sazîyên hevpar, axek-erdek, û ya sereke jî zımanekî bingehîn hene. Heye ku jî wan hın kêm bın jî". Jean William le Pierre jî, dî berhema xwe ya '*Le pouvoir politique et les langues*' (Hukma sıyasî û zıman) da, dî nava wan hêmanên sereke da, zımanekî hevpar weka hîm û sitûna bingehîn bî nav dıke. Roland Breton jî dî '*Les Ethnies*' da wıha radıghîne "Etnî wek beravahî jî antropolojîya fizikî, zıman û erdekî, jî aliyê strukturê va jî, jî aborî, cıvakên bıçın, çand û şıura etnik pêk tê".

Nıha em dıkarın bêjın ku sıstema çandî ya neteweyek, jî bîr û dırokeka hevbeş, anku hafızeya mıřterek çêdıbe, wêjeya devkî û nivîskî, folkloreka hevpar, muzıka lı ser rıtm-meqam û awazên xweser pêkhatî, xetên coxrafî, kêm çaran jî dın-bawerî sıtûnên sıstema çandî yê bingehîn pêk tının. Daxwazıya jıyana bî hev ra û dı nava hev da jî, tê da rolekê dıleyîze. Dı nava para çandê da jî huner, sembol, teknîk û avadanî cıh dıgırın.

Lı vê derê dıxwazım bınim bıra we, ku ev xalên ku me hınek berê rave kırım, anku wêje-edebıyat, folklor, muzık û huner û hwd, bê zıman weka bêcan û bêgıyan e. Bı kurtî, em dıkarın bêjın ku bê wî (zıman) ev sıstem nıkare çêbe û bı mırina wî jî, jı holê radıbe.

Mılletekî bêzıman çı bı devkî çı bı nivîskî, neşê dıroka xwe ragıhîne, wêjeyekê çêke an berhemekê bıafırıne. Jı ber vê yekê ye ku zıman weka navgın û sıfetek e jı bo bınavkırina komek û gelekî. Wek nımûne 'kurd-kurdî, alman-almanî, japon-japonî.

heta carına bı tenê yek peyvîkek hem navê gel û hem navê zımanê wî weka swedî, holandî, çînî û hwd. tê gotin.

Lı gora ku Roland Breton radigîhîne, Irlandî dibêjin:

"Gan tanga, gan tîra" yanê "bê zar û zıman, nabe nıştımın."

Ew weka çimento ye dı qewîkırın û bihevğirêdana dîrok, wêje, muzîk û folklorê da. Ew hest û ramanan dı girêdan û werisandına nasnavê neteweyekê ya kolektîf da hê xurttir dıke.

Bı saya wî, em hest û ramanên xwe, hebûna xwe bı pergalên ristesazîyê, (sîstema sentaksê) bı formeka serbıxwe, pêwendîyên dîyarîtî radigîhînin. Bı wî em dıkarın hunerên gelêrî û folklorîyê bı form û bıwêjên rengareng derbasî nışên nû bıkın. Carcaran ev form ewqas xweser in, ku lı rûyê dınyayê mînakeka weka wan nayên peydakırın.

Helbet zıman lı gora pêdivîya jîyanê dı bı formên dîtır da jî tîn sazırın, wek simbolên trafikê û hwd. Lê ev nışankırın bı sînor û teng e. Zımanê ku em qalê dıkın zındî ye, bı pêwendî, jîyan û afirandınên mirov ra sererast têkıldar e.

Zarûkek gava dest bı hînbûna zımanekî dıbe, hê dı destpêka fêrbûnê da, bı têkılîya jîyan û tevlêbûna cıvakê, ew dıbe kesek, ew dıbe endamê wê kom û cıvakê bı xwe. Jı bêr vê çendê, eger pêşî lê neyê girtın pêşda dıçe, xwe dewlemendtir dıke dı alîyê raman û form da. Na eger pêşî lê were girtın dılukume, dıkeve nava tengavîya nasnavî. Ev jî encamek e jı sîyaseta kolonyalîst, ku einê paşê hewl bıdın vekolın.

Bı van hın xalên ku me berê gotın, bı kurtî me xwest dı nava sîstema çandî da bı xwe, zıman çawa rola zemq û şîrêzê dıbine. Wan bı hevdu ra girê dıde û hebûna wî dıbe bingehêk dı çêbûn û yekbûna neteweyekê, *clax*.

Hêvıdar ım, bı kurtî be jî, me karî girîngîya zıman raxînin ber çavan. Jı bo dema me kın e, nıha jî em dıkarın derbasê "bı gıştî zımannasî" ye bıbın.

Zımannasîya ku em qalê dıkın zanısta ku 'bı zıman ra û jı bo zıman' mijûl dıbe ew bı xwe ye. Anku lı gora zımannasê mezin Ferdinand de Saussure (1916) ku hımdarê zımannasîyê ye, ew bı yek tıştêkî tenê, ew jı zıman bı xwe ye, mijûl dıbe û lı serê hûr lêdikole. Zımannasî (ku cara yekê dı 1883 an da hatıye bı-karanîn) bı awayekî dı em dıkarın bêjın ew zanına lêgerına deng-nasî (fonetık), rıstesazî (syntaks), watenasî (semantık) û cıvakî, ya zımanekî ye. Dı heman wextê da jı struktura bıngelhên wı, pêşvaçuna wı, dabeşkirın û têkılıyên wan bı hev ra jı vedikole. Her wıha, zıman weka sîstemeka statık (mına ku wêneya wı bê kêşan jı bo nîşandana rewşa wı) tê lêkolın, jê ra tê gotın len-guîstıka senkronık. Lenguîstıka dıakronık jı, lı pêşvaçuna sîste-ma zındı û dınamık vedikole. Mırov dıkare wê, bı zımannasîya dırokî jı bı nav bıke. Lenguîstıka fonksıyonel û struktural û beşên dı lı dıyardeyên (fenomen) zıman vedıkolın.

Mıjara me bı xwe, ne xasma lı ser zımannasîya teorık e, jı ber vê yekê jı bawer dıkım zêdetır pêwıst nake ku em lı vê derê bı kurahı lı ser van têgıhan rawestın. Bı gıştı wateya wan zanın jı bo niha têrê dıke. A ku bı gıranî emê hewl bıdın vekolın, bı wateya dıduyan a zımannasîyê ra têkıldar e. Zımannasî jı alıye-kî dı va bûyer û dıyardeyên bı zıman ra gırêdayı ne, yanê her tıştê ku bı zıman ra têkıldar e, bı wan ra jı mijûl dıbe. Wek nımûne: sıyaseta zıman, azadbûna zıman, fêrkırına zıman û hwd.

Xwezıya mın jı bo bıjartına têgıha 'zımannasîyê' dı şuna 'zımanzanîne' da jı ev e: Kesek dıbe ku zımanekî baş bızane, wek Kurdî, Erebi, Farısî û hwd. Bı vı zımanî hest û ramanên xwe bıkarê bı hêsanî û serkeftı jı ragıhıne. Em dıkarın wı wek 'zımanzan' bı nav bıkin. Lê ev nayê vê maneyê ku ew pısporê zıman bı gıştı ye. Gava em bêjın "ez vı zımanî nas dıkım" ew jı "ez bı vı zımanî dızanım" xurtır e. Kesê ku pısporê zımanekî ye an zımanan bı kûrahî nas dıke û nasyarê wan e, û bı ser da jı pergıl, rê û rêzıkên zıman dızane, dıbe bê navkırın wek lenguíst

anku zimannas, her weka ku dî Kurdîya başûr da jî ev terîm tê bîkaranîn.

Em niha vegeerî ser sîyaset-polîtîka û tekîlîya wê bî zimannasîyê ra.

‘Polîtîka’ gotîna ku jî koka polîtîkê jî polîsa ‘bajar’ a yewna-nî-grekî hatîye, dî maneya bî rêvabırına kar û barên dewletê, pêkanîna kar û xebatên wê hatîye bîkaranîn. Jî 1361 an vîr da jî bî wateya organîzasyon û rêvabırına kar û xebatên gelî tê bîkaranîn.

Herçî sîyaset jî gotînek jî zimannasîyê erebî hatîye, berê bî maneya xwedîkırın û seyîskırına hespan bûye, paşê jî maneya wê firehtır bûye, niha jî dî ferhengana da wek pêkanîna û rêvabırına kar û barên milletekî tê dîyarkırın.

Çawa ku sîyasetê hundurîn, sîyasetê aborîyê heye, her wîha sîyasetên zimannasîyê jî hene. Mebesta me ev e ku sîyaset ku bî pıranî û gıranî jî alîyê hêzên serdest va, dî karûbarên îdarî, rêxıstınî, dadî, partî, sendîkayî û hwd. da tê meşandın, dî warê zimannasîyê da jî xwedî amanc û stratejîyê e. Jî tespîtıkırına alfabe yê bıgırın heta bîkaranîna zimannasîyê dî warên cuda da, mijarên sîyasetê zimannasîyê ne. Her wîha hukmekî serdest bıyarên ku derheqê fılan zimannasîyê û zaravayî da dıgire, bî hın şeweyan wî qedexe dıke, bendan lı pêşîyê datîne, ev jî mijarên sîyasetê zimannasîyê ne. Bî gıştî bîkaranîna sîstema pedagojîk dî rade û astên cihê da, jî materyalên perwerdeyîyê bıgırın heta bername û mufredatên xwendeghan jî dıkevın nav babetên sîyasetê zimannasîyê.

Ew pırî caran gırêdayîyê sîyasetê gelemper û gıştî ye. Sîstem û formasyona sosyopolîtîk çı be, ew jî hevahengê (paralel) wê ye. Eger sîstem zordar û leşkerî be, qerekerên şoven û şerxwaz tê da cîhekî sereke dıgırın. Na eger sîstem demokratîk be sîyasetê zimannasîyê pê ra jî perwerdeyeka pêşverû û mırowhez bî cihê tîne û wê dısepîne, dıxe pratîkê.

## BEŞÊ DUDUYAN

### SÎYASETÊN DEWLETÊN KOLONIALIST DI WARÊ ZIMAN DA

Niha jî em werin ser mijara me ya sereke. Dewletên kolonyalist û dî serî da dewleta tirk, jî damezrandina xwe heta îro, sîyaseteka çawa dî vî warî da pêkanîye. Xasîma lî hemberê sîstema çandî ya kurd, dî serî da jî lî ser zîmanê kurdî sîyaseteka çawa meşandîye?

Emê dî vî beşî da hewl bîdî amanc û şeweyên sîyaseta etnosîd (çandkujî) û lengusîd (zîmankujî) raxînin ber çavan. Gelo ev sîyaset çiqas jî alîyê wan va bî serketî ye. Têkilîya wan polîtîkayan bî gîştî bî sîyaseta çandkujîyê ra çawa ye. ?

Berê ku qala sîyaseta Tirkîyê bîkî dîxwazîm hîn agahîyên gelemper pêşkêşî we beşdarên rêzber bîkîm :

Rewşa zîmanan dî nava sînorên dewletekê da bî sê awayî dîkare pêk bê.

1- Ragîhandîna bî zîmanekî dî mumkîn e. Hemwelatî bî zîmanekî hemwelatîyê dî dîzanîn. Dî warê cîvakî, karûbar, alûgor, huner û hwd. da dîde dîstîne. Zîman jî alîyê statû va wekhev in. Serdestî, jêrdestî tune. Jî vê ra tê gotîna dîzîmanî, pîrîzîmanî (bîlenguîzm, plurîlenguîzm.)

2- Komeke serdest heye û zîmanê wî dî warên bîlînd da tê bîkaranîn, weka dî warê îdarî, aborî û ragîhandîne da. Lê Zîmanê ku bîndest e anku xwedîyê statûya nîzîm e, tenê dî malê da, dî pêwendî û jîyana gundîtî û folklorî da tê bîkaranîn. Endamên vê komê cotzîman in. Lê koma serdest tenê zîmanê xwe yê serdest dîzane û pê dîaxîve. Ew pêwîst nabîne ku zîmanê yê jêrdest hîn be.

3- Rewşa sîsêyan : Yek Zımanek dı hemû waran da bê îstisna serdestîya xwe lı ser yê dî dıke. Tenê kesên temendirêj, zımanê jêrdest dızanın. Zarok û xort bı zımanê serdest mezın dıbin. Zımanê jêrdest ber bı mırınê va dıçe. Lı vê derê mirov dıkare qala glottofajî (zıman ber bı mırın û wendabûnê va dıçe) bıke. Zımanê Kurdî dı rewşa sîsêyan da cîh dıgire, xasıma lı Kurdîstana Bakur, jı ber hın sedeman, ku emê paşê lı serê rawestın.

Gelşên zıman, nîqaşên ku lı serî dıbin ku car caran dıbin sedemên pevçûnên mezın, dı nava gelek dewletan da, jı mêj va ye berdewam e. Van salên dawîyê jı bılı Tırkîyê lı rûyê dinyayê her dewletek kê m zêde jı kêşeyên xwe ra çare peyda kırine lı ser rêzgirtına zımanên cuda da.

Ku hınê em lı dîrokê vegerın em dıbının ku dı sala 1870 î da parlamenta Londrayê bıkarana zımanê Galûwaz qedexe dıke . Ev qedexe heta sala 1907 an dıdome, dı wê demê da beşekî taybet jı bo welatê Galles "*Board of Education*" çê dıbe. Dı sala 1910 an da lı ser 2 mîlyon û nîv gelheyî bı tenê 190 hezar kes karîne zımanê xwe bı rêk û pêk bı kar bının. Lı dora 700 hezarî jı bûne duzımanî. Jı 1960 î vır da dı dadıgeh, xwendegehên destpêkê û dı weşanên radyo û televîzyonê da, lı tevî zımanê İngılızî ew jı tê bıkarana.

Norwey heta sala 1814 an dı bın hukmê Danîmarkê da bû. Pıştra bû dewleteka xwedmuxtar dı bın sîwana Swedîyan da. Dı 1905 an da jı bû serbixwe. Bêrî destpêka sedsala 20 î da lı Norwejê zımanekî yekgirtî nebû. Helbestvan Ivar Aasen û roman-nivîsar Wergeland, jı zaravayên herêmî gramer û ferhengek amade kırın û lı ser wan jı zımanekî nivîskî neteweyî ê çêkırın.

Welatê Swîsrayê dı destpêka sedsala 19 an da, dı sala 1803 an da bû dewleteka pırzımanî. Lı Swîsrayê îro sê zımanên sereke, pıştî destûra bingehîn bı xala 116 an a sala 1848 an bûne fermî. Almanî, Fransızî û İtalyanî, û kêmek jı Romankî. Belçika jı nımûneyeka baş e dı çareserkırına gelşên zımanan da.

Em dıkarın encamekê jı van nımûneyan derxînin; ew jî pırs-gırêk bı hebûn û peydakırına statuyek çareser dıbin. Her dı welatên paşdamayî û dı bin dagırkeriya dewletên serdest wek lı Srîlankayê (pırşa Tamîl) ku ew jî niha lı ser rîya çareseriyê ye) ev pırsên lınguîstîk bı tundî berdeyam ın.

Dı gelek dewletên Afrîkayê da jî, gelşên zıman bı kolonîze-kırınê ra peyda bûne. Dı serî da İngılız, Fransız, İspanyol, Alman û Belçîkî (Rwanda, Burundî) Tanzanî, Kenya, Kamerûn, û lı gelek welatên dî, her çıqas welatên kolonyalist zımanê xwe ferz kırıbın û zıman û çanda kolonîyan pıçûk dıtıbın jî bı awayekî sîstematîk zıman jı navê ranekırıne.

Dıkare bê gotın, ku heta niha sîyasetên dewletan bı şeş awayên cuda hatıne birêvabırın :

1- Dewletê bı sererastî hewl daye, zıman jı holê rake. (Weka sîyasete lı Kurdistanê).

2- Dewletê bı xwe ev sîyaset nemeşandîye lê lı kuştına zıman temaşekırîye bê deng maye.

3- Zımanekî dî dıkare bı tevî yekê dî bijî, lê dewlet tı alıkarîye nake jı bo pêşdaçûna wî.

4- Dewlet alıkarîya tenê çend fonksyonên zıman dıke.

5- Dewlet hebûna zıman qebûl dıke, lê wî nake zımanê fermî, zıman tenê zıkmakî dımîne.

6- Dewlet pırşa zıman bı awayekî dadmendî lı ser wekhevîyê çareser dıke. Zımanên ku bı hev ra dıjîn fermî ne, weka lı Swîsra û Belçîkayê.

Gava em behsa rewşa gelê Kurd bıkın, mırov nıkare nımûneyeka dî weka wê, lı rûyê dınyayê peyda bıke.

Gelê kurd, zımanê wî Kurdî û welatê wî Kurdistan bı rastî jî ecêb e, ku rastî dagırkerên pır xedar hatıne û ew bûne cîranên hev. Mıxabın mırov nıkare cîranên xwe hılbijêre.

Berî ku bı gıranî em werın ser rewşa Tırkîyê, hın agahîyan lı perçeyên dî dı warê sîyasete zıman da em bınhêrın :

## LI ROJHILAT, BAŞÛR Û ROJAVA

Dı destûra bingehîn a Iranê ya ku dı sala 1908 an da tê qebûl-kırın, zımanê Farisî dibe yek zımanê fermî. Lê heta 1921 ê ew pır zêde nehat bicîhanîn, jı ber ku ew heta derbeya Rıza Xan dewletaka jı alîyê navendî va sıst bû. Jı 1923 an şûnda bıkaranîna zımanê Farisî wek zımanê resmî hat ferzkırın. Ev sîyaseta serdestîya zımanê Farisî dı herêma Azerbaycanê da jî hat bıkaranîn. Lê sîyaseta ku lı perçeyê Kurdistanana Iranê hat birêvabırın dijwartır bû. Jı bo berlêgirtına netewebûna Kurdan, Iranê Kurdistan kır sê beş û ew bı Tahranê va girê da. Nivîskar û helbestvanên kurd hêrişên lı ser zıman û çanda Kurdî dı pırtûkên xwe da bı awayekî eşkere raxistine ber çavan. Iranê ne tenê bı qedexekırına lı ser parçeyê Kurdistanana Iranê her wıha gava ku lı Kurdistanana Iraqê dı sala 1931ê da projeya zımanan tê ber parlamentoyê, dijberîya xwe bı tundî nîşan dıde.

Sîyaseta Farisîkırinê dı dema Rıza şah (1941-1979) da hat domkırın. Lê dı vê sîyasetê da piçek sıstbûn jı çêbû, piştî vekışına wı jı ser text, zımanê Kurdî weka zarava hat bınavkırın. Her wekî lı Tırkiyê lı Iranê jî, zanîngeh û profesorên wan, bıındkırına zımanê Farisî bı awayekî şoven kırın bernameyên xwe, ew propaxande kırın. Heta ewqas pêşda çûn ku serekê akademîya zıman Sadî Keya îddıa kır ku zımanê Erebi û Tırkî ew her du jî zaravayên Farisî ne, jı zanîngeha Tahranê Moxeddem jî xwest bıpeyitîne ku Tırkî jı yek zaravayê Farisî ye. Jı bo xurtkırına zımanê Farisî û bendkırına zımanên dı, dı dawîya salên şestî da wezaretana huner û çandê jı zımanzanan rapor xwestin. Amadekarên van raporana jı bo farisîkırinê bernameyeka gavbıgav û hêdî hêdî pêşnîyar kırın.

Her dı demên dawîn da dı bı sazûmana îslamî da jî, ev sîyaseta hat birêvabırın. Dı xala 15 an a destûra bingehîn da, Farisî wek alfabe û zımanê gelê Iranê tê nîşankırın. Belgeyên fermî, tedsîsat û mufredat her bı zımanê Farisî ye. Zımanên herêmî jî



dı warê çapemenî û ragihandinê da dıkarın bên bıkaranîn. Heta nîveka 1980 î destûra perwerdeya wêjeya etnîk nehatibû dayîn. Xala 15 an a destûra îslamî ku bı awayekî resmî alfabeya Farisî bı nav dıke, ev jî jı bo berlêgirtına teşebbusên latînikirîne ne. (Mamoste Emîr Hesenpûr dı vî warî da agahîyên berfireh dıde.)

Kurd lı İranê her çiqas nayêne înkarkirîne jî, zımanê Farisî xwedî statuya serdest e. Bı zımanê Kurdî perwerde nabe. Ew derfet, bı tenê jı bo çend seetan û bı zımanê opsiyonel –bijartîni- dı sala 1999 û 2000 î da hatîye dayîn. Dı weşanên radyo - TV ê da jî pır kêmlı ser satelîta Saharê ku bı Azerî jî weşanê dıke, lı gora dılê rejîma îranê (bı kurmançî-soranî) weşanê dıke.

Bı kurtî mirov dıkarê bêje, ku lı İranê jî sîyaseta asîmîlasyonê bı awayekî dî berdewam e.

\*\*\*

Şerê zımanan lı Iraqê jî her hebûye. Serdestîya zımanê Erebi hatîye ferzkırın. Dı salên 1958-59 an da dı dema Kerîm Qasım da, daxwazên Kurdan hatın piştgokırın. Dı sibata 1961 ê da civına kongreya mamosteyên kurd hat betal kırın û hemû şûbeyên wî lı Kurdistanê hatın girtın. Bı vê sîyasetê Qasım îlan dıkır, ku navê Kurd ne navê mîlletekî ye. Pêra jî dı hm gotarên rojnâmeya El Tewra da hatın îddıa kırın, ku Irak ne berhevoka gelan lê yek neteweyek e. Piştî vê demê şerê çekdarî dest pê kır heta adara 1970 î. Ev dem hem şer û hem jî dema înzekırına peymanan e.

Piştî şerê Kendavê bı alîkarîya şert û mercên vê dawîyê, nıha dı vî beşê Kurdistanê serbest da, zımanê Kurdî jı berê xurtır û qayımtır e. Hema herroj xwendegêh vedıbin û Kurd bê asteng û dijwarî, zıman û çanda xwe hın û fêr dıbin. Radyo û televîzyonên herêmî û yêneteweyî mîna ‘Kurdistan TV’ û ‘Kurd Sat’ lı ser satelîta HotBird (13 pîle rojhîlat) weşanê dıkın. Zıman û çanda Kurdî lı vî parçeyî jı sîyaseta etnosîde rızgar bûye. Ev yeka hanê jî jı bo hemî Kurdan cîhê şanazî û serbilındîyê ye.

\*\*\*

Lı Sûrîyê, heta dawîya salên 50 î xweşbînîyek dı warê zıman û weşana Kurdî da heye. Bînim bîra we ku dı sala 1932 an da Hawar bı kurmancî - latîni lı Şamê dest bı jîyanê dıke. Ew dı sala 1937 an da hat girtın jı alîyê dewletê va. Cara diduyan (pıştî hatına İngılızan) çar sal şûnda careka dî dest bı weşanê kırım. Bedîrxanîyan dı sala 41 ê da kovara Ronahî derxistin û dı navbera salên 41 û 46 an da dı radyoya Levant (bı Fransızî: rojhilat) weşanên bı kurdî hatın pêşkêşkırın. Pıştî girtına PDK Sûrîye ku Komara Ereb a Yekbûyî ew girt, weşan û pîlaqên bı kurdî hatın qedexekırın. Dı sala 1961 ê da lı wîlayeta Cızîrê 120 hezar kurd jı hemwelatîyê hatın derxistin. Sîyaseta erebkırîne bı berdeyamî ajot.

Sûrîyê jî, bı koçkırına Kurdan ber bı başûr û hundirê Sûrîyê va û bı belavkırına wan, bı nezan û birçi hêştına wan, bı çêkırına kemera erebî, bı sîyaseta îskanê, bicîhkırına erebên esıl jı bo kolonîzekırîne, bêpar hêştına jı hemwelatîyê Kurdên ku bı erebî nedızanîn û guhertına ulemayên Kurdan bı yêner eb va, sîyaseta etnosîde bı dijwarî bı rê va bırıye.

Heta îro jî, jı ber ku rêxistinên kurd qedexe ne û zıman û çanda kurdî dı sistemeka xwendegehî da nayêne bıkaranîn û ew hatine bendkırın, em dıkarın vê sîyasetê jî wek çandkuj û zımankuj bı nav bıkın.

\*\*\*

## LI KURDISTANA BAKUR

Hê dı demên paşî û ber bı rûxandına İmparatoriya Osmanî da, dı dema Sıltan Abdulhemîde diduyan da hêriş û zextên dijwar lı ser Kurdî dest pê kırine. Dı wê demê da 'Rojnameya Kurdistan' hatiye astengkırın da ku sînoran derbas neke, negihîje Kurdistanê û neyê belavkırın û xwendın. (Seydayê Mehmed Emîn Bozarslan ku Rojnameya 'Kurdistan' transkrip û şırove kırıye, ev yeka hanê bı firehî radığıhîne.)

Pîştî damezrandîna Dewleta Tirkîyê sîyaseta refîz û înkarkîrînê bî awayekî sîstematîk û dijwar dest pê kirîye.

Pîştî ku peymana Sevrê ku avabûna Kurdistaneka serbixwe hukim dikir (ev peyman dî 10 ê tebaxa 1920 î da îmze dibe) dî şûna wê da peymana Lozanê dî sala 24 ê hezîrana 1923 an da, peymana Sevrê bettal kir û ket şûna wê.

Hê dî destpêkê da hîzr û ramanên kolonyalîst dî bernameya dewleta tirk û reisê wî Mîstefa Kemal da hebû. Zêde naxwazim dema we bîstînim lê bî çend nîmûneyên kurt bînim bîra we, helwesta wan a wê demê.

Mîstefa Kemal jî bo Kurdan bixapîne dî 1 ê gulana 1920 î da dî helbijartîna endamên konseya wezaretîyê da digot : Ev meclîsa ku hatîye damezrandîna ne tîne jî alîyê Tîkan va, lê Çerkez, Kurd, û Lazan va hatîye damezrandîna û a wan e jî.

Lê dî navê ra pîr desbas nabe vê carê dî 1 ê mijdara 1922 an da, lî meclîsê vê axaftîne dîke: "Dewleta ku hatîye damezrandîna tirk e". Metoda xapandîne û derewên sîstematîk dî axaftîna û belgeyên fermî da pîr xweş dîyar in. Berê bî navandîna etnonîm (navê millet) dest pê dîke jî navên rastîna bî zanebûn xwe dîr dîxe. Wek mînak dî kongreya Erzurum a 1919 an û dî kongreya Sêvas a 1920 î dî axaftîna û belgeyên fermî da gava behsa gelê Kurd dîke dî şûna ku bêje 'Kurd' an 'Kurdistan' gotîna Rojhîlat -şerq bî kar tîne. Ne tenê ew, Cemal Gursel, serwezîr û serkomarên ku paşê hatîne ser hukim, hemîyan ev sîyaseta înkarkîrînê bî rê va birîne.

Dîxwazim bala we bîkşînim ser vê yekê, ku dî sîyaseta kolonyalîst a dewleta Tirkîyê da, berevajîkirîna etnonîm û toponîmê jî destpêkê heta îro cîhekî mezîna digire. (Etonîm navê gel û zîmanê wî- yanê 'kurd-kurdî', toponîm jî, navê coğrafya û welatê wî ye yanê 'Kurdistan'.)

Pîştî ku dî 3 ê adara 1924 an dîbîstan û medreseyên kurdî derîyên wan hatîna morkîrîna û gîrtîna serhîldanên Kurdan lî hember vê sîyasetê qewimîn. Dî meha sîbata 1925 an da 'Dogu Istik-

lal mahkemelerî` tê ava kırım, her jî bo darezandına Şêx Seîd û hevalên wî. Dî 8 ê meha îlona 1925 an da `Dogu Islahat Encumenî` projeya `Dogu Islahat planı` amade dıke. Pıştra jî dı 1928 an da Dogu umumî mufettişligî. Hêdî hêdî ev navên `dogu` (Roj-hılat) jî dı nava terıma `Anadolu` da hatın helandin. (peyvıka `Anadolu` bı xwe jî gotına `Anatolî`ya bı Yewnanî tê -cîhê roj lê hıl tê-). Pıştî ku serhıldana Agırî dı 1930 î da hat temırandın Mustafa Kemal dı axaftınên xwe da dest pê dıke jî bo navandinna Kurdan vê carê etnonîma `Tırkên Çîyayî` bı kar tîne. Ne bınavkırına hebûnekî bı navê wî yê rastın, lê bı navkırına bı rengekî dî, destpêka prosesa asîmîlekırınê ye. Guhertına navê günd û bajarın, çem û deşt û çîyan bı pıranî jî dema Mustafa Kemal dest pê dıke. Wek nımûne ew bı xwe navê Dîyarêbekır dıguhurîne dıke Dîyarbakır. Pıştra wek tê zanîn, navên bajarên Agırî, Rıha, Dîlok, Gurgum, Dersım, û gelekên dî hatın guhartın. Her wıha, çıqas navên coxrafî ên kevn hebûn, hemî hatın tırkıkırın.

Heta qedexekırına navên mırovan jî, para xwe jî vê sîyasetê gırtın. İro jî dewleta tırk bı sîyasete xwe ya sosret navên `Şervan, Zozan û Bêrivan`an qedexe dıke. Dı şûna wan da yê tırkî ferz dıke.

Her weka ku Roland Breton dı `Les ethnıs` da dıbêje sîyasete asîmîlasyonîst bı refızkırına bınavkırına dı warê statıstîk, hıqûqî û dı hemû kategorîyên taybet da dest pê dıke. Pıştra jî dor tê jı navêrakırına wan bı hukmê zorê.

Dısa ku em vegeırın ser mıjara bınavkırınê, bê îstîsna hemî weşanxaneyên dewletê û doxtorên profesur wek Hamdî Raşıt Tankut (yek jı pêşengê Teorîya Zımanê Roj-Guneş dıl teorısî-) sosretek e mezin e ku bı fermana M. Kemal îddıa dıkırın ku hemî zımanên lı rüyê dinyayê jı zımanê tırkî çêbûne- F. Kırzıoglu, M. Eroz, B. Ogel, T. Gulensoy, M. Şukrî Segbab, A. Engın, N. Sevgen, N. Onur û gelekên mına wan, jı 1928 an vır da, pırtûk, meqale an broşurên Weşanxaneyên lêgerına çanda Tırkî (TKA), Sazîya dîroka tırk (TTK), sazîya zımanê tırkî (TDK) û

hwd. da bı meeşê dewleta tırk, lı gora sîyaseta wê ya şoven û nijadparêz nivîsîne ku 'Kurd' tune ne, îddia kirine ku ew 'tirkên çîyayî' ne. Bı zanetî jı bınavkırına 'Kurd, zımanê Kurdî û Kurdistanê' xwe dūr xıstine, dı dewsa wan da ev sıfetên lı gora sîyaseta asimilasyonîst bı kar anîne. Dema me zêde namîne lê emê jı wan çendan wek nımûne bêjine we.

Qaşo, xwedêgiravî van profesorên dîroknas û zımannas yên sextekar (bı rastî mirov jı vana ra bêje metalenguîst - pseudo-lenguîst dı cîh da ye.) Ka bınihêrın bınavkırına etnonîm û toponîmên 'Kurd' da çı dınivîsın dı xızmeta dewleta xwe da.

Dı şûna 'Kurd' da :

" 'Kert mî Kurt mu' Kert an Kurt?

Kurmancî ve Zaza turkçelerî (Zımanên tırkî ên Kurmancî û Zaza)

Kurtlerin turklugu (tırkeyatîya Kurdan)

Kurt turklerî (Tirkên Kurd)

Dogulu turkler (Tirkên rojhilatî) û hwd.

Daglı turkler (tirkên çîyayî)"

Belê ev yeka hanê, ev sîyaseta asimilasyonîst- ev e 80 sal ın bı aliyê xızmetkerên dewletê va tê meşandin.

Jı aliyekî dî va serleşkerên wan jî gava Kurdan bı nav dıkin dibêjin 'haydut çetelerî' (çeteyên eşqîyan) carcaran jî tu navekî nadin û dibêjin : 'bunlar', (evana), 'vatandaşlar' (hemwelatî).

Tê bîra me dı dema bıkaranına bombeyên çekên kîmyayî da Kurdên başûr xwe sıpartıbûn Kurdistanana Bakur. Dı wê demê da, jı bo ku wan bı navê 'Kurd' gazî nekın jı çapemenîyê bıgırın heta rayedarên wan, jı bo zarokên pênc salî jî navê 'pêşmerge' bı kar dianîn.

Tênê bıkaranına van terman neheqîya vê sîyasetê radixîne ber çavan. Ne tenê bı gotın, lê dı pratîkê da jî, jı bo ku ev sîyaseta çandkuj (etnosîd) bı ser keve, çı metod û bername bı kar anîne bı sebra we niha jî em bı kurtî lı wan bınihêrın.

Kuştına kesekî hêsan e aliyê can û beden va. Gulleyek an kêrek carına bes e jî bo kuştinê. Ev yeka hanê gava bî sîstem û berna-me be û lî ser komek an gelekî bê bıkaranîn jê ra dîbêjine je-nosîd (komkuji. Jî bo vê, nîmûne dî dîroka dewleta Osmanî û Tirkîyê da gelek in; Lê niha ev ne mijara me ye. Emê lî serê ranewestîn.

Me got kuştına fizîkî ne pîr zor e ku têra xwe çekên giran û leşker hebin. Lê ferzkırına zıman û çandeka bîyan bî darê zorê ne ewqas hêsan e. Wek kesekî bîdın hember xwe û jê ra bêjın "te divê tu zımanê xwe jî bîra bıki." Ew kes bıxwaze û dîl bıke jî nıkare zımanê xwe jî bîra bıke.

Ev yek jî bo gelan jî her wîha ye. Dewleta tirk a kolonyalîst jî destpêkê heta îro, îddia kırıye ku 'Kurd, Kurdî, Kurdistan' tune ne û tî caran çenebûne. Bî vê sîyasetê xwestiye ku gelê Kurd dîroka xwe, folklor a xwe, wêjeya xwe ya devkî-nivîskî, û dî serî da jî zımanê xwe jî bîra bıke. Dîbêjın "ew zımanê ku hûn pê dıaxıvın ne tî zıman e. Devok e. Belkî ne devok e jî, tıştekî tevlêhev e, qîma tî tıştekî nake."

Pıranîya dewletên kolonyalîst ev propaxande kırine lî ser gelên bîndest û kolonî.

Çı bê kırım jî, zû bî zû û bî carekê da, ev sîyaset a danjıbîrkırın û mêjîşûştın nagıhîje reyla xwe. Gelo çıma ? jî ber ku nete-veyek xwedîyê hafîzeyeka demdîrêj e. Bî hezaran bêje û gotın û bıwêjên wî zımanî, tevî çîrok û metelokan, folklor û muzıka wî, wêjeya devkî jî pê ra, zû bî zû nıkarın bışon.

Jî ber ku çand û zımanê kurdî ku ewqas qedîm û xwedî kok û rehên qewî ye û jî bajarvanî û şarîstanîyeta kûr û dûr nısıliye gıhîştîye heta îro, hê zehmettir e.

Hêzên serdest û kolonyalîst heta pîr caran jî me zêdetır dî zanabûna wê da ne. Jî bo vê jî, çı metodên berlêgırtınê hene bî kar anîne. Yek jî wan qedexekırına weşanan e.

Em pîr zêde dûr neçın, dî salên şestî da, dî navbera 1965 û 1968 an da kovarên ku bî duzmanî derdıketın wek Dîjle Fırat,

Deng, pîyesên fîyatroyê, hatin berhevkirin û astengirin. Hê di wan salan da alfabeya Kurdî ku ji aliyê Seydayê Mehmed Emîn Bozarşan va hatibû amade û çapkirin, hat berhevkirin û bi salan ew li dadîgeh û girtîgehan gerandin. Di salên heftêyî da jî, kovar û rojnameyên ku nîvenîv tirkî-kurdî derdiketin, hatin berhevkirin û girtin, li xwedî û nivîskarên wan cezayên giran hatin birrîn.

Dewleta tirk ji bo qewîkîrîna sîyaseta qedexekirîna xal û bendên destûra bîngêhîn, her cara ku keysa wê lê hat ew guhertin, ên diwartir kirin şûna wan.

Di madeyên 26, 28, di hukmên ceza yê 141 û 81 ê da dîsa di destûra bîngêhîn da, di xala yek, dudu û sisêyan da, zîman û çanda kurdî wek hedef hatine girtin û qedexekirin.

Bi kurtî di naveroka van xalan da ev têne ferz û îcbarkirin: "Zîmanê zîkmakî yê hemwelatîyên Tirkîyê, zîmanê tirkî ye. Ji bîlî vî zîmanî ragihandin û weşandina nivîskî û çapkirin, band, fîlm, dîsk qedexe ne."

Zîmannasê Alman bi navê Klaus Bochman, sîyaseta zîmannasîya hukmên faşîst û kolonyalîst dîde ber hev û ji wan çar nuqteyên hevpar ku dişibin hev, nîşan dîde.

"1- Dijmînahîya zîmanên dî, ji bo wê jî safîkîrîna an paqîkîrîna kelîmeyên van zîmanan bi awakî zorê ji zîmanê xwe.

2- Santralîzma neteweperîst li hemberî kêmayetîyan.

3- Kolonyalîzm û destdirêjîya li dervayî sînorên dewleta xwe."

Ev her sê nuqteyên hevpar jî çawa li sîyaseta dewleta tirk di guncê û eşkere ye.

Dewleta tirk ne tenê ji bo qismê ku dagîrkirîye, her wîha gef û gur li hemberî Kurdên li perçeyên dî jî xwarîye.

Li gora ragihandina zîmannas Jean Louis Calvet, di qedexekirîna zîmanan da mînakêka dî ya balkêş di dema Mussolînîyê Faşîst da heye. Mussolînî bîkaranîna zîmanê Fransîzî li herêma Val d'Aoste (heta wê demê duzîmanî bûye) qedexe dîke û çiqas

navên coxrafî yên wê herêmê hene, hemî guhertîne, ew kîrîne bî İtalyanî.

Gava mîrov bêje, ku dî vî warî da, rehberên dewleta tirk Mussolînî û îdeolojîya wî ya faşîst bûye, ne fişal û mubalexeye!

Dewleta tirk qîma xwe bî qedexekîrîna zîman û çanda kurdî neanî. Zarokên Kurd, ew jî dorberên xwezayî- tabîî- jî dûrxîstî. Bî sedan mektebên bî navê 'Yatılı okul' (xwendegehên bî razan) bî taybetî lî herêmên Kurdîstanê ava kîrî.

Bî mîlyonan zarokên kurd, dî mektebên şoven da hîm zîman û çanda xwe jî bîr kîrî, hîm jî alîyekî dî va jî, bî dîrokeka derewî mezî bûn.

Iro jî bî mîlyonan xwendekarên kurd, dî hewşên dibîstanên tirkî da, her sîbe jî naçarî sonda 'tirkbûnê' dîxwîm. Sonda "Turkum, Ne mutlu Turkum dîyene, Canım türk varlığına ulusuna feda ve armagan olsun" (Ez tirk îm, çî bextewar e, kesê ku jî xwe ra dibêje ez tirk îm, canê mîn gorî û dîyarî be jî mîllet û hebûna tirk ra) rewşa sîyaseta asîmîlasyonîst û çandkuj, bî vekîrî radîxîne ber çavan.

Pratîkeka dî jî, dî vê sîyasetê da guhartîna navan e. Dîsa bî hezaran navên gund û bajar û bajarokan hatî guhertî, Dî şûna yên kurdî an yên kevî da yên tirkî hatî bîkaranî. Navên kesan bî xwe jî hatî bendkîrî. Navên zarokan hê jî wek sosreta destpêka sed sala 21 ê berdewam e.

Sîrgûnkîrîna Kurda bî darê zorê, jî warê bav û kalan û he landîna wan dî bajarên metropolan da, ew jî xekek e jî sîyaseta tunekîrî. Bî taybetî jî dî 'şanoya' van salên dawî da, lî dora 4000 gund û bajarok hatî kavîlkîrî, lî dora 6 - 7 mîlyonî kurd, bî darêzorê hatî koçeber û sîrgûn kîrî. Gelek balkêş e ; asîmîlasyonîna van 20 salên dawîyê jî 80 salan bî tesîrtîr û xîrabtîr bûye.

Bî kurtî dewleta tirk hem sîyaseta jenosîd û hem jî ya etnosîdê bî xedarî bî rê va bîrîye.



Dı encama vê sîyaseta etnosîdê da bı milyonan kurd bûn niv-  
duzımanî. Bı zımanê qedexekırî nıkarın bı rêk û pêk bıaxıfın.  
Xwendın û nivîsandın gelek kême. Dı warê ragıhandınê da çapemenî hwd. kurdî nikare lı hember zımanê serdest xwe bıparêze. Nebûna sîstema xwendegêhî ev yeka hanê gırantrî û xerab-tır dıke.

Dı van demên dawî da dewleta tırk jı bo endamefîya yekîfîya Ewrûpayê, bı lez û bez dı çarçoveya ‘bernameya neteweyî’ da hın guhertınên derewîn çêkırın. Dı guhertınên xalên ku têkıldarın bı zıman ra, dı wan da dîsa navê ‘K-u-r-d-i’ derbas nabe. Tê da têne gotın : devok û zaravayên ku jı bı bılı tırkî têne axaftın dıkarın bı qursên taybetî bêne hınkırın.

Ev qursên taybetî ku qalê dıkın jî anîne derecaya wek hınbûna bılûr û tembûrê. U bı ser da jî dıbêjın mamoste peydakırın ne karê dewletê ye. Kesên arızî dıkarın jı xwe ra mamosteyan peyda bıkın, ew jî bı şert û şûrtan.

Leyîzeka dî jî lı vê sîyasetê da tê meşandın. Dıbêjın me destûr daye hınbûna zımanê zıkmakî. Jı alîyekî dî va, jı sedî bêhtır mamosteyên gıredayî Sendıkaya perwerdeyê dest jı kar hatın kışandın an jî ew sırgûn kırın jı ber ku perwerdeya zımanê Kurdî daxwaz kırıbûn. Her wıha zext û zorên bı vî rengî lı hember xwendekarên zanîngehan jı hat rêvabırın. Anku gotın û kırın ne yek e. Her sîyaseta xapandınê lı ser kar e.

Mın diyê bınım bîra we ku ‘perwerdeya zımanekî’ û ‘perwerdeya bı wî zımanî’ tıştên jı hev pır cuda ne. Jı perwerdeya zımanekî mebest tenê fêrbûna wî zımanî ye. Perwerdeya bı zımanê kurdî ku sîyasetmedar û rewşenbîrên kurd dozê lê dıkıne ew jî fêrbûna zanîstên fızîk, kîmya, matematîk, bîyolojî, zanînen cıvakî, û hwd bı zımanê kurdî ye.

## SÎYASETA ME DERHEQÊ ZIMAN DA Û GOTINA DAWÎN

Bê guman pîrsên neteweyî, û pîrsa welatên kolonî jê ra çareyên sîyasî divên. Ev çareserî eger lı gora pîvanên dadî û wekhevîyê be, pîrs bı rastîn çareser dıbin. Ku wısa nebe ew bı êş û azar dıdome.

Dewleta kolonyalist jı ber dewlemendîya ser-erd û bın-erdê Kurdistanê naxwaze dest jı welatê Kurdan bıkişe. Dagîrkırın û sîyaseta etnosîd û jenosîde her jı bo vê ye, ne ku zıman û çanda me lı xweşa wan nayê ! Ew pır baş dızanın ku eger rojekê Kurd lı xwe vearqılın dê bıpırsın: "Welatê me jı aliyê hebûnên ser-erd û bın-erd va ewqas dewlemend e, lê çıma evçend paşda ma ye? "Pembûyê me ye, lê em tazî ne" dıgot Seydayê Cîgerxwîn. Dewleta tırk dewlemendiyên me talan dıke dıbe. Bı ser da jî bı leşker û serbazên xwe erda me dagîrkırıye, ev çı zılm û neheqî ye?

Lê jı bo van pırsan berî her tıştî şıûra millî (xwenasına neteweyî) divê. Sîyaseta ku jı aliyê dewleta tırk va tê birêvabırın jı bo kuştına vê şıûrê ye.

Bı gıştî, rızgarkırına çand û zımanekî jı aliyekî va gırêdayê hebûna statuyek e. Sê bingeh ku temînata rojên dahatî ne ev ın : Organîzebûna etnîk, terrîtoriyal (erdîn) û lınguîstîk. Lı vê derê em gotına etnîk bı maneya kok û reha cuda bı kar tının. Ev her sê cudahî her tenê cudahî ne. Anku em jı gelên dî, ne bılındtır, ne jî nızmtır ın. Me divê xwedî mafên wekhev bın.

Her wekî ku me berê jî got azadkırına welat û neteweyek bı rêxıstın dıbe. Partî û rêxıstınên kurd lı her parçeyê Kurdistanê lı gorî derfet û şıyana xwe hewl dane ku xwe rêz bıkın, gel hışyar bıkın jı bo têkoşına demokratîk û neteweyî, jı bo bı destxıstına mafên xwe yên rewa. Dı vê da kar û xebatên zıman û çandî jî roleka mezın dıleyızın.

Lı vê derê pırsek tê pêş me. Gelo parastın û pêşvabırına zıman berê rızgarbûnê yan pıştı wê ? Sîyaseta Kurdan dı vî warî da heta niha çawa bûye ?

Tê bîra we hın kes û rêxıstın rexneyên giran, carcaran jî tınazên xwe bı hêz û kesên ku bı karê çand û zımanê kurdî mijûl dıbûn dıkırın. Dıgotın ‘niha zıman ne girıng e. Emê pıştı şoreşê heqê zıman bıstının. Jı xwe zımanê kurdî ne zımanê zanîne ye û pêdiviya me dê 40 sal bı zımanê tırkî hebe’. Iro jî em berê xwe didınê, pıştı ewqas malwêranî, bı hezaran şehîd, gundên kavı-kırî û tı tışte dı dest da nemaye, jı bo berdewamıya sîyaseta şaş a ku lı ser xapandınê ava bûye, xwe dispêrine zımanê Kurdî. Ew jî bı awayekî qursên taybet.

Cardın em vegerın salên 70 î, pıştı ku hêz û rêxıstınên Kurd hatın damezrandın (hemî veşartı bûn) komeleyên parastın û pêşvabırına çanda kurdî jî pêra hatın avakırın. Jı vana, DDKO, DHKD, DDKD ên sereke bûn.

Kovarên wek Rîya Azadîyê, Tîrêj, Rızgarî hewl dan dest bı weşandına zımanê Kurdî kırın. Roja Welat ku carcaran hejmara wê dıgihîşt lı dora sîh- çıl hezarî nivî kurdî nivî tırkî bû. Dîsa dı vê demê da roman û helbestên kurdî ku dıhatın çapkırın xızmeta parastına zımanê Kurdî kırine. Dewleta tırk astengî derdixıstın pêş wan, da ku belav nebın dı nava gel da. Tê bîra mıñ dı dema destûr xwestına weşandınê ya ‘Roja Welat’ da dewletê jı berpırsıyarên rojnameyê ra gotıbûn Baş e, hûn çıma vê rojnameyê bı İngılızî, tırkî hetta vîetnamî naweşının, bo çı illa bı Kurdî?

Dewletê ‘girıngiya zıman’ jı gelean pırtır û çêtır dızanî. Daxwaza wan her berdewamıya sîyaseta asimilasyonê bû.

Jı alîyê partî û sîyaseten kurd va jî, dıbe ku şert û zirûfên wê demê pır zêde dest nedabın jî, wan karîbûn para ku vedıqetandın meqale û weşanên tırkî qet nebe nivî bı kurdî jî bıkırana. Bı raya mıñ çar faktor bûn asteng dı pêknehatına vê yekê da.

1- Bı hukmê zorê, zımanê kurdî hatıbû bendkırın.

2- Hêjmara nivîskarên ku bi kurdî binivîsanda gelek kêmbû. Ew bi tiliyan dihatin hejmartin.

3-Bandora neyîn a rêxistinên çep ên tirk bû. Gelek nîqaş li ser veqetînê, mafên çarenûsê, pîrsa neteweyî û hwd. bi zîmanê tirkî dibû. Referansên wê demê û klasîkên çep bi zîmanê tirkî bûn. Ji aliyekî dî va jî, gava li cîhekî deh Kurd hebûna lê tenê tirkê hebûya zîmanê axaftin û galgalê hema di cîh da dibû bi zîmanê tirkî.

4- Kêmbûna xwenasîna neteweyî bû. Belê rast e kesek ku xwe bixê merkeza hertîştî ew dibe egoîst. Mîlletek ku xwe bixê vî halî, xwe bixê navenda her tîştî, dibe şoven û nijadparêz. Hemî pîrs û pîrsgerêkên cîvakî yê li rûyê dinyayê me eleqedar dikin. Lê dîsa wê demê, bi qasî ku Kurdan dîroka şexsiyet û gelên bîyanî dizanîn ewqas girîngî nedidan çand û dîroka xwe. Istîsnayên vê yekê hene, lê nav bi xwe li serê ye, îstîsna ne !

Ev her çar faktor jî, ne ji ber gunehên Kurdan, lê ji ber sîyaseta nijadparêz a dewleta kolonyalist a tirk bû, ew bû asteng û pêşî li wan girt. Ji xwe sîyaseta etnosîdê bê encam nabe. Encam bi giranî û pîranî neyîn û negatîf e.

Nîha di roja îro da, sîyaseta di warê zîman da divê çawa be ? Berî rîzgarîya gel û welat ku bi guhertin û şoreşekê va girêdayî ye, berê ku zîman ji dest (dev) neçûye me divê em çî bikin? Sîyaseta ku di vî warî da hatîye kirin gelo qîm dîke, eger têrê nake çî guhertin çêbin di vî sîyaseta zîman da ? Gelek pîrsên dî jî dikarin bîn lê zêdekirin. Bi raya min ev yek dikare bibe mijarek bi serê xwe û dûr û dirêj li serê bê vekolîn.

Bi kurtî û wek gotina dawîyê:

Bi giştî rola zîmannasan ne ev e ku di vî warî da pêşniyaran bikin. Ew bes tenê li hal û rewşa zîmanan dinîhêrin, tespîtan dikin û wan pêşkêş eleqedaran yanê kesê ku di dest da hukm û derfet hene, pêşkêş wan dikin. Lê ji bo me Kurdan ev yek nabe; ji ber ku Kurd ne dewlet in û ne xwedî statuyekê ne. Parastin,

pêşvabırın û jî bo vê jî çêkirina proje û bernameyan dîkeve ser milê hemî kesên nivîskar, dersdar, zımanzan û zımannasên kurd.

Bî destûra we dîxwazim dî vî beşî da wek alternatîf lî hember sîyaseta etnosîdê çî bê kırım vebêjim.

Lî hember etnosîdê, û jî bo parastin û pêşvabırına zımanê kurdî :

1- Hewlê bîdîne derfet û îmkanan û navên ‘Kurd wek navê gel’, ‘Kurdî wek zımanê vî gelî’ û ‘Kurdistan wek navê welat’ lî her cîh û deverî bî kar bînin. Em baş bızanin ku ev her sê hêman temînatên hebûna me ne.

2- Navên gund, qeza-bajarok û bajar, deşt û çîyan, av û çeman, herçî navên coxrafî yên bî Kurdî ne, me dîvê wan bî kar bînin. Navên bî Kurdî lî zarûkên xwe deynin.

3- Daxwazên me her tım bî xwestina statuyeka sîyasî bêne parastin. Ew bêne ewlekirin. Dev jî daxwaza wekhevîyê lî rûberê çand û zımanên serdest neyê berdan. Em tı caran dijminahîya çand û zımanên wan nakin, wan piçûk nabînin, her zıman xwedî prensîban e û lî gora çand û şaristanîya xwe xwedî nîrxek e. Zıman hêlî û neynika şaristanîyê ye. Her çend ew şaristanî xurt û dewlemend be, zıman jî ewqas xurt e. Zımanê me jî alîyê wan va, eger jî yên wan dewlemendtir neyê qebûlkirin jî, jî wan ne kêmtir û ne qelstir e. Zımanê Kurdî xezîne û gencîneya jî 100 hezarî bêhtir bêje û peyvika ye. Em bes tenê statuyeka wekhev dîxwazim.

4-Bî rîya panel û konferansên lî ser zımanê Kurdî -çî lî hun-dîr çî lî dervayê welat-, daxwazên fermîkirina zımanê Kurdî dî destûra bingehîn da derxînin pêş.

5- Bênd daxwaz kırım: ku gelê Kurd bacê dîde û hebûnên sererd û bin-erdên wî jî bî ser da têne talankirin, dîvê zımanê Kurdî lî xwendegehan wek zımanê perwerdeyê bê xwendin jî dest-pêkê heta zanîngehan. Dewlet mecbûr e derfet û îmkanan çêke jî bo avakirina xwendegehan û gihêstandina dersdaran.

6- Weşana radyo- televîzyona bî zımanê kurdî bê daxwazkırın. Iro, lî Tırkîyê jî 300 î bêhtır radyo tv ên neteweyî û herêmi (a tırk) tenê bî zımanê tırkî weşanê dıkın. Ev xeter û talûkeyek e û neheqîyeka gelek mezin e lî hember zımanê Kurdî.

Divê Kurd jî bixebıtın da ku rojekê zûtır van dezgehên ragıhandınê saz bıkın. Tv yê Kurd dıkarın bî hêsanî lî ser satelîtên ku tı sınoran nas nakın, weşanê bıkın. Bî alıkarîya van weşanan hem çand û zıman têne parastın hem jî Dınya bî saya van weşanan Kurdan nas dıkın. Ew jî çapemenîya nivîskî dê bî tesırtır bı dı parastın û pêşvabırına çand û zımanê kurdî da.

7-Bıkaranîna zımanê kurdî dı warên, aborî, banqe, dadıgeh, postexane, û hwd. da derxının pêş. Em bî xwe jî hewl bıdın xwe, dı van sazî û avahîyan da bî Kurdî bıaxıvın. Cıvîn, kongre û cıvatan bî zımanê kurdî bî rê va bıbın.

8- Wek prensîp û bî bıyardarî kesên ku bî Kurdî hındık jî bızanın, em bî wan ra tenê bî zımanê Kurdî deng bıkın. Dıbe ku carek, du car baş tenegehın, cara sısêyan dê çetır fam bıkın. Em wan teşwîq bıkın. Gava ew bî Kurdî dıpeyívın şaşî û kêmasîyên wan wek serhevde lî rûyên wan nexın, alıkarê wan bıın. Baş bızanın ku dı vî warî da gılı û gazınd tı tıştêkî bî tena serê xwe çareser nake. Me divê weka çırayekê em dora xwe ronî bıkın, kesên bî Kurdî dızanın alıkarîya kesên ku hındık dızanın bıkın. Bı wan ra bî zımanekî rehet û hêsan xeber bıdın. Bılınd nefırın û zımanekî qaşo ‘akademîk’ jî bî herkesî ra qıse nekın.

9- Bı zarokên xwe ra lî nav malê û lî derva tenê bî zımanê Kurdî bıaxıfın. Jı bîra nekın ku herkesekî bıtemen û bıemr gava jı dınyayê koç dıke dıçe, zımanê xwe jî tevî xwe dıbe gorê. Eger zarokên ku lı pey xwe dıhêlın ew bî Kurdî nezanın, ev zıman pıştı çend nıfşan, qels dıbe û dımıre. Divê em van dê û bavên ku bı zarokên xwe ra Kurdî napeyívın, wan jî wek zımanekuj bı nav bıkın. Eger naxwazın bıbın qatılê zar û zımanê bı hezaran salan, wan divê bî Kurdî qıse bıkın. Ne xwe, jı bo xapandın û teselîyê, ku zarokan bı seetek an du seetan (dı heftekê da) bışının komeleyan ev têrê nake, zarokek bı vî awayî zıman fêr nabe.

Bila kes xwe nexapîne, berpîrsîyar berî her tîştî dê û bav in. Fêrbûna zımanekî ne tenê axaftin e jî. Dîvê xwendin û nivîsandin jî pêra hebe. Ne xwe, ew zıman têrê nake, pêşda naçe.

10- Dî warê zaravayan da ; bî zorê û bî sîyaseta jakobenî ew nabîn yek. Eger rojek ew yek bin jî ewê dî demeka pîr dîr û dirêj da be. Bila her zarava dî cûya xwe ya xwezayî da pêşkeve û geş bibe. Ew dewlemendîyên me ne. Bî qasî ku em hewl didine xwe jî bo hewisîna zımanê Ingilîzî, Fransîzî, em nivê wê dema xwe veqetînin jî bo fêrbûna zaravayekî dî- ku nêzîkê hev in û jî rehekê tîn- emê bî hêsanî wî hîn bîbîn.

11- Dî warê nivîskî da; pêdîvîya me bî rojnameyeka rojane heye. Ew du rûpel be jî, lê her roj derkeve, dê alîkarîyeka mezî jî xwendina Kurdî ra bike. Bî saya wê, hejmara xwendevanên Kurdî (ku mixabîn niha lî dora hezarî ye, ev hejmar jî bo parçeya Bakur e) dê zêdetir be. Dîvê zımanê wê hêsan be. Nivîskarên Kurd xwe jî enterfêransan dîr bixînin. –Enterfêrans: Veguestin û neqilkirîna form û ramanan jî zımanekî dî- Rîste-hevok û raman bî Kurdî be. Wek nîmûne ; dî şûna "mîn trênan revand" da, were gotin "ez negihîştîm trênan" Yanê em bî tirkî nefîkîrînin û heman tîştî wernegerînin zımanê xwe. Enterfêranseka dî jî heye (a sentaksê): dî şûna ku em binivîsîn "bî Eskerê Boyîk ra hevpeyvîn" em wîha binivîsîn "hevpeyvîn bî Eskerê Boyîk ra", dî şûna ku binivîsîn "lî Kurdîstana Bakur û lî Tirkîyê rojnamegerîya Kurdî" binivîsîn "Rojnamegerîya Kurdî lî Kurdîstana Bakur û Tirkîyê" hwd.

12- Dîvê kar û xebatên dî warê ferheng û gramera Kurdî da, lê xurttir bînin. Ferhengeka Kurdî-Kurdî pêwîstîyek e mezî e. Xebatên dî wî beşî da bigihînin hevûdu. Ev kar ne karê kesekî tenê ye, lê karê komîsyonan e.

13- Pîrsên termînolojîya gramera Kurdî lî pêş me dîsekîne. Jî alîyekî dî va jî, pêwîstî bî rêzîmana normatîf (şaşî û kêmasîyan rave bike) û rêzîmana kompare (rûberû dîke, berawîrd dîke) heye. Niha wek rêzîmanên sereke ya C. Bedîrxan, Q. Kurdo, R. Kurd,

K. Badîllî hene. Pîranîya nivîskarên jî Kurdîstana Bakur rêzîmana Celadet Bedîrxan bî kar tînin. Dîxwazim bî dîlnîzmî bêjîm ku ev rêzîman ne zêde pedagojîk e. Mîrov dîkare dî gelek beşan da tevlêhevîyên ku hene nişan bîde. Ev gramer heta niha kêmezêde rola xwe leyîztîye. Lê jî ber ku zîman bî xwe zîndî û jîndar e, kar û xebatên dî vî warî da bî wêrekî, û bê tabû, jî nû da bêne kîrîn. Ev kar jî ne bî kesekî (ê) tenê, lê bî komîsyonan va pêk were ku tê da bî rastî jî lînguîst û pedagojîk cîh bigîrîn.

Pêdivîya me bî standarbûna Kurmancî jî heye. Pîrsgrêkên rastnîvîsîn û gramerê, pîrsên tewandîne, pîrsên termînolojîya rêzîmanî û hwd. rojekê zûtir bêne çareserkîrîn. Bî konferansekê jî lî ser pîrsên hêsankîrîna alfabeyê xebat bê kîrîn. Wek mînak nuxteya lî ser "î"yê bê avêtin, ew bibe "î". Em dîkarî "î"yê neguherîn. Jî ber ku lî ser "î"yê nuxte jî, nîçîk jî, kumîk jî, her çî jî hebe, ew nabe asteng dî xwendîne da. Bî raya mîn, tenê xwendî û nivîsana tîpekê zor e, ew jî "î" ya bînuxtîk e û weka "î" tê xwendî. Tîştêkî balkêş e, ev dengê "î" ne tenê wek grafem her weka deng jî dî zîmanên koma me Farîsî û Fransîzî da tune. Ev deng dî zîmanê Erebbî da heye, lê dî alfabeya aramî da nayê nivîsîn (ku îro Erebbî bî kar tînin.) Ev dengê "î" dî zîmanê Rûsî da heye, wek tîp jî dî alfabeya kîrîl da tê nivîsîn (cuda jî alfabeya latînî.) Ev deng û tîp dî zîmanê Tîrkî da heye, her çîqas ev zîman ne dî koma me da be jî. Çawa ku "Ş" û tîpen dî weka hev in, nîşankîrîna bî awayê "î" xwendîne hêsantîr dîke.

Dr. Celadet Celîkel lî ser vê meselê pîrtûkek jî nivîsî lê tî derman nekîr ! Hezar heyf û mîxabîn ku mîna pîrî caran dî vê meselê da jî 'Pîranî betal dîke mêranî'. Hîs û hest dîkevî şûna hîş û aqîl.

Wek rexne û dî eynî wextê da jî hêvî û rîcayekê dî jî, dîxwazim lî vê derê bêjîm : Dîvê nivîskar û sîyasetmedarên Kurd bî zîmanên serdest (mesela bî tîrkî) çîrok û helbestan nenîvîsîn. Ne erk û wezîfeyê wan e ku çanda wan dewlemendîr bîkîn. Bîla were bîra wan, ku jî bo vê yekê bî hezaran nivîskar, profesor, xwendegêh, sazî, gelek caran jî lî ser dijîmînahîya zîmanê me vî karî dîkî û pêdivîya wan bî me qet tune ye. Ev yeka hanê



tenê bî şertekî dibe, ew jî eger zımanê bîndest (Kurdî) bî rastî jî  
bibe azad û serbest ! Ev helwest ne dijminahîya zıman û çandan  
e. Eger werger berhemên bî Kurdî bızivîrînin ser zımanê tirkî,  
ev dikare bibe û tîşteki baş e jî. Lê nivîskarê Kurd çî dibe bîla  
bibe divê bî Kurdî bînivîse, ev jî helwestek e lî hember kolon-  
yalîzma dewletên dagîrker û sîyaseta wan a jenosîd û etnosîdê !

Her çiqas bî dehan salan e, ku zext û fişar û çewsandin lî ser  
zımanê Kurdî berdewam be jî, wî berxwedaye û gihîştîye roja  
îro. Ew pîr qedîm û xurt e. Me divê em lê xwedîtîyê bîkin. Em tî  
caran jî bîra nekî ku Ew temînata hebûna me ye !

Ew,

Xuşexuşa çilkanîyan

Deng û coşa Feqî û Xanîyan

Nîsilî hat j' dewr û deman

Zar û zımanê bav û kalan.


Dî dawîya gotara xwe da, careka dî, we beşdarên rêzber û  
bîraderên amadekar sîlav dikim. Bî hêvîya Zımanekî serbest û  
Welatekî azad !

## Psîkolojî û Ziman

### Bandora psîkolojî ziman li ser civakê

Dr. Ilhan Kizilhan


*Ziman bi dengdayên xwe, rêziman, syntax û bi hemî nefsiya xwe, rihê xwe, ku di nav ziman de cihê xwe girtiye, diyar dike ku mirov çawa bi kîjan gotinê hîs, nefret, bi dil û derd dibe.....*



Ev nivîsa jorîn di **Konferensa Li Ser Ziman** di meha Tîrmehê 2002 li bajarê Köln ku ji aliyê Komkar hatibû amedekirin, hatiye pêşkeşkirin.

Di axaftina xwe de ya rojane de mirov kêr li ser wateya ziman, bi karanînan bêjeyan, hevokan, dangan û hwd. difikire. Zimanê me yê organîk wek ji ber xwe ve destpêdike û diaxife. Lê inixabin, afrandin û struktura ziman ne wiha hesan e. elementên biyolojî, civakî, neurology û psîkolojî bi hev re ev zimanê ku em dixafîn gengaze dike. Heta mirov bêjeyekê derdixe, bi hezaran hucren organîk û neurology di nav hinek mîkrosaniyan kar dikin û wiha mirov bêjeyekê dibêje. Ku yek element kêr be, an jî baş kar neke, asteng di axaftina ziman de derdikeve.

Di we nivîsandinê de em dixwazin bi taybetî li ser pêwendiyên ziman û psîkolojî birawestin. Herdu, ziman û psîkolojî bi hev re tîn wateya psîkolingûstîk. Lê pêşî em li ser ziman bira-



westin: Di grafîka jêrin de tê diyarkirin ku ziman ji gelek babetan digihîje hev û wiha ziman dibe xwedî şikil û formeke efsûnî, daku mirov ji mirov fêr bike.

## Destpêka Axaftinê

Ferbûna ziman beriya ku zarok were dinyayê destpêdike. Di zikê dayika xwe de guhdariya axaftin û dengan dike. Hinek hefteyên piştî ku zarok tê dinyayê, destpêdike bi girî herz û xwestinê xwe tîne ziman. Herwiha ragihandinek di nav dayik û zarok beriya axaftinê çêdibe. Dayik û zarok pir dengan di navbera hev de dikin, ku mirov bawer dike ev bi hev re diaxifin.

Ragihandina sembolîk ya yekemin piştî 6 mehan destpêdike. Ev bi girî, an jî bi livbasiyan wek livandin xwestinê xwe diyar dike. Bi wê ragihandina sembolîk bi karanîn ziman wek aletekî dike. Ku zarokê picûk bixwaze were hemezkirin, ev destê xwe dirêj dike; ku mezin dikenin, ev zarok jî destpêdike û dikene, wiha bala mezinan dikşîne ser xwe û dibe perceyekî ragihandina kolektîf. Li aliyê din jî, leyistikekê dide destê mezinan û wiha dixwaze pê re were leyistandin. Ev jî azîneyeke ragihandinê ye.

Bi tekrîbên 9 mehan zarok destpêdikin û dikin qêrîn, daku tiştêkî bi zanebûn bistînin. Ku dîtînen awirên xwe li ser tiştêkî konzentre kiribe, ev destê xwe nişanî we hedefê dike. Ku hedef ne li ber çavan be, dive mirovên mezin bixwe derxînin ku zarok çî dixwaze. Ku mirov tiştêkî xelet diyarî wî bike, ev dengê qêrîna xwe bilindtir dike. Piştî hinek mehan zarok ji bo tiştêkî bi sembolîk diaxifin. Minak: Ku zarok bicî be, dibêje **namnam**, an jî **hamham**, hwd. Namnam wiha dibê cihgirê“Ez bircî me û xwarinê dixwazim.“ Dayik, an jî bav têdigihîjin û xwestina zarok bi ich tînin.

Ku zarokê picûk muzikê bixwaze, dest xwe li hev dixwe, diçe cem teyb an jî kastekî tîne. Ku bixwaze here derva, diçe pêlav an jî caketê xwe tîne. Piştî gihiştina we derece zarok dereceya heywanan derbas dikin, ji ber ku xwestin û hedefên bi hizrandinê, fikir û fêm dike. Ev destpêka ragihandîneke aktif ya zarokan e. herwiha di gelek lêkolînan de hatiye diyarkirin, ku ragihandina pasîf demeke dirêj beriya axaftina aktif destpêdike.

Piştî salekê zarok pirsan jî têdigihije. Ku mirov ji zarokên picûk bipirse "Ka ye çavê te?" Ev bi destê xwe diyarî çavê xwe dike, û hwd.

Wan reaksiyonan mirov dikare li gel heywanan jî temaşe bike. Lê zarokên picûk bê ders û xelatên, bi xwe fer dibin. Heywan heta dereceke bi xelatên wek xwarîne û dersên taybetî ferî wan reaksiyonan dibin.

Beriya ku zarokên picûk ferî bêjeyan dibin, ev dest bi axaftinê dikin. Car caran jî wek mezinan devê xwe dibe û tîne, dixwaze wek mezinan dengan derxîne. Beriya ku bi axaftinê zarok dibe xwedî gelek bêjeyan, wan fem dike, li nikare bibêje. Minak: Ku mirov bibêje hesp, ev diyarî hespê dike û dibêje hîhî, nabêje hesp.

### **Struktura ferbûna ziman li gel zarokan**

- Hiraşî û sazûmaniya hevokan heye.
- Struktura kur û serrû heye. Struktura kur li ser wateyê diraweste. Herdu struktur bi şertên transformasyonê digihîşin hev.
- Ziman dikare bê dawî hevokan biguhurîne û dikare herdem hevokên nû biafrîne.
- Daku zarok dikaribin ferî zimanekî bibin, divê wateya ziman ferbibin. Peşî struktur, rêziman, ne pewist e. (Di nav civaka kurdan hejmara kurdan ku rêziman kurdî dizanin gelek kê. Hejmareke mezin nikarin binivîsînin an jî bixwunin, lê dîsa jî ev rast diaxifin û dizanîna kîjan hevok û bêje rast in.)

Ev hinek minakê jorê diyar dikin ku prensîpêkî giring heye:

Zarok ne tenê ferî axaftinê, bêjeyan û gotinan dibin; ev herwiha fêr dibe ku her bêjeyek xwedî livandin (hareket) û wateyan e. Ev hemû jî prensîpên zimannasî ya linguistik in

Di pir civakan bawerdikin, ku zarok bêjeyên pêşî "da", "dayê", an jî "ba", "jabo" bi kar tînin. Ev baweriyê ne rast e. Ev gotin

perçeyekî dengdayên zarokan in. Tê bawerkirin, ku gava dayik an jî bav wan gotinan guhdar dikin, bawerîn zarok navê wan dibêje, wiha ev zarok kefxweş dibin û zarok motîfe dikin daku dîsa bibêje.

Pîştî wan gavan zarok destpêdikin û bêjeyan kombîne dikin û wiha hevokan diafrînin. Ev dem dema têgihîştina cihanê ye.

### **Di têgihîştina dinyayê de ziman ristekî mezin dileyize.**

#### **Têgihîştina dinyayê:**

· Zarok bi kurtkirina bêjeyan û kopykirina zimanê mezinan fer dibin.

· Kurtkirina bêjeyan bi zanebûn tê kirin, ev metodeke taybetî ye ku bi her zarokê re, ji dayikbûnê ve, heye.

· Zarok di wan salan pêşi zêde dixwazin naveroka bêjeyan fêhm bikin. Minak: "Dayê, em herin male."

· Mezin jî, bêjeyan zarokan rast dikin, heta wan bêjeyan rast ferbibin.

· Ziman çiqas ji hev cuda bin ji, dixwazin wateya pêwendî û têgihîştin were amedekirin.


· Beriya rêziman, zarok stratejiyên tegihîştin û wateye bi kar tînin.

· Di destpêkê de zarok ji aliyê mejû xwedî kapazîteyek mezinin û zû enformasyonan digirin.

#### **Teoriya Pêşvebirina Ziman**

Zarok herdem di nav civakekê tê dinyayê û herwiha jî, bi zimanekî taybetî jî, tê dinyayê. Ev ferî zimanekî civakekê dibe ku bi pir dijarî û xwedî serpêhatinan, çand û dîrok e. her roj, bi mezinbûna xwe xezîneke taybet û şexsî ji xwe re ava dike. Ev zarok ferî dengdayinê dibe, ferî wateyê bêjeyan û hevokan dibe. Bêjeyan li goriya rêziman dide ber hev û dike hevokan ku

her endamê wê civakê têdighîje. Derfeta ku ji xwezayî daye mirovan, daku dikaribe hevokan biafrîne, mirov jê re dibêje **xwedî bingeha linguistik**. Daku zarok dikaribe bi mirovên din



re biaxife, ev fer dibe di kîjan demê de û di kîjan rewşê de bi kîjan bêjeyan bi kar bîne. Zarok fer dibin ku di kîjan bûyeran û tiştan bi pir rewşên cure bi cure bi ziman binîrxîne.

Bi **têoriya bingeha ferbûna ziman û têoriya pêşvebirina ziman** mirovderxistin û guhartina ragihandin ziman dinirxîne. Bê guman mirov nikare bibêje ku têriyeke ziman heyye ku her babet û taybetên ziman dirxîne. Di têoriya ziman de pir dîtin li ber hev, ne dijî hev radiwestin û ji pir aliyan we dixwazin bingeha pêşvebirina ziman pêşkeş bikin.

### **Têoriyên Ferbûnê**

Di têoriyên fêrbûnê de dixwazin diyar bikin ku mirov ziman ji hev dikare fer bibe. Ango zarok ji mirovên mezin fêrî ziman dibe. Skinner di sala 1957'an de bdi pirtûka xwe de ya „Verbal Behavior“ dixwest ispat bike ku ziman wek livandineke ye. Çawa mirov li goriya dayik û bavê xwe destê xwe bilind dike, an jî nan dixwe, ev wiha jî ferî ziman dibe. Bêguman rast e ku mirov pir tiştan ji dayik û bavê xwe, an jî ji mirovên dinê fer dibe, pir tiştan kopî dike, lê pir tişt mirov bê kopî jî dizan e. di rexneke mezin de Chomsky (1959) dijî têoriya Skinner derdikeve.

Ku îro mirov li ser Noam Chomsky nûceyan dibihîse bi gelemperî li ser raman û rexna polîtîka Amerîkayê ye. Hinek jî dibêjin, ku li Dewletên Yekîtiya Amerîka tenê yek oposîsyon heye: Ev jî Chomsky ye. Lê Chomsky bixwe Profesorê psikolînguistik e, angu li ser afirandina ziman diraweste. Cara yekemîn Chomsky di salên 50' de têoriya afirandina ziman a gerdunî diafirîn e.

Chomsky bawerdike ku "gelek zarava û ziman ku gelek dût ji hev xuyane, ev ziman û zarava jî hev fêr nakin, lê dîsa jî aliyê rêziman, hinek şertan û strukturan nêzîkî hev in. Ev struktur billî hemû guhartinên dîrokî û bûyeran nayên guhartin". (Chomsky, 1973)



## **Dîtînên Chomsky ji sala 1965 an heta 1986 li ser ziman**

• Zarok bi çêbûna xwe ve xwedî rêzimanekî gerdûnî/universal e. Ev struktur babeteki biyoloji bi her zarokêkî re ye.

• 1. Language Acquisition Device (LAD): Mekanismeke Ferbûna Ziman. Ev LAD derfet dide ku mirov têtên (hypothesen) çêbike.

• 2. Mekanismeke biryar dayin: Kijan rast e, kijan ne rast e.

• 3. Mekanismên gelemperî, gerdûnî.

• Bi wan 3 faktorên zarok guhdarî zimanê mezin dike û li gorîya vê struktur û rêziman di hinek salan de fer dibe.

Wek di grafîka jorîn de tê diyarkirin gelek têtên li ser ziman hene. Mirov nikare bibêje dîtinek rast e, an jî xelet e. Ez di vê baweriyê de me ku her têtên jî pêşvebirina ziman kedeke baş kirine û divê li ser wan bingehan têtoryên li ser ziman bi ilmî yê nû were rawestandî.

## **Pêşî hinek gotin li ser rewşa welatê kurdan û ziman**

*Rih çiyê?*

*Ji kuderê hat?*

*Diyare ku ê min e, û dîsa jî*

*Xwe-Hiskirina min an jî nasnameya min tune*

John Kates, 1819

John Kates di sala 1818 û 1819'an de du caran dixwest helbest li ser Hyperion binivîsîne û her du caran dest jê berda. Bi minakekê li ser Xwedayê TITAN dixwest têtîhiştina NASNAME ya civakî û ya şexsî şirove bike. Lê nivîskarekî mezin wek Kates ket nav gelek aloziyên felzefîk û bi zanebûn ev nivîsa xwe rawestand.

Mesela Kurdan û nasnameyan wan jî tijî alozî, asteng u pîrs-girêkan e. Bi hemû babetan dagirkerên li ser welatê kurdan şerekî

eşkere û veşartî dijî wî gelî dike. Hevqas teror, zilm û zordarî pêkaniyê ku ji xeyina axaftina zimanê kurdî, ji ber sedemên hingavtin, teror, tirs, derd û kederan **mirov bê ziman bûye**.

Ji sedsalan ve li heremên Kurdan şerekî veşartî û eşkere dimeşe. Ji yana gelê Kurd herdem di nav xwînê, mirinê û qirkirin de derbas kiriye. Ev bûyer bandoreke mezin li ser hestir, dil û zimanê Kurdan kir. Îro jî em di stran û nivîsên Kurdan u kar û barên rêxistinên Kurdan de dibînin. **Teror mirov dikare bê ziman bike**. Êş, zilm û zor hevqas dijwar e ku ziman têr nake, wan dilînên me bîne ziman. Mirov di hundirê xwe de tije dibe û dikare wiha bibe xwedî gelek nexweşiyên. Ev jî bandoreke mezin dide li ser pêwendiyên zarok û malbatê. Axaftineke raste rast, li ser her babetan çênabe. Ev jî dikare astengên mezin ji bo pêşvebirina zarokan derxîne. Mejû wiha nikare bi rihetî vebe û hucreyên nû bi hev re girêde, daku mirov bibe xwedî kapazîteke mezin.

Ez herwiha jî bawerim ku lewra jî rêxistinên Kurdan jî di gelek stratejiyên xwe de rasyonel analîz nakin. Di gelek daxuyanîyên wan de parekî mezin tijê propaganda û xwe-parastinê. Heta babetekê an jî pirsgirêkê şirove dikin "ji Adam û Hewa" destpêdikin. Analîzkirina edebiyata Kurdî ya nivîs û devkî jî gelek balkeş e, lê divê di cihekî dinê de were nivîsandin.

Ji ber sedemên dagirkeriya Kurdistanê ragihandina di nav Kurdan de pêşneketibû. Heta hinek gundên uk 30 heta 40 kilometre ji hev dûrbûn, baş hev nasnedikirin. Li gundan jî mirov bi şerê bircîbûnê hevqas meşgul bû ku dem tunebû li ser pirsên nefsi, ruhî birawestin. Em lewra jî wan fenomênan li dervayî welat jî dibînin. Li goriya lêkolîneke me di sala 1998'an de ji bo wezeretiya hundurî, tê diyarkirin, ku ciwanên Kurd her roj tenê 10 deqîkan bi dayik û bavên xwe re diaxifin. Axaftina ciwanan bi malbata wan li ser diravan, pirsên dibistanê û tenduristiya wan e. malbat ji wan zarokan li ser pirsên wan yê ruhî nizanin bipirsin. Lewra jî ev ciwan diçin cihên ciwanan û bê

xwedî, dawî tiştên xirab dikin. Ev dixwazin li ser derdên xwe biaxifin, alle tukes tune ku wan guhdar bikin.

Bandorên terorê li ser ziman xwe gihandiye Ewropa jî. Înkarkirina Kurdan il Ewropa jî domdike û di gelek rojnameyan û televiziyan de gelek negatîf li ser Kurdan tê axaftin. Lewra jî gelek zarokên Kurdan û malbatên xwe eşkere xwe Kurd diyar nakin. Ev înkarkirin jî, zarokan dike nav nangokiyên mezin: êdî ziman û nasname veşartî tî jiyandin. Ev zarok ji xwe dipirse: "Ez Kurd im, an jî Alman im, belkû Tirk im?", "Navê min jê Tirkan ne, le es kî me, ji kuderê me?" Wiha gelek pirsan bê bersîv dike û ev zarok dikare têkeve nav aloziyên civakî û şexsî.

Bandora terorê ne tenê li welatê Kurdan dom dike, ev herwiha bi şerê psikolojî li dervayî welat jî dom dike. Ev alozî di nav Kurdan ne nû ye. Ji sedsalan, nesîl li ser nesîl, bav pişt bav wan bandorên psikolojî li gel xwe kom dikin û didin nesîlên dinê. Wiha mirov dikare bibêje ku ev "nexweşiyên psikolojî" jî bûne percekî jiyana her kurdekî. Ev pirsgerêk wê di pêşerojê de jî me pir meşgul bike.

### **Ziman û civak**

*Ez çûme*

*Ji ber zingên xwe: Min xwe*

*Nasnameya xwe ya bi hêz, min rastiya xwe*

*Berda, li cihekî di nav Navê-Xwe û cihê ku ez niha runiştî me*

*Li ser vê percekî wê erdê.*

John Keats, 1818

Ku Mirov medya Kurdan di wan dawiyêde binîrxîne, tişteke balakeş e. herkes li ser girîngtiya zimanê Kurdî û projên civakî diaxife, dinivîsîne û guftûgoyan li ser dike. Bê guman ev tişteki girîng û pêwist e, lê dîsa jî, divê were pirskirin, ma gelo ji mêj ve li ser wê xala girîng ne dihat axaftin, an jî, ne dihat nivîsandin? Car caran jî, ji min re wiha tê diyarkirin, ku hinek rexistin

û siyasetmedarên Kurdan di karên xwe de, yê siyasî û ramanî de dikevin astengiyên, herwiha ji cekmecên xwe de "xala zimanê Kurdî" derdixin û gel demekê pê meşgul dikin. Diruşmên wek "bi zimanê Kurdî biaxifin, binivîsinin û bifikirin" pir caran derketiye ser rojevê û dîsa winda dibe.

Ez dixwazim di vê nivîsê de zêde li ser ziman bi aliyê psîkolojî û civakî birawestim.

Guftûgoyek il ser alfabe, amedekirin û afrinandina saziyan ji bo pêşvebirina zimanê Kurdî, an jî konseptên perwerdekirinê ne hewceye were axaftin. Ev erk û delametên netewî û civakî ne. Lê heta em bigihîjin we merhelê, pir karên bingehî û belkî ya herî giring têgihîstin û bawerî hewceye, ku bê axaftin û pêşvebirina ziman di nav civakê de, emê dîroka xwe ya kolektîf û wiha jî, civaka xwe ya kolektîf di pêşerojê de seket û bi pir birînên xeder bihêlin. Mejûyên kolektîf, ango hemû tiştên di dîroka Kurdan de derbasbûne û êdî di nav civaka Kurdan di nav gel de wiha dijî. Lê ku em di demeke teknîk ya medya zimanê Kurdî neparêzin, emê di demeke kin çîrok, metelok, mitolojî, dîrok, raman ji bîr bikin, an jî, bi zimanekî din fer bibin. Ji xwe jî, pir Kurd li ser dîrok û ramana xwe bi zimanekî biyanî dixwînin. Lewra jî îro em

Himberî teşqeleyeke mezin in, têkçûna zimanê zikmakî, têkçûna civakî an jî, deformasyona wê ye.

Zimanê gel, komek an jî netewek çiqas dewlemend û peşketî be jî, ku ne bijî, nikarê ji bo pêşerojê bibe zimanê zarokan, ango nesîlên nû. Ziman divê bijî, ango di her xala jiyana Kurdan de, divê ziman bibe bingeha ragihandinê û pêwendiyê. Ku bi Kurdî em bi hev re li ser raman, çand, civak, aborî û hwd. neaxifin, qise nekin, ne şitexlin, xeber nedin, şor nekin, ku em kul û derdên xwe, xwewnên xwe bi hev re par nekin, ziman nikare bijî. Tenê ku hinek rewşenbîr, nivîskar, komeke piçûk bi zimanê Kurdî biaxife, ev têr nake. Di dîrokê de tê zanîn ku demeke dirêj zimanê Latînî li Ewropa zimanê bingehî yê zanistî, aborî,

çandî û hunermendî bû. Lê îro ne civakek an jî, gel bi wî zimanî diaxife. Lewra jî, ji zimanê Latînî re îro dibêjin, zimanê mirî. Herwiha piştî dagirkeriya Ewropa li Afrikaya mezin bi hezaran zimanên civakî û eşîrtî windabûne. Ev li rojhilata navîn de jî, tişteki ne nû ye. Ev ziman bûne parçeyekî dîrokê.

Îro ku civaka Kurd bi hemû sazî, rêxistin û komelên xwe bi rastî bixwazin dîsa wegerin ser zimanê xwe, divêt ev di karmendî û teorî de bernamêyên xwe biguherînin. Bi taybetî mirovên nas, ango serokên rexistinan, siyasetmedar, hunermend, nivîskar, û hwd. divên gavên pêşî biavêjin û bi fermî bi zimanê Kurdî biaxifin. Minak ji bo gel û taybetî zarok û ciwanan pir giring e. Lê bêguman ev komên elît divên ne ji bo bangeşiyê bi Kurdi biaxifin, ev divên bixwe bi zimanê zikmakî bijîn.

Her mirovekî xwedi perpirsyar ji bo pêşerojê bila li ser wê pirsê biraweste: Kurdên li derveyî welat, Kurdên bakûr, başûr, rojava û rojhilat wê piştî bîst salên dinê ma gelo karibin bi zimanê Kurdî bi hev re biaxifin? Ciwanekî Kurd li Almanya wê karibe bi ciwanekî Kurd li Swêd an jî li Fransa bi Kurdî biaxife? Pirsên wiha em dikarin bê dawî pirsbikin, lê di bersîvan de em hemû zehmetiyê dikşînin.

Daku were têgihîştin ku zimanê zikmakî ji bo civakekê çiqas giring e, ezê hinek xalan pêşkeş bikim.

### **Giringiya têgihîştina zimanê zikmakî ji bo civakekê**

- Ziman di pêşveçûna nasnameyê de (kîmlîk) rista herî mezin dileyize. Ziman dibe bingeha nasnameya zarokekî û şexsetiya wî.

- Bi zimanê zikmakî, yê dayikî zarok fer dibe ku jiyana xwe û cihanê nasbike û têbigihîje.

- Ziman rê diyarî zarokekî dike, daku karibe li ser piên xwe di pêşerojê de biraweste.

- Zarok tenê bi zimanê zikmakî, ne ferî tiştan dibe, ew herwiha dikare binîrxîne û biafrîne.

- Zarok wiha bi zimanê xwe dikare bi mirovên din re têkeve nav ragihandin û pêwendiyên.

- Xaleke girin di ferbûn û girintiya zimanê Kurdî nasname ye. Bi zimanê zikmakî mirov şekil û forma dide nasnameya xwe û wiha ew risteke giring di girêdaya niştiman de dileyize. Çiqas mirovek zimanê xwe dizanîbe, herwiha girêdaya wî bi niştimana wî re, girêdaya wî bi axa wî re heye. Ev taybetî ji bo mirovên ku rojeke bixwazin wegerin welatê xwe pir pêwîst e. herwiha ew jî, ji bo jiyana diyaspora xaleke giring e. zarokê ku bi zimanê zikmakî dizanîbe, dikare hesantir here welatê xwe û rewşa welatê xwe bizanîbe.

Herwiha zarok bi zimanê bav û kalan dibe endamê civakê û civaka xwe bi serbilindî, şahî û şerefeke mezin dinîrxîne û lê xwedî derdikeve. Yek ji sedemên ku car caran pir ciwan li nasnameyan xwe xwedî dernakevin, di nasnameyeke negatîf de tê diyarkirin.

Nasname ji bo parastina dîroka şexsî û koma wî risteke mezin dileyize. Ev jî hinek girêdaya ziman e.

### **Ziman miraz û xezîna civakê ye**

- Herwiha zimanê zikmakî mîraz û xezîna civakê ye. Ev hemû jiyana dîrokî ya kolektîf, çanda û mejûyê kolektîf diparêze û dide nesîlên nû. Bîrbûna civakî ya dîrokî bi zimanê zikmakî tê parastin. Dîroka her mirovekî ya şexsî û netewî perçeyekî jiyana wî ya pêşerojê ye jî.

- Dîrokeke kolektîf ya rast û bingeşî bi zimanê we tê nasînin. Bi zimanê zikmakî zarokê di nav civaka xwe de tê pejirandin, çand û dîroka kolektîf fer dibe û wê mîrazê di pêşerojê de dide zarokên xwe.

• Zarokek ku zimanê dayika xwe di zarokaniya xwe de fer nebe, di pêşerojê ew pir astengiyan dibîne, ew ji aliyê civaka xwe û civakên din jî belkî her dem biyanî dimîne. Mirovekî ku nikaribe rast û bi babeteke têgihîştî bi zimanê xwe biaxife, ewê herdem kêmayek di xwe bibîne. Ewê taybetî kêmayên mezin di pêwendiyên şexsî û civakî de bibîne. Lewra jî, axaftina zimanê zikmakî bingeheke herî mezin e jî bo tenderûstiya civakekê.

• Zimanê zikmakî tezgeheke ragihandin û têgihîştinê di nav malbat û civakê de ye. Ku mirov ji dilê xwe, hesan û rihet nikaribe her fikirên xwe bîne ziman, wê demê ji aliyê rih û psikolojiyê pir pirsgerêk dikarin derkevin.

Ev xalên jorîn bêgûman jî bo jiyana diyaspora, jiyana der-vayî welat xaleke giring e. zarokekî ku bi zimanê zikmakî dizanibe, dikare hesantir here welatê xwe û rewşa welatê xwe bizanibe û jiyana li der-vayî zelal dike. Pêwendî welat jî bo wan zarokan, ciwanan û mezinan mirov jî aliyê nasnamê û psikolojîya şexsî têr dike.

Ev mînak belkî diyar dikin ku zanebûna zimanê zikmakî çiqas giring e. bi taybetî jî, min ev mînak li ser zarokan da, daku zimanê zikmakî divê ji piçûkayi ve fer bibe û ew zarok jî, bê guman dibin mîrazperest û mîsagoriya (garanti) civak û netewekê.

Ji ber ku îro saziyên netewî, yê ku ne girêdayî ramaneke partiyê ne, pir kêm in, dîsa ew berpirsyarî dikeve li ser piştê partî û rêxistinên Kurdan. Lê partiyên Kurdan jî, divên baş têbigihîjin, ku jiyana wan jî girêdayî zimanê Kurdî ye. Ku rojekê tu kes bi zimanê Kurdî neaxife, ew partî jî, pêwistî û giringtiya xwe wînda dikin, daku dîrokeke kolektîf ya Kurdan weran dibe, lewra jî, ew jî mîsyona têkoşîna rizgariya netewî de îflas dikin.

Bi gelemperî em dikarin bibêjin ku, kurdiyeke rast an jî xelet tune. Axaftin bi zimanê Kurdî bi her awahî rast e. alfabe ya Kurdî bi erebî, kirilî an jî latinî hemû rast in, tenê divê were nivîsandin û perwerdekirin. Soranî, Kurmancî, Dimilkî, Goranî an jî Feylî wekhevin. Bingehe: axaftina zimanê zikmakî ye.

Mesela zimanê Kurdi îro ne tenê meseleke zimanekî ye an jî, guftûgoeyeke têorî ye. Hebûn û tunebûna zimanê Kurdî hebûn û tunebûna hemû nîrxên Kurdan yê kolektîf e. Welatê Kurdan hatiye perçekirin, lê ku em nexwazin ku giyan, rih û nîrxên Kurdan were perçekirin, idve em li ser zimanê Kurdi birawestînin. Divê bi zimanekî were axaftin daku ev zian bijî.

Mînak em ji Kurdên başûr, Kurdên Ermenistan an jî Ezidiyan bigirin, li gel wan kî bi zimanê zikmakî nizanîbe şerm e. axaftina zimanê zikmakî şeref e, rûmet e, welatparêziya bingehî ye.

Rewş û pêşvebirina zimanê Kurdî neynika pêşvebirina civakêye. Rewşa rawestî wek kevîrek mezin û giran em hildin û bikin ku kevîr jî êdî bireqsîn.

### **Literatûr:**

N. Chomsky, Sprache und Geist, Ffm 1973

J.J. Katz, Philosophie der Sprache, Ffm 1969

N. Chomsky, Sprache und Geist, Ffm 1973

N. Chomsky, Reflexionen über die Sprache, Ffm 1977

N. Chomsky, Sprache und Geist, Ffm 1973

W.M. Borowski: Einführung in die vergleichende Psychologie, Moskau 1927

B.L. Whorf, Sprache, Denken, Wirklichkeit, Reinbek 1963

Kizilhan, I., Der Sturz nach oben. Kurden in Deutschland, Frankfurt 1995

Kizilhan, I., Kurdisch einfach lernen, Berlin (1996), St. Georgen (2001)

Kizilhan, I., Zwischen Angst und Aggression, Kinder im Krieg, Bad Honef 2000

Wolfgang Köhler: Zur Psychologie des Schimpansen, in: Psychologische Forschung,



Berlin/Göttingen/Heidelberg 1922, Bd. 1

Wilhelm Wundt: Die Sprache, in Völkerpsychologie, Leipzig 1911, Bd. 1

R.M. Yerkes: The mental life of monkeys and apes, in: Behav. Monogr., NY/London/Paris/Leipzig 1916, Bd. 1

Yerkes R.M. und Learned, B.W.: Chimpanzê Intelligence and its vocal expressions, Baltimore 1925

Nivîskar: Dr. Î. Kizilhan, doçenta zanîngeha Konstanz li Almanyayê, lêkolînan li ser mîgrasyon, psîkoloji û civakî. Endamê Peace-Studies li Unîversîta Konstanz. Sekorê nexweşxana psîkosomatîk şaxê biyanîyan.

## Zimanê Zikmakî û Perwerde


Mahmut Gergerli

### ZIMAN

*Milletekî bê ziman, wek laşekî bê dil e!*

Gotînekê pêşiyar ya Galleran

Ziman navgîneke ragihandinê ye, ku mîrovan ew ji lebatên (organên) xwe yê dengê bi pergal û rêkûpekî pêk anîne û ji bo serwextkirina hev û bilêvkirina hest û ramanên xwe bi kar tînin.



Ji hebûna zindiyar bi vir de ziman di nav mîrovan de bi kar hatiye, pêş çûye, di her heyam û sedemê de hebûna xwe domandiye.

Ziman ji bo tîkiliya di navbera mîrovan de ji bo, peyivîn, nivîsîn, xwendin û tîgihîştinê bûye egera bingehîn.

Raman jî wekî tîkiliyan bi zimên ve girêdayî ye. Egera yekem a afirîna ramanê, ziman e. Ziman û raman di heman demê de diqewimin. Ziman ramanê, raman jî zimên diafirîne û dide jiyandin. Mêjû ya zimanê bi qandî mêjûya hiş kev ne.

Ziman rîya pêkhatina zanîn û hilberîna civakî, huner, felsefe, teknîk û zanistê ye.

## ZIMANÊ ZIKMAKÎ ÇI YE?

Zimanê bav û kalan, dayika niştiman e.

*John Berger*

Zimanê zikmakî, ji aliyê gelek civaknas û zimannasan ve bi gir rengî hatiye ravekirin. Çened ji wan ev in:

- "Ev zimane ku, di nav malbat û jiyana rojane de tê axaftin."
- "Ev zimane ku, kom û civak ji bi neteweyî, di têkilî û çalakiyên xwe de bi kar tînin û hevûdin serwest dikin."
- "Ev zimane ku, mîrov hest û xwestekên xwe yên ku li ser bûyeran, bi riya wî zimanî radigihînin."
- "Ev zimane ku, mîrov bê yî perwerdehiyê wî zimanî di navbera hawir û civaka xwe de hîn dibe."

Wek di şiroveyên zanyarî de jî tê dîtin ku, zimanê zikmakî di nav Malbat û Civak de cihekî taybetî distîne û rolekî civakî dilîze. Mîrov bi riya zimanê zikmakî civakê xwe, orf û edetê gelê dinase û têkiliyan ji malbat û hawirdora xwe re datîne û pêş ve dibe !

## PERWERDEKARIYA BI ZIMANÊ ZIKMAKÎ

*Kesek nikare ji bo hînbûna zimanê zikmakî bibe asteng!*

Ji Peyama AGIK ê- 1990

**Perwerdehî:** Ji pêk anîna gişt çalakî û pergalên hêvotîne re perwerdehî tê gotin. Bi riya perwerdehî mîrov dikare li ser kesen ku, tê perwerdekirin guherîna pêk bîne.

Dema ku, mîrovatî di civata komunal a kevnare de bûye, bi taybetî di warê nêçirvaniyê de hewcedariya performansa fizîkî û taktîkî dîtiye û ji perwerdehiya bi vî rengî sûd wergirtiye. Ew perwerdehî bi zimanê zikmakî pêk hatiye. Mîrovên ezmûndar (bitecrûbe) ceribînin xwe yên pratîkî hîn yên naşît kirine.

Dema ku, mîrovan dev ji koçberiyê berdana û derbasî jiyana xweçihî bûne, rewşa xwedanmaliya bi taybet dest pê kiriye. Hîn kes û kom bi zordarî, yên din xistine bin destê xwe û keda wan xwerin e. di civak û neteweyan de çînen serdest û bindest çêbû ne.

Kom û civak ji bo ku, di cih û jêderkên nû de binişin û wê de rê ji xwe re bikin welat, bi hev re şer kirine. Civaka ku, bi ser ketiye, di navbera xwe û mîrovên bindest de tebeqeyekê çikirî afirandiye ku, bikaribe serwerî û mêtîngeriya xwe bi hêsanî pêk bîne. Û ew tebeqe bi zimanê mêtîngeriye perwerde kiriye û jîbo berjewendiyê xwe bi kêr aniye. Bi riya vê tepeqê ziman û çanda desthilatdar li ser gelê bindest de hêdî hêdî belav bûye. Ew sîstema ha bi taybetî bi darê zorê hatiye meşandin.

Li dû van qonaxên dîrokî de, çapkirina pirtûkan û pêşvaçûna zabnîstî bûye sedema mezintirbûna cihêtiyên ku, di navbera çîn û neteweyên serdest û bindest de hene û bi vî awayî pişafînên gelê bindest hêjê lêz girtiye û zimanê metîngera di nav gel de belav bûye. Bi vî awayî gelek ziman jî li ser rûyê erdê windabûne.

Dema ku, Martîn Lûter di sedsala 17dan Încîl'a Latîni ji almanî wergerand, hîmê nûh ya nûjen û a yekemîn ji bo perwerdehiya bi zimanê zikmakî avit û rê li ber "Perwerdehiya Zimanê Zikmakî" vekir.

Dû şoreşa Fransî; fikra azadbûnê, wekhevîyê û biratiyê wek erdhijekê bê dawî li ser rûyê dinê belav bû. Bi pêla netewebûnê ve li cîhanê gelek gûharandinein nûh çê bûn, gellek gelin bindest li hember împaratoriyein mezin yên Olî an jî yên Xanedanî seri hildan û komarên netewî yên nûh avakirin. Zimanên netewî bi pêş ve çû, Netewbûn hate şirovekirin. Û di şiroveyên nete-

wbûnêde zimanê zikmakî bi welat, ol û çandê ve cihekî girîng di şertê netewbûnê de girt.

Bi destpêkirina kolonyalîzma nûh ve welatên dagirker, îcar jî bi awayekî din ji bo berdewam kirina mêtîngerî ye dest bê xebatê kirin. Ew xebat jî li ser esasê pişaftinê de hat sazîkirin û hîn jî tê meşandin. Ji gora vê plana qîrej û bê însanî, divêt gelê bindest ji çand û bi taybetî jî ji zimanê xwe yê zikmakî bi riya perwerdehiya dagirker û bi zorê we re dûr xistin ku, netewê bindest serî li hember mêtîngêriya dayne û tu carî jî carekî din raneke.

### **MAFÊ ZIMANÊ ZIKMAKÎ DI PEYAMIN NAVNETEWÎ DE !**

*Zimanê dayika min wek çermê laşê min e. Zimanên dinên ku, ez paşê hîni bûm, wek kincên min in. Dema ku, kincek li min nehat, ez dikarim biguharînim, li çermê xwe na.*

Nivîskara Fînî, Anttî Jalava

Di gelek peyamin navnetewî de mafê perwerdehiya bi zimanê zikmakî cihekî taybetî distîne.

Çend ji wan peyama ew in:

- Peyama Zimanên Hindikayî û Navçeyî
- Peyama Yekitiya Nawnetewî ya di sala 1945an
- Mafê Mîrovan a Gerdûnî
- Pakta Mafê Navnetewî ya Aborî, Civakî û Çandî
- Pakta Mafê Navnetewî ya Şareza û Siyasî
- Peyama UNESCO ya di derheqa Perwerdehiya Dijber
- Peyama UNESCO ya konferansa gelemperî
- Peymana Parastina Hindikayînan
- Peymana Mafê Zarokan
- Peyama AGIKê ya Dokûmena Kopenhagê: ew dokûmen di sala 90 da hate pejirandin û li gora vê peyamê "Kesik nikarê ji bo hîn bûna zimanan bi taybetî jî zimanê zikmakî bibe asteng."

Wek di peyamin navnetewî de jî tê dîtîn: Hîn bûna zimanê zikmakî ne tenê mafekî xazayiyê di heman demê de mafekî dadî û navnetewî ye jî. Ew mafên navnetewî jî bi saya berxwedanin gelên bindest hatiyê qebûl kirin.

## **ROLA ZIMANÊ ZIKMAKÎ DI ÇÊBÛNA KESAYETI YÊ DE !**

Mîrov dikare rola zimanê zikmakî di çêbûna keseyatî de bi kurtî wiha rêz bike;

- Zimanê zikmakî navgînekê ragihandinê di navbera mîrov û malbata wî û civaka wî de ye.

- Zimanê zikmakî keseyatiya zarok tekûz dike.

- Zarokên ku, zimanê xwe yê zikmakî bê tirs bi kar tînin, bawerî yê wan li gelê xwe, li malbatê xwe û li xwe zêde dibin.

- Zarok bi saya zimên malbatê xwe û civakê xwe nas dike û hezî wan dike.

- Bi riya zimên orf û edetê malî û civaki tê nasandin.

- Zarokên ku, zimanê xwe yê zikmakî dizanin, navbera wî û malbata wî de pirsgêrik berî ku mezin bibin, tê çareserkirin.

- Zarokên ku, zimanê xwe yê zikmakî baş dizanin, dikarin bi hêsanî hînî zimanekî biyanî bibin.

- Zarokên zimanê xwe yê zikmakî dizanin, di hînbûnê de hîn jî serkeftî nin.

Lêkolînera Zanîngeha Gotebûrgê Margreth Hill, ji zarokên Kurd dipirse; "Gelo hûn xwe çawa dibînin, kurd an jî swedî?". Bersivê zaroka wiha ye; Zarokên ku beşdari dersên zimanê zikmakî dibin % 63yên, zarokên ku dest bi dersên zimanê kurdî kirûbin û demekî şûn ve terikandibûn % 50yên, zarokên ku qet tevî dersên kurdî nebibûn jî % 27an xwe wek kurd nîşan dabûn. Encama lêkolînê ji me re tiştêkî carekî din zelal dike; Hege zarokên me hînî zimanê xwe yê zikmakî neben we demê

dûrketina wan, ji malbat û netewê xwe, erd û orfên xwe hîn jî hêsane û ji bo me û zarokên me talûkeyekê mezin e !

## **MAFÊ ZIMANÊ ZIKMAKÎ LI TIRKÎYÊ**

Li Tirkîyê hîn buna zimanê kurdî di salê 1924an de bi Zagona Bingehîn ya Tirk hate qedexekirin. Serokwezîrê tirk Înonû di sala 1930de wiha dibêje; "Di vî welatî de tenê netewa tirk mafê netewbûnê dikare bikar bîne, wekî din mafê kesî nîne." – Milliyet 31.08.1930-. Înkâr kirina ziman û neteweyên din di tirkîyê wir bi pêş ve çûbû ku, dema ku Kongreya Dîrokî ya 2yan di salê 1937da ji hev civiya, dîroknas û zimannasên tirk li ser zimanê tirkî wiha dibêjin; "Kurd, Ereb, Laz û Çerkez nîn in, ewna hemû tirk in û hemû zimanên din li tirkî çêbûne."

Her çiqas di salên 60an Rewşenbîr û Siyasetmedarên Kurd dest bi xebatê Kurdbûnê û zimanê kurdî kirin jî ew xebat pir bi pêş de neçû bi riya Cûntayên Leşkerî bi awayekî nijadperestî û hovane hate sekinandin.

Dîsa di sala 1938an de dûv cûntaya leşkerî bi zagonekî "Xeynê bi zimanê tirkî bi tu zimanên din weşan neyê kirin!". Weşanên zimanê kurdî hate qedexekirin. Ew xal jî bi saya tevgera azadiya kurd û berxwedana gelê kurd, di sala 90 şin ve hate rakirin.

A niha jî xalê zagona bingehîn ya tirk a 42yan û bendika 9an rê bi perwerdehiya zimanê kurdî digre. Ew xal jî wiha ye; "Zimanê tirkîyê tirkî ye. Li saziyên perwerdehî û hindekariyê bi tu awayî hemwelatîyên tirkîyê re ji bilî zimanê tirkî tu zimanên din wekî zimanê zikmakî naye dayîn."

## **LI ALMANYAYÊ MAFÊ ZIMANÊ ZIKMAKÎ**

Mafê perwerdehî ji bo zarokên, "Karkerên Mêvan" di sala 1971kê da hate dayîn û di wê bîryarê de hati gotin; "Zarokên biyanî mecbûrin li almanyayê biçin dibistanan!". Dema perwer-

devanan dîtin ku, zarokên biyaniyan heger zimanê xwe yê zikmakî bizanibin ê dibistanê de serkeftî bin, bû bingeha mafê hîn-bûna zimanê zikmakî û bi Zagonekî ew heq hate dayin. Li ji bo ku, di zagonê de qala welatên ku "Karkerên Mêvan" şandibûn tê kirin ew mafa di destpêkê de ji bo zarokên kurd nehat bi kar anîn.

Li ser vê zagonê malbat, mamoste û rêxistinên kurd ji dest bi xebata "Bo zarokên kurd jî mafê perwerdehî" kirin. Bi gur bûna tekşîn û berxwedana gelê kurd ya tirkîyê û parçeyên din tesîr li vir û li ser siyasetmedarên alman jî kir û bi vî awayî di çend eyaletên almanyayê de zagonên perwerdehî ya ji bo zarokên biyanî de guhartin hate çêkirin. Di vî guhartinê de tê gotin; "Heger ew kesên ku ji wan welatan tin û zimanê wan yê dayikê li welatên wan ne zimanê fermî ye, ku bixwazin mafê wan jî ji bo hîn bûna zimanê xwe yê zikmakî heye" bi vî awayî zarokên kurd jî li çend eyaletan gihiştin mafê hîn bûna zimanê kurdî.

Ew guhartin li Bremenê 1992, li Hamburgê 1992, li Niedersachsen 1995, li Nord-Rhein-Westfallen 1997 hate kirin.


Hêvî û daxwaza me ew e ku, ew maf li her derê almanyayê were istandin û dayîn!

Ew jî di destê we malbat û siyasetmedaren de ye.



## ZXMANÊ DAYÎKÊ

**Kâzim Özdemir**



Ziman, di hebûna kesayetîya kesan, di berdewama hebûna gelan, pêkanîna siyaset, çand, abori, civakî û rûhîyeta insan da rolêk her mezin û bê salixdan dilîze. Di her warê civakê û jîyana insan da rola ziman gelek mezin, giran, birûmet û biqîmet e.

Zimanê dayîkê, ferqîyeta gelan ji hev cûda dike û neteweyîya gelan dipejirîne. Gel, bi zimanê dayîkê dibîne gel û netewe bi zimanê dayîkê dibin netewe. Em dikarin bi rojan, bi mehan li ser zimanê dayîkê bipeyîvin dîsa jî feyda wî nikarin bi dawî bînin. Ez dixwazim hinek li ser zimanê dayîkê bi sekinim.

### **Ziman û Netewe, Tesîra Ziman li Ser Azadîya Gelan**

Berî em li ser ziman bisekinin, dixwazim pirsek bikim. Dewletên kolonyalîst ku welatê Kurdan kirine çar parçe û li hev par kirine, di nav xwe da dibistanê Kurdan venakin, zarokên Kurdan bi zimanê dayîkê nadin perwerde kirin, zimanê Kurdî qedexê dikin. Gelo ev dewlet ji bo çî zimanê Kurdî qedexê dikin?.. Dewleta Turk, inkarîya Kurdan, zimanê Kurdî û welatê Kur-

distan dike. Berî çend salan ez li bajara Hannoverê çume dikanek Turkan, min xwest hinek fêkî bistînim. Dema min fêkî kir tûrikek naylon û da destê kesê ber dikanê, ji min bi zimanê Elmanî pirs kir gelo ez çend kîlo dixwazim. Min jê ra bi zimanê Turkî got ku dikare bi min ra Turkî bipevîve. Wî ji min ra got: "Bira tu Turk î?." Min bersiv da û got: "Na, ez ne Turk im". Ewî got:

- Tu bi Turkî dizanî, çewa Turk nîn î?..

Min got :

- Ma herkesê bi Turki dizane Turk e?.. Tu jî bi Elmanî dizanî, ma tu Elman î?..

Got:

- Na ez ne Elman im. Ma tu ji kîjan welat î?..

Min jê ra got:

- Ku ez ji te ra bêjim ji kîjan welatim, tuyê bi qehirî, aciz bibî.. Ya bi xêr ew e ez nebêjim çêtir e.

Ewî got:

- Ma ezê çima bi qehirim. Ez dîn bûme biqehirim.

Min jê ra got:

- Madem wilo ye ez ji te ra bêjim, ez ji Kurdistan im...

Zilamê dikandar bixwe jî Kurd bû. Kesê Kurd çiqas dibistanan xwendibe disa jî dema bi Turkî bipevîve, meriv ji Turkîya wî û dengê wî dizane ku Kurd e. Dema min jê ra got "Ez ji Kurdistan im." Li min nihêrî û bi dengê qehirandin got:

- Kurdistan li ku ye?.. Ma bi navê Kurdistan welatek heye?..

Min jê ra got:

- Ma min ji te ra negot tuyê biqehirî!.. Tu çî koremarek ye-man î!.. Tu gelek qenc dizanî Kurdistan li kuye!.. Belê ji koremarîya xwe dibêjî ez nizanî, xwe li nezanîyê girêdidî... Madem tu xwe ne hayîdar nîşan didî û nizanî li ku ye, wellê tu bi

teqî, bi fetisî jî ez ji te ra nabêjim Kurdistan li ku ye!.. Here li Atlasa Elman binêre û fêrbibe Kurdistan li ku ye!..

Ziman, sazûmanî, hevrabûn û yekîtiya gel bi cî dike. Tendirustîya nava gel pêk tîne û jîyana civakî dewlemd dike.

Jîyana meriv û civatê bi zimanê dayîkê bi rengî dibe. Gelên ku zimanê dayîka xwe jibîr bikin dibin koleyê kesên gelên dî.

Ji Feylozof Konfîçyûs pirsikirine :

- Ger tu qeran bûwayî, serokê dewletê bûwayî teyê karê yekem çî bikir?..

Konfîçyûs vê bersivê daye :

- Eger ez serokê dewletê, qeran bûma minê karê yekem zimanê dayîkê rast bikir.

Kesên di civatê da rûniştî, dimînin şaş û mat, nizanin çî bêjin. Konfîçyûs yek bi yek li rûyê wan dinêre û dibêje, bele minê karê yekem zimanê dayîkê sererast bikir.

Kesên civatê dibêjin :

- Me tiştêk fam nekir.

Feylozof Konfîçyûs wiha bersiv dide :

- Dema zimanê dayîkê xelet be û qusûr tê da hebe têgihîştina peyvan qenc nayên famkirin. Dema têgihîştina peyvan qenc neyên famkirin, pêkanîna kar û barên hatîyê xwestin bi rastî û tenduristî nayên pêkanîn. Dema kar û barên tên xwestin, bi rastî û tenduristî neyên pêkanîn çanda (kultura) civakê xirab dibe. Dema çanda civakê xirab bibe, jîyana civakê tevlihev dikeve, gelê civakê gêj, şaş û faş dibe, anarşî çêdibe. Dema gel şaş û faş bibe, anarşî çêbe, gel ezîtiya xwe winda dikê, nizane azadî, dîn û mirovatî çîye, dibe koleyê neyarê xwe û dibe ne xêrxwazê xwe... Ji bo vê yekê tu kar û barê ku mirov yekem bike ji sererastkirina zimanê dayîkê giringtir nabe.

Yekîtiya civakê an go em yekîtiya neteweyî dibêjin bi zimanê dayîkê tê sazkirin, tê xemilandin û kemilandin. Ji bo yekîtiyê hevrabûna neteweyîyê ziman cîyekî pîrr fire û girîng digire.

Zimanê dayîkê zadê dema berê û tovê dema roj û salên pêşîya gel da ye. Bingeha netewebûnê zimanê dayîkê ye. Li ser ziman û girîngîya ziman di nav civakê da nîrxandinên gelek kûr û dirêj hene. Heidegger dibêje : “Ziman mala heyî ye.” Dema mala kesekî tunebe ku serê xwe tê da bihewîne û xwe bi cî, bi mal û war ke, dibe tolazê dirb, zabok û kolanan. Dema miletek zimanê xwe ne emilînê, lê xweyî dernekeve, dibe tolazê destê miletên dî û ji hole radibe.

Tu miletek nikare ji kesên dî ra bêje : “Tu mecbûrî wekî min bibî û xwe wekî min bikî.”

Hebûna netewefiyê bi zimanê dayîkê ye. Ku ziman ço, neteweyî jî diçe, ji ortê radibe. Pêşçoyîna ziman bi ya civakan va girêdayî ye. Eger civak bi zimanê xwe va bieliqê û bizeliqê, neteweyî jî bi dîrokê va bi awayek zexmî di zeliqê, bipêş va diçe, bilind dibe. Gel dikare bibe neteweyek zexim û dikare welatê xwe bipêş va bibe.

Ziman windakirin, millet windakirin e, xwe inkarkirin e, eslê xwe windakirine. Di nav Kurdan da ji kesên serserî, bentûte, sixtekar û xayîn ra dibêjin “Bê esil.” Bê esilî gotinekê herî xirab û ne qence di nav Kurdan da. xwedê kesî bê esil neke. Kesê zimanê dayîka xwe winda bike û xwedî lê dernekeve bê esil e!.. Mana bê esil, ew kesê xwe winda kirî ye. Kesê zimanê dayîkê nizanibe û lê xwedî dernekeve xwe winda dike, xwe inkar dike, dibe ji miletek dî. Rewşa Kurdên Kurdistanê Bakûr di warê zimanê dayîkê da rewşek reşê , rewşek nexweşe. Mirov nikarê bi vê rewşê dilxweş bibe...

Metelokek me Kurdan li ser ziman bi vî awayî heye.

Dernakeve ji mal e.

Him ciwan e, him kal e.

Geh şûr e, geh mertal e.

Him neyar e, him heval e.

Geh şêrîn e, geh tal e.

Geh rastî ye, geh xeyal e.

Him çol e, him jî mal e.

Di vê metelokê da giringî û tesîra ziman gelek xweşik tê nîşandan. Ziman hem şûr e, şeran dide qezenckirin him jî mertal e, gelan diparêz e. Ku meriv zimanê dayîka xwe ne emilîne, neyarê gelê xwe ye, belê ku meriv bi zimanê xwe va bizeliqe, dostê gelê xwe ye, jê ra hevalê herî qenc û mezim e.

Di nav gelan da ferqîyet û cûdabûna mana peyvvan heye. Her gel bi dîtin û nirxandina zimanê xwe cihanê dibîne.

Rehmetiyê Mîr Celadet Elî Bedirxan derheqa zimanê dayîkê da wiha dibêj e:

- Miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe dikarin bi du tiştan, bi du çekên herî bi qewet biparêzin. Yek ji van du çekên herî tûj ol e û ê dî jî zimanê dayîkê ye... Eger ola miletê bindest û serdest yek be, ji bo parastinê û azadîyê di destê miletê bindest da her û her çekê bi tenê dinîn e û ev çekê bi qîmet û rûmet zimanê dayîkê ye... Kesê vî çekî nizanibe bi emilîne rojek dereng an zû, ji meydana miletan winda dibe.

Ev gotina Mîr Celadet Elî Bedirxan gotinek biçûk nîne ku mirov bavêje kuçeyek. Pêwiste em Kurd vê gotinê ji xwe ra bikin şûr û mertal û bi vî şûr û mertalî, xwe bê tirs û hof bavêjin meydana şerê azadîyê. Ola me û ola dewletên kolonyalist yek e û di destê me da ji bo berdomandina hebûnê yek tiştê bitenê maye, ew jî zimanê dayîkê ye... Belê em dema kûr û hûr binêrin, emê bibînin ku gelê me çiqasî û bi çî awayî li zimanê dayîkê dibe xudan.

Yekîtîya gelemperî, yekîtîya netewî, şirkatîya têgihayî û dîtîniyê encax bi axaftin, nivisandin û pêş va birina zimanê dayîkê tê pêkanîn. Xusûsiyetên gelemperî û civatîyê zimanê dayîkê dide biriqandin. Ji bo yekîtî û hevrebûna neteweyîyê ziman cîyek pirr fire û girîng digre... Dema miletek ji zimanê xwe ra bibe bîyanî, dikeve nav jîyanek teklihev û tarîyê. Di nava vê tarîyê da winda dibe, ji meydana dîrokê derdikeve...

## Zimanê Dayîkê û Kesayetî :

Fêrbûna zimanê dayîkê heqê nirovatî, demokratî, insanîyetî û wekhevîyê ye û wekî heqê jîyanê herî giring e.

Di nav gelekî da insanîyetî, mirovatî, wekhevî, yekîtî û demokratî bi rêya ziman tê pêkanîn.

Kamilkirin û xemilandina keseyatîya zarokan bi zimanê dayîkê va girêdayî ye. Bi zimanê dayîkê , zarok dikare bi civata gelê xwe ra bi çandî, hissî, civakî, şayi û şîn, dert, êş, keder û elem, kêf,sefa, cefa û xemdarî, xweşî û reşîyê fahm bike û bi gel ra bide, bistîn e.

Jîyan bi zimanê dayîkê bi rengîn dibe. Kesê zimanê dayîkê nizanibe, jîyana gelê wî, jê ra ne rengîn e, tim û tim tarî ye. Bi rastî mirov heyîyek civakî ye û zimanê dayîkê jî mala wî ye. Mala bê parastin û be nihêrtin, mala xirabe ye, mala bê kes e.

Erîkson dibêj e:

“Rewşnêrîna dayîkê tesîrê bi bawerbûyîna zarokê dike. Bi teybetî hê di dema hemîlebûyînê da xisar û tehrîbata li ser psikolojî û fizîkîya dayîkê dikare tesîrek mezin li zarok bike. Dayîk bi zimanê xwe kêfxweşî û kêfnexweşîyan his dikê û tesîrek gelek mezin dide jîyana zarok.”

Zimanê dayîkê hevîrê kesayetîya zarokan e. Zarok bi zimanê dayîkê ezîtî, şexsîyet, şîûr, edep û çanda (kultur) xwe digrin. Ew zarokê, ew mirovê ku ji zimanê xwe dûr bikeve, ji şexsîyet anî ji hevîrê kesayetîya xwe dûr dimîne. Piskolojîk rûhê wî xira dibe, nizan e û nikar e jîyana xwe sererast berdewam bike.

Ziman û giyan (ruh) bihev ra girêdayî ne. Dema peyvînê da tevhevîya ruh (giyan) derdikeve pêş. wexta axaftinê da ne tenê azayîya bedena mirovan, wezîyeta rûhê mirovan jî xwe bi mîmîkan nîşan dide.

Çewa me got zimanê dayîkê, hevîrê kesayetîya mirovan e. Hevhatin û geşbûnîya kesayetîyê pêk tîn e. Jîyana mirovan bi

hevhatinê geş dibe. Herwiha yekîtiya civakê an go yekîtiya netewî jî bi zimanê dayîkê tê sazîkirin, tê xemilandin û kemilandin.

### **Zimanê Dayîkê, Çand, Dîrok, Din, Perwerde û Nasî**

Ziman, sembola civakê, bîngeha çanda netewî ye. Çand bi ziman tê meydanê. Çanda bê ziman nikare bibe çanda dewlemend. Dîrok jî, ji çandê tê holê. Dîroka bê çand ne dîrok e û pêşeroj jê ra tune. Serkanîya çandê zimanê dayîkê ye. Serkanîya dîrokê jî çand e.

Eger em çandê wek baxçeyek bihesibînin, ziman serkanîya vî baxçeyî ye.

Di baxçeyek da fêkî heye, zerzewat heye. Di baxçê bê av da, firengî, baqle, xiyar, gêzer, rihan, bamyê, sîr, pîvaz, qavun, îsot, bacan û temamiya zerzewatan çênabin, hişk dibin... Eger serkanîya baxçe zuwa bibe, baxçe jî hişk dibe. Serkanîya çandê jî zimanê dayîkê ye. Eger serkanîya çandê anî ziman ji dest here, çand jî namîne û gelê xwedîyê ziman û çandê jî, ji meydana dîrokê radibe. Em dibinîn ku bê ziman çand jî namîne, dîrok jî namîne û gel jî namîne. Eger em qenc bifikirin emê giringîya ziman qenc fam bikin û bi dil û can xwedî li zimanê dayîka xwe derkevin.

Çand û ziman biheva girêdayîne. Eger ji wanan yek kême be, ê dî jî gelek zêf û xirab dibe.

Zimanê dayîkê wekî çermê canê mirovan e. Zimanê beyanî wekî kincên li ser mirovan e. Mirov dikare kincên xwe biguhêre, kincên nû û xweşik li xwe bike, belê mirov nikare çermê xwe biguhêre...

Perwerdîya bi zimanê beyanî li ser kesayetîya zarokan rolek gelek mezin dilîze. Kesên bi zimanê dayîkê dest bi dibistanê û perwerdîyê neke, ji alîyê kesayetîyê va gelek kême dimîne, nikare şexsiyeta xwe mukemel bike.

Dema zarok di dibistanan da ne bi zimanê xwe, bi zimanekî dî dest bi xwendin û perwerdeyê bike, cihana wî ser û bin dibe. Ezayetîya wî kêr dimîne. Di dibistanan da nebikaranîna zimanê dayîkê bandorekê negatîf li zarokan dike û wan dike nav kompleksên nizimbûnê. Eger em li ser Kurdan bifikirin ku her çar parçeyên Kurdistanê bi zimanê dayîkê perwerde nabin û zimanê dayîkê ji wan ra qedexeye, vêcar emê bizanibin ku dema ev zarok bezin dibin, dikevin çî hal û pergali...Emê fam bikin ku di nav Kurdan da çima tim û tim neyartî berdeyam e. Însanek ku di ezayetîya wî da kêmbûn hebe û bikaribe çî bike, Kurd jî dikarin eynî tişt dikin...

Ziman di bingeha xwe da mijara nasnameyê ye. Dema kesek bêje “Ez Kurd im, Erebeb im, Turk im, Faris im, Elman im...” jê ra şahidek lazim e. Ev şahid jî zimanê dayîkê ye.

Her insanek, bi zimanê ku dipeyive tê naskirin ji kijan gel e!.. Her insanek, her gelek zimanek wiyê dayîkê heye û li vî zimanê xwe xwedî derdikeve, pê va dizeliqe, bi pêş va dibe, bilindtir dike, pê fikir dike, pê dinivisînê... Belê hin Kurd zimanekî wanê dayîkê tune û zimanê neyarên xwe diemilînin, dipeyîvin, dinivisînin.

Her heywanek jî, zimanek wî heye. Kûçik ewta ewt dike, pişik mewa mew dike, mirîşk qida qid dike. Gelo kesî tucar dîtîye ku kûçik bi zimanê pişike mewa mew kirî ye, an Pişik bi zimanê mirîşkê qida qid kirî ye, an jî mirîşk bi zimanê kûçik ewta ewt kirî ye!.. Heywan ku heywane jî, ji xeynî zimanê xwe zimanekî dî naemilîne.. Gelo çima hin insan dev ji zimanê xwe berdidin û zimanek dî diemilînin?.. Ez dizanim gelek kes tê li ser van gotinê min, ji min bi qehirin, belê êdî ez van tiştan jî nebêjim` ezê biteqim...

Em dikarin li vir Elmanya zarokên beyanîyan binêrin. Kesayetîya wan teklîhev e. Helbet rewşa zarokên Kurdan li welatê xwe, ji rewşa zarokên beyanîyên Elmanya gelek xirabtir e. Li Elmanya inkariya zarokên beyanî nayê kirin û di heftîyê da çend



siet diçin dersa zimanê dayîkê, belê li Kurdisan, li welatê zarokên Kurdan, zimanê dayîkê ji wan ra qedexe ye û li Turkîyayê inkarîya van zarokan û gelê wan tê kirin...

Dema mirov zimanek rind hûr û kûr bikole û tê bigihîje, mirov civaka ku wî zimanî dipeyîve, ji her alî va dinase. Minak; Kurd dibêjin: “Şêr şêr e, çî jin e çî mêr e.”, “Wî limin pepûkê!..”, “Wî limin porkurê!..”, “Hey wax limin hey!..”

Turk dibêjin “At, avrat. sîlah = Hesp, jin, çek.”, an jî “Bomba gibi=Wek kumbere!..”, “Biz bize benzeriz = Em dişibin xwe!” (Di vir da ez dixwazim di nav kevanê da li ser vê gotinê tiştêk bêjim ku em Kurd dişibin herkesî belê bitenê naşibin xwe!..), “Amanim, of aman of!”

Dema mirov di çarçova pêşvaçona dîrokê da li ziman binêre, mirov bi hêsanî rastîya dîroka gelan bê kêmasî tê da dibîne. Minak: Turk dibêjin: “Üzümü ye bağını sorma = Tiryê wî bixwe, pîrsa rez neke!..”, Kurd dibêjin: “Dinya neyarê kewê, kew jî neyarê hev e!..” Dîsa di hin bernavkan da mirov rewşa dîroka gelan dikare bizanibe. Minak hin navên paşayên Turkan; Kuyucu=Bîrçî, Baltacı=Bivîrçî, Kazıkçı=Zixtçî, Öküz=Ga Mehmet Paşa

Em kurt li ser van gotinan bisekinin. Hesp, jin, sileh. Ji ewil va bi hesp û sîlehên xwe welatê kesên di talan û wêran kirine, jin û keçên wan revandine, tecavuz kirine. Heta di dema Osmanîyan da ji bo ku welatê Ewrûpîyan talan û wêran nekin, Ewropîyan keç û jinên herî delal bi zêran va ji paşayê Osmanîyan ra diyar dikirin, Herema paşayên Osmanîyan ji keç û jinên delal ku êsîr hatibûn girtin an jî xelat hatibûn şandin, tijî bûn. Hin jinên Ewropî ku xelat ji paşayê Osmanîyan ra hatibûn xelatkirin wek Hurrem Sultan, Kösem Sultan û ên din... hakîmîyet giran di xanedana Osmanîyan û hukmê di pêşajoya dewleta Osmanî da kiribûn, jinên Ewropî an jî Rus bûn...

Îro di jîyana rojevî da, her xeberê xwe da dibêjin “Bomba gibi= wek kumbere.”. Her tiştê dikin wek kumbere, çimkî ji çekên

kuştinê, ji şer û kampaxkirinê hisdikin.. “Tirî bixwe, pirsra rez neke”, welatê kesên di zeft bike, dewelemendîya ser erd û bernerde wan bixwe, pirsra xwedanê welat neke, ê kî dibê bila be, niha ê te ye û bixwe... Em di şibin xwe, miliyetçîne, çî dikin bi kêfa xwe ne, ki çî dibêje li ba me derbaz nabe... Kurd jî wek gotinên xwe hereket dikin. Mînak: Cîhan neyarê kewê ye, kew jî neyarê hev e. Cihân neyarê Kurda ye, Kurd jî neyarê hev in...

Her gel li ser bingeha ziman, raman, hest, şahî û êşen xwe dide dîyarkirin û vê bingehê bikar tîne. Ziman bingeha çandê, neyartîyê, nefret û hiskirinê, şahî û êşa; bi kurtî bingeha hissê ye. Xnsan bi ziman li hev tê, bi ziman ji hev diçe. Ziman di bingeha çandê da wilo kûr cî girtî ye ku çare nîne mirov xwe jê bikaribe dûr bike. Gelek caran ez ji Turkan ra dibêjim çanda me çiqas nêzî hev be jî disa hin peyv hene ku bi Turkî bêne welgerandin, an jî hin tiştên bi Turkî bi welgerin Kurdî mane û xweşîya wan namîne. Ji Elmanan ra dibêjim em generasiyona yekem, an jî kesê çanda Kurdî girtibe, çiqas jî entegre bibe û xwe nêzî Elmana bike, disa di cîyek da dimîne sekinî û nikare wek we bibe, wek we hîs bike. Mînak: Di peyvên ji hev hezkirinê... Dema mêr û jinekê Elman ji hev hezbikin û gotinên herî xweşikê manîdar ji hev ra bêjin; dibêjin “mein Mäuschen=mişkika min”, “mein Bärchen=hirçikê min”, “mein Scheinchen=berazokê min.” Di rêya hezkirinê da bi zimanê Kurdî, ev peyv nayên tu manayek kenc, tersê wî dema mêrek ji jîna xwe an jî, ji dosta xwe ra bêjemişkika min, an jinek ji mêrê xwe an jî, ji dostê xwe ra bêje hirçikê min, berazokê min miheqeq tê ev kes dilşikestî bibin, belkî ji hev jî biqetin, ji bo ku ev peyv di zimanê Kurdî da heqaretek herî mezin in...

Ziman, bingeha civakê, sîyasetê, dîn, dîrok, çand, perwerde, huner û her tiştî ye... Mirov dikare bêje, zimanê dayîkê kilîda dewlemendîya, çand û dîroka pêvajona hezaran salan da hatîye firekirin. Mirov dikare bi kurtî bibêje mirov bi zimanê kîjan gelî bipeyîve, bi dîtin û nirxandina wî gelî cîhanê vedirêşîne.

Gava yek bi Turkî bipeyîve bi dîtîn û nirxandina Turkan, ba Elmanî bipeyîve bi dîtîn û nirxandina Elmanan û bi Kurdî bipeyîve bi dîtîn û nirxandina Kurdan li cîhanê dinêre û dinirxîne.

Ne dîrok bitenê, her warê jîyanê jî bê ziman nabe. Dîn û bawerîyên insanan bi ziman hatine pejirandin. Dînek, bê ziman nabe dîn û nikarê di nav civata bê ziman da cî bigre, fire bibe. Di tim kitabên îlahî da fesla ziman tê kirin. Di Kuranê, sureta Mûsa, Ferza 19'an da wiha dibêje:

"Me mirov, qewm bi qewm afirand û her qewmek zimanek dayê. .. Ev hêvîyekê [wedê ye, kê hêvîya [wedê inkar bike kafir e...."

Gelo ew dewletên ku inkariya zimanê Kurdî dikin, zimanê Kurdî qedexe dikin ne misilman in?... Gelo zimanê Kurdî ne xwedê daye?... Ew zimanê ku xwedê daye dewletên kolonyalist inkar bikin jî ma tê inkar kirin. Ev hêvîya ku xwedê daye, jî alîyê kolonyalîstan va tê inkarin. Çewa di ayeta Kuranê da dibêje, inkarkirina vê hêvîyê, inkarkirina [wedê ye..

Berî 25 salan, min ji bo tercûmanîya zimanê Kurdî û Turkî mirecêt kir û piştî imtihanek bûme tercûmanê zimanê Kurdî û Turkî. Yekê Tirk senedêkê noterê anî cem min û min welgerand zimanê Turkî. Ewî, ji bo muhorkirina konsolosê vî senedî şand konsolosa Tirk. Piştî demek hat cem min û got: "Madem tu ne tercumanî, te çima senedê min welgerand Turkî. Konsolos gelek aciz bû û senedê min muhor nekir. Piştî demek karek min hebû û ez çom konsolosa Turk. Yekê mamosteyê naskirî di konsolosê da memûr bû û bang kir min bir dayra xwe. Ji min ra got "Serokkonsolos gelek qehirî dema ku mora te dît. Ji min ra got ku ev mirov bi salan di konsolosê da xebitîyî û çewa dikare tiştêk wiha bike, muhora tercumanîya zimanê Kurdî bistîne. Wezîfe da min ku ez bi te ra bipeyivim. Pêwist e tu vê muhorê heman bavêjî.."

Min jê ra got: "Baş e, li ser seran, ezê vê muhorê hema niha bavêjim. Tu dikarî ji kerema xwe ra ji min ra bêjî, gelo bi avêtina vê muhorê tê zimanê Kurdî ji bê avêtin, ji ortê rabî an na ?.. Ez muhorê bavêjim jî dîsa zimanê Kurdî li ortê ye, nayê avêtin û zimanê mine. Ez nikarim bibim tune, ku zimanê min jî bibî tune. Ez li pêşmiqabilê te me û heme. Tu bejî tu tineyî jî, va ye ez li vira me û heme !... Dema min li konsolosê kar dikir û yekê Kurdê ku bi Turkî nizanibû dihat vir, ma we bangî min ne dikir, ma min ji we ra tercumanî ne dikir?.."

Memûrê ku xwe alîkar nişan dida got: "Serokkonsolos got ku tu vî zimanî di dayîrêyê Elman ê fermî da, bi avayek fermî nişan didî û bi biyanîyan didî qebûlkin. Ev jî, ji bo dewleta me ne qence..."

Min Çewa di virda da xuya kirin, tehemula kolonyalîstan jî zimanê Kurdî ra tune. Xwedê tu zimanî serdestî zimanê dî çênekirîye. Heq nedaye tu zimanî ku serdestê zimanê dî ye. Çanda tu kesî, tu gelî ji çanda kesên dî, ji çanda gelê dî mezintir û qenctir nîne. Xwedê tu heq nedaye kesî ku zimanê kesên dî, çanda kesên dî ji orte rake. Belê dewletên kolonyalîst zimanê Kurdî qedexe dikin, Kurda bê zar û ziman dikin. Halbikî gotinekê pêşîyên Kurda heye, dibêje: "Zar û ziman, dîn û îman." Di virda jî tê eşkere kirin ku dîn bi zar û ziman dibe dîn, dînê bê zar û ziman ne dîn e.

Teodor Leuenberger dibêje: "Hemû bihevçonên dîrokî di warê ziman da serkeftinek bi dest xistine. Dîrok ji van şeran pêk tê."

### **Zimanê Dayîkê û Sîyaseta:**

Zimanê dayîkê di meşandina polîtîkayê da cîyek herî giring digir e. Kesê bi zimanê gelê xwe polîtîka ne meşîne, nikare biserbikeve. Nikare gelê xwe zane û şîyar bike. Nikarê gelê xwe organîze bike, nikarê gelê xwe fam bike û xwe bide famkirin, nikare armanca xwe bi gel bide famkirin.

Partî û rêxistinên Kurd xwedî sîyasetek ziman nînin û di proxramê wan da li ser ziman tiştek tune an jî hevokek heye. Sîyasetmedarên Kurdistana bakûr di civîn û semînerên xwe da bi zimanê Kurdî napeyîvin. Serokên Kurd, ji kesên endam û alîkarên partiyên xwe ra telîmat, name û daxwazên xwe bi Turkî dinivîsînin. Zimanê wanê mişterek bû ye zimanê beyanî. Pirranîya sîyasetmedarên Kurd dibêjin: “Em bi zimanê Kurdî nikarin gengeşe bikin û zimanê Kurdî ne zimanê gengeşekirina sîyasetê û aborîyê ye.”

Sala 1983'an me li Hannoverê kursek ji bo zimanê Kurdî amade kiribû û gelek sîyasetmedarên Kurd pêşdarî vê kursê bibûn. Bi roj me Kurs çêdikir û hevalan li cem hev rûdiniştin mineqeşe dikir. Kesî bi Kurdî gengeşe ne dikir. Ew kesê ku elelecele Kurdistan azad dikirin, digotin: “Zimanê Kurdî ne zimanê gengeşa sîyasetê ye, em nikarin bi Kurdî gengeşe bikin.” Bi vê xapandîna xwe, bi zimanê Turkî gengeşe dikirin. Berpîrsîyarên dewletên koledar jî eynî tişt dibêjin. Dê fermo, werin vê malxirabîyê jihev derxin !.. Ferqîyeta wan ji hev çîye gelo ?..

Hin serokên me ku sozê serxwebûna Kurdistan dabûn gelê Kurd digotin: “Ewil dewlet paşê ziman. Dema em dewleta xwe damezirînin wê demê emê dest bi girîngîya ziman bikin.” Eger em hêvîya dewlet damezirandinê bimînin, bi rastî tê kokê me ji holê rabe, gelê Kurd di dîroka cîhanê da namîne.

Di sala 1991'an da serokomarê dewleta Turk Turgût Ozal, di civîna Yekîtiya Ewropî da pêşdar bibû. Li ser pîrsa Kurdî berpîrsîyarên Ewropîyan ji Ozal pîrs dikin, dibêjin:

- Gelo ji bo çî win zimanê Kurdî di dibistanan da serbest nakin. ?

Ozal wiha bersiv dide :

- Gelek name û raporên terorîstan ketine destê me. Ew nameyên ku terorîstan ji hev ra nivisandine, ew raporên ku li ser xebat û rewşa xwe nivisandine, temamîya wan bi zimanê Turkî ye, yek xetek di nav wan name û raporên da bi Kurdî tune. Eger

ew kesên dewleta Kurd dixwazin û ji bo vê daxwazê terorîstî dikin, name û raporên xwe bi zimanê xwe Kurdî nenivîsînin, xuya dike ku zimanê wan Turkî ye. Vêcar ez nizanim, gelo bi navê Kurdî zimanek heye an na?.. Eger win dixwazin, em dikarin name û raporê wan bidine we jî.

Di pêşgotina pirtûka Sprache und Herrschaft (Ziman û Serkarî) da dibêje:

- Ziman, polîtîka bi xwe ye, polîtîka jî zimanê di nava gel da ye. Serkarîyen zordestan ne tenê bi kotekê gel ditirsînin û digirin bin bandora xwe, herwiha ew li xirakirina zimanê gel dixebitin ku gel bikşînin ale xwe.

### **Girîngîya Zimanê Dayîkê û Sîyaseta Kolonyalist**

Dewletên kolonyalist bi sedsalane ku zorê û zordestî li Kurdan û zimanê Kurdan dikin. Daxwaza wan ji ortê rakirina zimanê Kurdî yê. Ew gelek qenc dizanin ku ji ortê rakirina zimanê Kurdî, tê gelê Kurd jî, ji dîrokê bide paqijkirin. Ji bo asimîlekirina gelê Kurd, pêwîste zimanê Kurdî bê jibîrkirin. Dewletên mêjok, bi her awayî ji holê rakirina zimanê Kurdî bi tim qewetên xwe dixebitin. Turkîya, Ji dibistanan heta eskerîyê, ji jîyana aborî heta sîyasîyê, ji çandê heta jîyana civakî, ji navên gund û bajar û çol û çîyan heta jîyana rojevî, di herwarî da ji bo ji binîrakirina zimanê Kurdî bi qencî û xirabî, bi top û tîfingên xwe, bi serdestî û zordestî, bi ken û girîn, ji dibistan, zaningeh heta eskerîyê, ji gund bajar heta karxanan (fabrîqan), ji rojname hetanî medyayê, di warê aborî, çandî, sîyasî û civakîyê da, di her warê jîyanê da êriş dide ser zimanê Kurdî û ji nava civaka zimanan dide rakirin. Ev êrişên giran, bi damezirandina cimuryeti ra xirabtir bûne. Zorê û zordestî ji hedê xwe derkeftiye. Di van 20 salîyan dawî da, ji sala 1980'an û virda, ji bo windakirina zimanê Kurdî her tişt mubah bûye. Ne heqê mirovan, ne heqê insanîyê, ne wijdan û merhemet tiştekan nema.

Tiştê herî pêkenok û komîk ev e ku dewleta Turkîya bi navê ilmê profesor, zimanzan û alimên xwe ên sexte dide pêş û ilmê jî sexte dike, qirêj û çepel dike. Ji dema Mustefa Kemal hetanî îro bi hezaran alimên xweyê sexte dayê pêş, li ser tunebûna zimanê Kurdî rapor û pirtûkan daye nivisandin, konferanmsan daye çêkirin, gotinên alimên Ewropî jî li gorî ilma xwe ya sexte daye guhartin û danîye ber gelê xwe, ber gelê Kurd û gelê cihanê. Di salên dema Mustefa Kemal da qaborê qafê mirîyan tanin konferansa û şiklê Turkan derdixistin holê. Zimanê Turkan roja cihanê nîşan didan û zimanekê bi navê Kurdî nîne digotin. Kurd, Turkê çiyayî bûn û zimanê wan jî zimanek ji Turkî, Erebî û Farisî bi avayek piç derketibû holê. Di dema 12'ye Êlûnê da zimanê Kurdî ji xart-xurta şikênandina berfê çêbibû. Belê ji aliyên dî va ev alimên sextekar qenc dizanibûn ku dî nav zimanê Turkan da bi hezaran peyvên Kurdî hebûn. Peyvêb ku bi "çar", "ser..." destpêdikin, peyvên ku bi "kar", "dar..." bidawî dibin, hinekên farisî xaric bi temamî Kurdî e û Turkan van peyvvan ji xwe ra kirine mal. Mînak çarşev, çarşamba, çardak, serdar, serserî, serpûş, cefakar, hurmetkar, sefakar, sirdar, alakadar, zordar...

Devleta Turk dibêje zimanek bi navê Kurdî û miletek bi navê Kurd tune û bi gelê xwe jî dide bawerkirin. Belê çewa cin ji hesin ditirse, dewleta Turk, berpirsîyar û karbidestên wan wilo ji vî zimanê tune ditirsin. Tiştê ku tunebe meriv jê natirse. Zimanê Kurdî, Kurd û Kurdistan him tûne û him jî, ji vê tuneyîyê ditirsin, dibizidin, qedexe dikin !...

Makyawel di pirtûka xweya ku bi navê hukumdar da şîretan dike, dibêje. "Ew welatê ku bê zeftkirin, pêwiste berî her karî zimanê wî gelî bê windakirin. Dema ziman winda bibe, ew gel jî winda dibe, êdî nikare desthildan bike, welatê xwe paşkî bistîne, azad bibe."

Makyawel ji bo windakirina ziman gelek rê û bendan nîşanî hukumdar dide. Ne hacete em van şîretan yekeyek li vir bêjin.

Binêrin kiryarên dewleta koledar û bizanibin makyawel çî goti ye.

Kolonyalîstan ji me gelek jîrtir bi ziman girtine, polîtîka ji ortê rakirina zimanê me bi tûjî û xurtî dimeşînin. Di destpêka semînerê da min pîrsek kir û got gelo dewletên kolonyalîst çima zimanê me qedexe dikin. Niha em dizanin ku sîlehê herî mezin û dijwar ji bo azadbûnê gele me zimanê me ye. Kolonyalîst vî tiştî zaf qenc dizanin û dixwazin zimanê me bi me bidine jibîrkirin û windakirin. Dema zimanê me winda bibe, em jî, ji meydana dîrokê radibin. Madem dewletên kolonyalîst zimanê me didin qedexekirin û vî çekê dijwar ji destê me distînin, pêwîste em jî aqilê xwe bidin serê xwe û bi vî çekê bi qîmet û rûmet va bizeliqin, heta mirinê qet ji destê xwe bernedin. Ji aliyê windakirina zimanê me çî ji destê kolonyalîstan tê dikin. Wek dewleta Turk ji zimanê Kurdî acize, ji tu tiştî ne aciz e!.. Ne bitenê li Tirkîyayê, li kêdara cîhanê mafê zimanê Kurdî bê eşkere kirin, dewleta Tirk bi her awayî vî mafî di temirîne. Ji bû dersa zimanê Kurdî li hin eyaletên Elmanya ku niha tê çekirin, dewleta Turk gelek xebat û çalakîyan di nezda hukûmetên eyaletan da kir ku dersa zimanê Kurdî bi fermî nekeve dibistanan.

Ez dixwazim mînakek bi mane di heqê kiryarên dewleta Turk da ji were bêjim. Sala 1958'an dewleta Misrê, li bajara Qahîrê rojê sietek bi jîmanê Kurdî dest bi bernameyek zimanê Kurdî kir. Tirkîya gelek aciz bû. Winê bêjin ma Misir li ku û Tirkîya li ku, çima Tirkîya aciz bibe?.. Ez bersiva vê pîrsa we nadim, win bixwe li bersivê bigerin. Wezîrê derva ê Tirkîya Fatin Ruştu Zorlu bi serokê Misrê Cemal Evdîlnasir ra sedem vê bernama Kurdî dipeyive û nerazîbûna xwe tîne ziman. Cemal Evdîlnasir polîtîka Turkîya derheqê Kurd û Kurdistan da qenc dizane. Ji Fatin Ruştu Zorlu pîrs dike, dibêje :

- Ez qenc nizamim, ma li Turkîya Kurd hene?..

Wezîrê Turkîya ê derva Fatin Ruştu Zorlu bersiv dide û dibêje;

- Li Turkîya Kurd tunin.



Cemal Evdilnasir bi dengekî ji xwe bawer dibêje:

- Madem li Turkîya Kurd tunin, ev bernama ku em li şahîrê Qahîreyê bi zimanê Kurdî diweşînin, gelo çima we aciz dike û diqehirîne?.. Ji bo Turkîya ev bernama ne problem e. Ji ber ku li Turkîyayê Kurd tunin! Em beredayî serê xwe ne êşînin...

### **Di Asîmîlasyona Zimanê Kurdî da Rola Kurdan**

Dewletên kolonyalîst di aliyê ziman da, ji me Kurdan gelek zanatir û bi pêşvatirin. Ji bo zimanê me bi me bidin jibîrkirin û me asîmîle bikin, çî ji destê wan tê dikin. Gelek Kurd dibêjin ku dewleta zordar firset nedayê me ku em zimanê dayîkê fêr bibin û bikaribin biemilînin. Tiştê heye ku bê şik û bê şuphe ye. Ev tişt jî zordariya ku dewlet li zimanê Kurdî û Kurdan dike. Kesek nikare kiryarên dewletên koledar derheqa zimanê Kurdî da zelal û paqij bide nîşandan. Zor û zordestiya li ser zimanê Kurdî li ber çavan e. Ev zor û zordarî, ev qedexe kirin û neyartî, ev inkar kirin û asîmîlasyon, ev zulm û nemirovatî em deynin aliyek û derheqa zimanê Kurdî da werin ser kiryarên Kurdan...

Kurdên zimanê dayîkê jibîr kirine, hindik dizanin an jî dizanin belê naxwazin bipeyivin. Dema mirov ji wan ra dibêje çima zimanê Kurdî napeyivin hiceta wan hazir e, dibêjin : “Dewleta zordest bi me zimanê me daye jibîrkirin.”

Hevalno, ma dewletê eskerê xwe danîyê devê deriyê me ? : Ma esker û polos bi çekên xwe va ketine malên me û nahêlin em zimanê xwe bipeyivin?.. Gelek caran dema ev insanên me ên tembelê sistê nezan van tiştan dibêjin û sûcê ku ew bixwe dikin, davêjin ser dewletê, gelek caran sedem van gotinên wan ez guneha xwe bi dewleta Turk tînim !.. Kes bila sûcê xwe navêje ser dewletê. Herkes dikare di 30 salî, 50 salî heta 80 saliya xwe da zimanê dayîka xwe fêr bibe. Gelek kesên me hene ku diya wan û babê wan bi Turkî nizanin, belê ew jî bi Kurdî niza-

nin. Gelo ev kesen ha ji dayîka xwe, ji bavê xwe ra nebûne bîyanî?.. Ev kesên ha ji eslê xwe dûr neketine?..

Birazîyeka min heye. Li Sêrtê mezin bûye. Xwe li Kurdî nake xwedî û bi min ra bi Kurdî napeyive. Ez pê ra bi Kurdî dipeyivim, belê ew bi Turkî bersiva min dide. Ez bawer im ku ew kurdî qenc dizane. Çimkî ez bi Kurdî çî pirs bikim, ew bi Turkî bersiv dide. Ez jî, xwe lê nakim xwedî û pê ra bi eşq û kêf nabim. Carek du car dîya wê ji min ra got: "Songul dibêje ku mamê min ji min qed heznake. Bi xwuşk û birayên min ra gelek bi kêfî ye, belê bi min ra na.."

Min got: "Rast e.. Bila bizanibe ku ew ji miletek dî ye û ez Kurd im. Bila bizanibe, ew kesê bi zimanê min bi min ra nepeyive, ne birazaya min e û ne pismamê min e. Ji min ra kesek xerîb e. Ez ji xeriba jî gelek hez dikim, belê ne wekî birazîyên xwe!.. Ez çiqasî ji xeriban hez dikim, ji vê keça te jî hewçend hez dikim..."

Li Kurdistan, Kurd dî mala xwe, di jîyana xwe a rojevî da bi pirranî zimanê Turkî diemilînin. Bi milyonan Kurd ketine metropolên Turkîya. Zarokên Kurdên metropolan ketine nav kompleksên nizmîyê. Di bin tesîra van kompleksan da jîyana xwe berdewam dikin. Di bin van kompleksan da dest bi inkarîya xwe dikin û bi zimanê Turkî di nav mala xwe da dipeyivin. Piranî dayika wan bi Turkî nizanin û bi zarokên xwe ra bi Kurdî dipeyivin. Belê zarok bi dayika xwe ra bi Turkî dipeyivin, xwe li Kurdîyê nakin xwedî. Bavê wan jî bi vî awayî serbilind dibin, dengê xwe nakin. Zarok ne bitenê inkarîya zimanê dayîka xwe dikin, herwiha bi inkarkirina zimanê dayîka xwe ra inkarîya dayîka xwe ya belengaz jî dikin û dayîkê bê aqil, nezan dibînin. Nevîyên dayikan bi Kurdî qet famnakin. Hal û pergela Kurdên di metropolan da, hal û pergalekê rezîl e... Ma winê bêjin hal û pergala gundan çewane. Bi rastî rewşa gundiyên Kurdistan jî, ji rewşa Kurdên metropolan qenctir nîne..

Di salên 1940'î, 1950'yî da, dema ez zarok bûm, gundê me nehîye bû. Di gund da dibistan, qereqol û nehîye mudûrî hebû.

Anî di gund da gelek kesên Turk hebûn ku zimanê wan bi Turkî bû û bi tirkî dipeyivîn. Belê di nav gundî û zarokên gundîyan da bi Turkî peyvandin gelek şerm û fihêt bû!.. Kesek tucar bi kesê dî yê gundî ra bi Turkî nedipeyivî. Di dibistanê da Kurdî axaftin qedexê bû. Belê dîsa zarok bi hev ra bi Kurdî dipeyivîn. Sedem vê yekê mamoste di nav zarokan da ajanan digirt ku navê kesên bi Kurdî dipeyivîn bidizî binivsişê û bide mamoste. Bi vî awayî Kurd hê di zarokîya xwe da fêrî ajanîyê dibûn. Belê zarokan lédana mamoste qebûl dikirin û dîsa jî bi hev ra bi Kurdî dipeyivîn...

Îro di gundan da piranî bi Turkî tê axaftin. Zarokê gundên ku dibistan nînin jî, bi tesîra medyayê bi Turkî dipeyivin. Dê û bavê zarokan temaşa telewîzyona Kurdî dikin, belê zarok temaşa telewîzyonên Turkî dikin.

Kurd, bê zorî û zordestî dev ji zimanê xwe berdidin. Li ser xwe dest bi sansorek otomatîk kirine, otomatîk xwe asîmîle dikin. Kesên bi Kurdî dikarin binivsişin jî, tim nameyên xwe bi Turkî dinivisişin. Serokên Kurdan, partiyên Kurdan jî alîkarîya vê asîmilasyona otomotikê dikin. Nivîsên xwe di rojnameyan û kuwaran da bi Turkî dinivisişin. Çar sale ku min du pirtûkên çîrokên Kurdî û pirtûkek hikayetan hazirkirî ye belê ez nikarim bidim çapkirin. Çapxaneyên di bin bandora partiyên Kurd da çap nakin, ji bo ku naveroka van pirtûkan çîrokin û ne nivîsê siyasî ne. Çapxaneyên dî jî bi armanca ticaretê pirtûkan çap dikin û gelek pere dixwazin. Çîrok perçeyek ji çandê ye û Kurd rûmet nadine vê çandê. Dê fermoyê werin bêjin ku Kurd xwedî li çanda xwe derdikevin, pêva dizebiqin?..

Dema ji kesên zimanê Kurdî naemilînin ra dibêjin: "Ji bo çî tu zimanê xwe nizanî?.." bersivê hazir e û suçdar kifş e. Dewleta Turk suçdar e. Qed suçê wan tune, dewletê zimanê wan bi wan da ye jibîrkinin!...

Ez dixwazim çend gotin li ser Kurdên ku li welatên derva jîyana xwe berdewam dikin, bêjim. Kurdên ku jîyana xwe li

Ewropê derbaz dikin, ji alîyê parastina ziman va ji Kurdên Turkîyayê û welat kambaxtir in. Zarokên Kurdê li Elmanya bûne niv Elman û neviyên wan bi tamamî bûne Elman. Neslê sîyemin asîmile bûye. Neslê dûwemin hatîye dema zewacê û bi hev ra dizewice. Xort û keçên ku bi hevra dizewicin, zimanê wan Elmanî ye. Bi zarokên xwe ra jî bi Elmanî dipeyivin û zarokên wan otomatîk Kurdî jibîr dikin, ji eslê xwe derdikevin, zimanê dayîka wan dibe Elmanî!.. Li Ewropê tu zor û zordestî li ser zimanê Kurdî tune. Li hin eyaletên Elmanya di dibistanan da ji bo zarokên Kurda dersa zimanê Kurdî heye. Kurdên entelektuel, Kurdên sîyasetçî, zarokên xwe naşeynin van dersan. Kurdên entelektuel di malên xwe da jî bi Turkî dipeyivin, alîkarîya asîmilasyona dewleta Turk li ser zimanê Kurdî dikin. Kurdên cahil jî zarokên xwe zû windadikin. Zarokên wan zû dibin Elman. Ji bo ku dê û bav bi zanîbûna zimanê Elmanî ê zarokên xwe serbilindin.

Di dawîyê da dixwazim mînakek zelal bidim; Kurdên Êzîdî, li Turkîyayê, li Sûrîya û Îraqê bi hezaran salan asîmile nebûn û ji Kurdîtîya xwe tu tiştek winda nekirin. Belê li Elmanya di 15 salan da zarokên wan asîmile bûn û ez bawer im ku tê di 50 salan da bi tamamî him Kurdîtîya xwe û him jî Êzîdîtîya xwe jibîr bikin. Bi hezaran salan di bin darê zulm û zordestîyê da li ber xwe dan, teslîm nebûn. Belê di 15 salan da bê zor û zordestî, bi eşqa dilê xwe teslim bûn. Ev tiştek gelek giring e ku mirov lêkolînin ilmê li ser bike!..

## Nivîsandinek li ser perwerdekirina zarokan û ziman

**Mamoste Ahmet Akbaş**

Perwerdekirin tenê ne mesala dê û bav e, meseleke civatî ye û ev pirseke her gîrîng e .

Perwerdekirin kultura gelan ji derîyeki heta derîyeki din dibe û ji nivşeki derbasi nivşeki din dike. Ev jî hatina wane nû ya civatê kivşdike, ku ev ji zarok in.


Ji ber wê yeke zimanê zarok yê dê û bav û yê civata (derûdor) ku tê de dijîn, diaxifin.

Rewşa civata wan di warê soşyolojik, psikolojik û aborîyê de çawa be, li gora wê yekê jî tesira xwe di ser zarokan dike û rolekî xwe mezîn dileyize.

Zarok di malê de teybetîyîn li derûdora xwe distine û bi wî halî ziman hîndibe û ji diroka ziman ji ku tesîra xwe û mana xwe li ser merivan heye û weha dike.

Ziman di ware danûsitandina merivan de ku fikir, kultur û ramanin xwe bigihînin hevûdin bi rêya ziman tê kirin. Ev mekanîzmeke herî baş a jîyanê ye.

Merivên berê wek heywanan deng didan û bi hevûdîn re bi wî awayî fehm dikirin. Paşî merivan dema vahşîtiyê (colanî) ku derbaskir hatin ba hevûdin, ji wan komîk famile, beglik, civat çêbûn. Bi wan re ji, ziman derketin holê (meydanê). Her civat



paşi gîhişt bû millet, ev civat jî bi zimanê xwe ve giredayî ma heta niha hebûna xwe anî û xwe kivşkir. Bi rêya wî zimane xwe hevûdin naskirin, fehmkirin û danûsîtandin kiran bi wî awayî cara pêşî meriv bi hevûdin re ketin têkilîyan (kontax çekirin) û heta niha berdewan dikin. Ji xwe ev pêşketina îro dinyayê ji bi rêya ziman çêbûye.

Ji ber wê yekê sistema civatê (sosyal), çêbûn, tebîat xistin bin kontrola xwe di warê kultur û aborîye de ji ku pêşketina îro dinyayê çêbû, xistin dest û bi serketin.

Nelma, meriv dibêje ku bi wê Organê (ziman) dewlet û mîled hatin sazkerin û mirovatî pêşket û nêzî hevûdin bûn. Ji ber wê yekê ziman di jîyanê de rolekî gelekî mezin e. Disa jî jîyana me de ku em dibinin ilm û teknîka dinya kete bin xizmeta însanan ku feyde jê digrin, dîsa ji bi rêya ziman e. Tê dîtîn ku ziman di jîyana meriv de çiqas feyde ye û tesira xwe heye.

Bi derketina ziman re mirovan nivisandin û dezgehî hîn-bûnê (dîbistan) avakirin, ku civat bê idarekirin û mesele wan derxînin holê û his û mejûyê wan pêşve here bi wî awahî hat cihkirin. Milletê ku di dinya de tê ispat kiran bi heya ziman e. Bi wî hebûna xwe ya hezarsalan heta niha anîne û dijîn.

Merivên berê li himberî êrişan ji bo ku hebûn xwe bidominin û piparêzin tekoşin dane, lê mixabin ev êriş jî, ji aliyê merivan ve hatîye. Ji bo ku miho bibin (hinda bibin), karê wan yê pêşî pêşgirtina ziman û kultura wan bûye.

Ji bo ku ji binî ve hinda bibin, bi politakeke dijwar hatine ser wan milletê, ku heta wega di bin deste ne. Astengiyê mezin derdixînin pêşîya wan. Bêguman ziman; di nav merivan de piştgiri bidenhevûdin, his, xem, êş, hezkirin, fikir û ramanan kivşdike.

Pirs, meselên civatê kêma dîke û çareser dîke. Wan serrast û tekûz dîke, kultur û çanda dinyayê bi hevûdin dide naskirin û pêşvê dibe.

Ji dirokê, insanan tecrûben xwe, zanîyên xwe, jîyana xwe berê û tiştên ku dîtine bi rêya nivîsandinê ji nivşeki heta nivşeki

din derbaskirine. Berdewam kirina vê ku heta îro ronahî daye û dide bi rêya zimanê.

Çawa bê haveyîn hevîr çênabe û nagre, ziman jî ji bo merivan wisa ye. Ji bo merivan wekî bexçekî rengin û çavkanîyekî kulturê ye.

Çawa di nav bexçekî gulên de, ku guleke biçînî şuna vê reşayî (lekeke reş) çêbibe û delalîya wî bexçeyê gulên xira dike, wisa ziman û kultur jî xira dike.

Bi wan mana meriv dikare gelek nûmunan bide.

Hê jî millet hene li vê dinyayê ji bo berjewendiyê xwe yê netewî û şexsî; nehekî, êrişî û politika asimlasyonê (helandin) tinin ser milletê din, ku tûne bin, zulmê dikin û ked û heqê milletê din yê bindest dixwin, wan nas nakin û heqê merovatîyê perçîkînin. Merivan îcratên, ku heta îro peyda kirine tiştên dirokî û civatê ne ji bo insana ne. Hindabûna wan tiştan ji bo merivan xirabîyê herî mezin e. Ev ji bo merivatîyê gelek şerm û eyîb e.

Di rojhilata navîn de gelê Kurd gelekî herî kevn e. Wî gelê jî bo merivatîyê û dinyayê gelek inedenîyetî û heyîya ku desxistine anîne. Ji bo pêşketina însanan imkan û alîkari dane û wisa jî dinya wan nas dike. Wek ku milletê dinya jî dizane dergûşa mendenîyetê, ku milletê Kurd û yê din yê Mezrabota hatîye dizanin.

Kurd hatîne mecbûr kirin ku bi rêya kevin, macerbûne, derketine metropolên Tirkîyê û Evrupayê. Li gelek cihan koçberbûn, di belangazî û feqîriyê de dijîn. Hejmara wan li Evropa, tevi yê ku 1962 de bi karkerî, gihîştine milyonek. Kurd li Elmanîya gihîştine 700-800 hezari.

Kurdên Êzdî li welat û dervayê welat, hejmara wan qasî 800 hezarî ye.

Ez bawer im li Elmanîya gihîştîye 30 hezari.

Êzîdîyê ku bi hejmareke baş li ba hevûdin rûdînin, dikarin malê Êzîdîya wek Oldenburgê avabikin. Ku di nav de orf û aded, şîn û şahî, bisk û meqes, îd û cejnên xwe li gor birûbaweriyên xwe yên olî çêbikin û bidomînin. Qewl û beytê Êzîdîya, rê û şopika wan bi ser hev keve û bê xwedî kirin. Ev ola (dîn) Kurdaye herri kevn e û xizmeta ziman û çand dike. Bi wê manê Mala Êzîdîyê Oldenburgê kêmasîyê xwe hebe jî, li gor îmkanê xwe kar û xizmetê baş dike.

### **Rewşa perwerdekirina zarokên kurda li Elmanyayê**

Wezirê çandî û kulturê ji bo zarokên wan hinî zimanê dayika xwe bibin, îmkan-mecal dane; qerar û qerarname derxistine, ku ew dibistanan de hîni zimanê xwe bibin. Li wira heq, huquq, demokрати heye; tenê ku malbat wi heqê xwe yên demokratik li gor usulê daxwaz bikin.

Meriv çiqas zimanan zanibe, hewqas bi kultur, cesaret û şexsîyet (kesayeti) dibe.

"Çiqas tu zimanan zanibî ku tu yê xwe nizanibî li ber civata pêşketî û modern de, tu gelekî eyb û şerm biki". Wî wexti qelsbûn û zeifbûna meriv ber wan kîvş dike. Bê zimanê dayîkê, zarok pêşerojê de wê di kesetîya xwe de walayekî mezin bibine.

Cihên ku dersên zimanê kurdî hatiye danîn:

Tenê li Saxsena Jêrin (Niedersachsen); Li Oldenburg, Celle, Hannover, Lêr, Osterscharmberg, Wildeschausen, Vechta, li Bremen du cihan, li Nordrhein Westfalen jî; Köln, Bottrop, Bielefeld û çend cihê din ji hene. Ji xeyna wan deran bi temami li her cihê Elman, dersên zimanê Kurdî ne hatiye danin. Tenê li wan cihin ku min li jorê kîvşkiriye heye. Ev bi xebata komkar ku ji 1978 wezirên çandî yên eyalatan re name û kampanyekê imza vekiribû û şandibû û çalakiyên din yên rêxistinî hinek rewşenbir û welatparêz û mamostê yên niha ders didin û dane (hinek jî niha kar nakin) ked û xebat kirine û hinek dost û heva-



lin kurdan di nav (SPD, Grüne û PDS) de û sendika hînbûn û perwerdekirinê (GEW) ji alikarî û piştgiri dan ku qerarnama ji 03. 02.1993 hat guhastin û ev imkana zimanê dayîkê dan.

Ev tiştêkî li berçav e, ku bi giştî zarokên biyanîyan bi teybetî zaftir zarokên kurdan di perwerdekirina zarokan de paşve mane û hidi integrale (hevfhmkirin) dibin an ji hiç nabin. Hê ji dibistana yekemîn pirsên wan yê sosyo-kultur, pedagojik û psikolojik ku gelek cihan naynin berçavan, ji wan sedemên ne di cih xwe de ye, ku zafê wan dikevin rêya (dibistaneke teybetî -zarokên ku derengfahm dikin). Ji wan re perwerdekirineke teybetî lazim e (Sonderschule). Kesên ku diçin liseyê (Gymnasium) hêjmara wan hindik e. Zarok heta 26 salî divê here dibistanê, lê mixabin gelek ji wan heta wî emrî nabin xwedîye mesleg. Halbêkî dewlata Elman dewleteke pêşketî ye û zane ye. Meriv dikare li vira bibe xwedîye karek/meslegeki zaf baş û mumkune jî.

Rewşa malbata ji aliyên aborî û sosyali ve ku ji hevûdin cûda ye, tesîra xwe li jiyana zarokanan dike. Ev zarokên ku bêmesleg in, dikevin kort û çalan. Meriv ku bû xwedîye mesleg naye vê manê ku her tiştî dikare çareser bike, na. Wek ku insanek di rêya çolekê de bê û di stûye wî de materek av hebe ku karibe bijî. Kesên ku bêmesleg in, di jiyana xwe de pêşî xwe şaş dikin, xwe hinda dikin.

Li gor ditinê pîspor û lêkolinvanan yê perwerdekirina zarok û ciwanan ev in; Bêmesleg, bi giştî zarokên biyanîyan in û bi hêjmareke zaf jî zarok û ciwanên Kurd in. Ev ji dibe sedema ku sûcan bikin (krîminal) bibin. Halbêkî sedemê xwe yê sosyolojî û psikolojî di vir de heye û rolekî xwe mezin dileyîze. Mixabin di vî warî de xebatek baş çênabe ji aliyên organizasyon û malbetên Kurdan ve. Bi ditîna min, malbat ji wan probleman bi firehî agahdar nebûne an jî pênegihîştîne ku ev noqtekî gelek muhim e jibo zarok. Ji ber ku heta niha ji aliyê wan ve berxwedanek û hevldanek ber çav nehatîye kirin. Divê di vî warî de bala malbatan bêkişandin û ser zarok û ciwanên xwe bisekinin bi teybetî bi dibistan re paralel (rastênhev) bişxûlin û ji hevûdin

haydar (information) bistinîn. Wek ku em dibinîn rewşa wan nebaş e. Ku ji wan asteng û probleman xilaz bibin û çareser bibin. Ji bo wan karan pêwîst e malbat bi mamoste û dezgehên perwerderkirinê yê din re kar û xebat be kirin.



